

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

“HEDERSMORD” LI SWÊDÊ

“KUŞTINA NAMÛSÎ” LI KURDISTANÊ

Mehmet Salih Karaaslan

Şêwirmend

Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

Mêrdîn 2014

KURTE

“HEDERSMORD” LI SWÊDÊ “KUŞTINA NAMÛSÎ” LI KURDISTANÊ

Mehmet Salih Karaaslan

Fadîme Şahîndal, ku bi eslê xwe kurd û ji Mereşê bû, di sala 2002'an de li Swêdê ji aliyê bavê xwe ve hat kuştin. Evîn û daxwaza zewaca vê keçê ya bi xortekî Swêdî re, ji aliyê Swêdiyan ve weke sedema kuştina wê hat ravekirin. Lewma ev kuştin ji aliyê swêdiyan ve weke encameke çanda kurdan hate nîşandan û navê “hedersmord”ê lê hat kirin. Piştî vê bûyerê li Swêdê, bi taybetî di medyayê de nîqaşeke berfireh destpêkir. Bi vê mijarê ve girêdayî, di derbarê jinê de çanda kurdan hate rexnekirin û bi helwesteke eurocentric li hemberî biyaniyên Rojhilata Navîn, bi taybetî yên misulman, rexneyên dijwar hatin kirin. Gelek derûdoran ji rexneyê bêtir, bi vê mijarê weke şerekî li hemberî van biyaniyan meşandin.

Çi kesên ji rêzê, çi jî kesên ronakbîr, bi taybetî medyayê bi helwesteke yekalî ev bûyer rave kirin. Statuya jina kurd li gorî gotinên Fadîme Şahîndal nirxandin, lewma jî profilê jina kurd bêperwerde, bêxwendin û bînivîsîn, herweha di bin zilma mêr, bav û birayên wê de weke hêsîr rave kirin. Ev helwest heta îro jî berdewam dike.

Têgeha namûsê jî bi perspektîfa Fadîme Şahîndal dinirxînin. Bi nêrîna wan, di çanda kurdan de keç tenê namûsa malbatê temsîl dike. Bi xortekî re têkiliyên wê yên evînî, ji bo kuştina wê weke sedemekê, heta weke mecbûriyetekê dibînin. Vê yekê jî weke “hedersmord” binav dikin. Lê bahsa kuştina mêrekî jo bo ku destdirêjî yan jî tecawizî jinekê kiriye, nakin. Dema ku bahsa bûyerên bi vî awayî dibe jî, bi nêrîna wan dîsa yê ku tê kuştin ne mêr e, jina mexdûr e.

Lê seyah û lêkolînerên ku berî avakirina Komara Tirkîyeyê li Kurdistanê geriyane, di çanda kurdan de, di derbarê jinê de, dîmenekî cuda diyar dikin. Jina kurd ji jinên gelên cîran, ên mîna tirk, ereb û faris azadtir dibînin. Balê dikişînin ser destnedayîna jinê û vê yekê di nav jinên cîran de weke taybetmendiya herî berbiçav dinirxînin.

Ew rengê têgeha *namûsê* ku swêdî hebûna wê di çanda kurdan de dipejirîn, di eslê xwe de şaş e. Ji xwe weke têgeh “hedersmord” ji binî ve di zimanê kurdî de tune ye. Lê dema ku di nav kurdan de bahsa kuştina ji bo namûsê tê kirin, pêşî kuştina mêrê ku destavêtiye jinekê yan ketiya hewldana tecawiza wê, tê bîra mirov. Berovajî nêrîna swêdiyan, di bûyerên wanî de yên ku tên kuştin ne jin in, mêr in. Herweha keç ji ber têkiliyên xwe yên evînî nayên kuştin. Lew di çanda kurdan de têkiliyên evînî, heta keçrevandin adet e.

Li gorî teorîsyênê emerîkî Thomas Kuhn, “hedersmord” paradigmayek e. Lew çî kesên ji rêzê, çî kesên ronakbîr, çî jî saziyên têkildar, hemû kes kuştina mêrên ku dest davên jinekê yan dikevin hewldana tecawiza wê, li derveyî vê têgehê digirin. Weke Thomas Kuhn dibêje, ev yek, weke anomaliyekê derdikeve pêşiya me.

Di bûyera Fadîme û afirandina têgeha “hedersmord”ê de, medya Swêdî rolekî girîng lîstîye. Li gorî teoriya teorîsyênê medya, Jean Baudrillard, ev bûyer hîperrealîteyek e. Lew medya çavên xwe ji rastiya ku heye re digiren û fikrên xwe li ser perçeyên ku li hesabên wan tê, ava diken. Di bingeha vê helwesta manîpulatîv de, sedemên weke siyasî, cudaxwaziya biyaniyan, ksenofobiya û nezaniya çanda biyaniyan heye.

Miftepeyv: Kuştina namûsî, çanda kurdan, statuya jina kurd, destnedayîna jina kurd, cudaxwaziya biyaniyan.

ÖZET

İSVEÇ'TE “HEDERSMORD” KURDİSTAN'DA “NAMUS CİNAYETİ”

Mehmet Salih Karaaslan

İsveç'te Maraş'lı ve aslen Kürt olan Fadime Şahindal, 2002 yılında babası tarafından öldürüldü. Bu kızın İsveçli bir erkekle olan ilişkisi ve onunla evlenme isteği, İsveçliler tarafından bu ölümün nedeni olarak açıklandı. Böylece bu olay “hedersmord”, yani *namus cinayeti* olarak açıklandı. Daha sonra, özellikle medyada bu konuyla ilgili büyük bir tartışma başladı. Kendileri tarafından Kürt kültüründe belirlenen Kürt kadının statüsü üzerinden Kürt kültürü eleştirildi. Eurocentric bir yaklaşımla ülke genelinde yapılan bu tartışmalarla, Kürtlerin şahsında, özellikle Ortadoğu'dan gelen Müslüman göçmenlere karşı ağır bir antipropaganda yürütüldü.

Gerek sıradan vatandaşlar, gerekse aydın kesim ve özellikle medya bu olayı tek taraflı bir şekilde ele almıştır. Kürt kadınının statüsünü Fadime Şahindal'ın fikir ve söylediklerine göre değerlendirdirerek, Kürt kadınının okuma yazma bilmeyen, eğitimsiz, dolayısıyla ağabey, baba ve kocasının baskısı altında yaşamak zorunda kalan bireyler olarak tanıtmaktadır. Bu yaklaşım günümüze kadar devam etmektedir.

Namus kavramını da yine aynı şekilde Fadime Şahindal'ın perspektifiyle değerlendirmekteler. Onlara göre Kürt kültüründe yalnızca ailenin kızı, namusu temsil eder. Kızın bir erkekle olan gönül ilişkisi, öldürülmesi için bir neden, hatta bir zorunluluk olarak kabul edilmekte. Bunu da *namus cinayeti* olarak adlandırmaktadırlar. Ancak bir kadını taciz veya ona tecavüz ettiği için öldürülen bir erkekte söz edilmiyor. Böyle durumlardan söz açıldığı zaman ise, öldürülen kişinin erkek değil, yine mağdur olan kadın olduğu söyleniyor.

Ancak Kürdistan'a gelip, Kürt kültürünü gözlemleyen ve inceleyen seyahat ve araştırmacılar, Kürt kültüründe, kadının yeri hakkında farklı bir tablo çiziyorlar. Kürt kadınının komşu olan Türk, Arap ve Fars kadınlarından daha özgür görüyorlar. Kürt kültüründe, kadının dokunulmazlığına, çevre kültürleri arasında Kürt kültürünün ayırt edici önemli özelliklerinden biri olarak dikkat çekiyorlar.

Oysa İsveçlilerin *namus* kavramının Kürt kültüründe varolduğunu kabul ettikleri şeklinin yanlış olduğu anlaşılıyor. Zaten “hedersmord” ya da Türkçe’de *namus cinayeti* denen kavram Kürtçe’de yoktur. Kürtler arasında namus için işlenen cinayetlerden sözedildiği zaman, ilkin bir kadına yaptığı sarkıntılık a da tecavüz ettiği için öldürülen erkek gelir akla. İsveçlilerin düşündüklerinin aksine, böyle durumlarda öldürülen kişi mağdur olan kadın değil, suçu işleyen erkektir. Gönül ilişkileri nedeniyle kızların öldürülmesi de sözkonusu değildir zira Kürt kültüründe çeşitli nedenlerle kızların sevdiğiyle kaçması bir gelenektir.

“Hedersmord” kavramı, Amerikalı teorisyen Thomas Kuhn’un belirlediği paradigma teorisini uyuyor. Gerek sıradan isveçiler olsun, gerek aydın kesim, gerekse konuyla ilgili kurumlar olsun, hepsi aynı şekilde, bir kadına ettiği veya tecavüz girişiminde bulunduğu için öldürülen erkekleri görmezden geliyor, bu kavramın dışında bırakıyor. Paradigma teorisine göre, bu bir anomali olarak karşımıza çıkıyor.

Bu olayın meydana gelmesi ve “hedersmord” kavramının oluşmasında, medyanın önemli rolü olmuştur. Medyanın bu yaklaşımı, medya teorisini Jean Baudrillard’ın hiperrealite olarak adlandırdığı teoriye uygun düşmektedir. Öngördükleri teoriye uymayan noktaları görmezden gelip, sadece teorilerine uyan noktaları ele almak gerçek hayatta varolmayan, sadece televizyon ekranlarında ve gazete sayfalarında varolan bir gerçeklik oluşturuyorlar. Manipülatif olan bu tavrın temelinde siyasi, yabancı ayrımcılığı, xenofobiya ve yabancı kültürünü bilmemek gibi nedenler bulunmaktadır.

Anahtar kelimeler: Namus cinayetleri, Kürt kültürü, Kürt kadını statüsü, kadının dokunulmazlığı, yabancı ayrımcılığı.

ABSTRACT

IN SWEDEN “HEDERSMORD” IN KURDISTAN “KUŞTINA NAMÛSÎ”

Mehmet Salih Karaaslan

Fadime Şahindal was a young woman of Kurdish origin who was murdered by her father in Sweden in 2002. It was explained to the people that the reason for her murder was her relationship with a young Swedish man and her wish to marry him. So the incident was explained as “hedersmord” and an outcome of Kurdish cultural practices. It was followed by an extensive public debate in Sweden especially in the media. Connected to this subject, about women, Kurdish culture was criticised, by a Eurocentric approach, a relentless propaganda campaign ensued against immigrants, especially Muslim immigrants, focusing especially on Kurdish culture.

Ordinary Swedish citizens as well as intellectual classes and, especially, the media handled this event and the issues surrounding it in a biased fashion. They judged the status of Kurdish women within the context of Fadime Şahindal's claims and presented them as uneducated who lived under their husband's, father's and brother's domination.

The same approach in portraying the issue as above continues today. The concept of *heder* continues to be portrayed from the perspective of Fadime Shahindal's claims. It is claimed that in Kurdish culture the family girl represents the family's honour. Shahindal's relationship with the young man led to her murder, and that there is an obligation that she has to be killed if she is involved in a sexual relationship. Such a murder is called “hedersmord”. What is not mentioned is the killing of men who molest and rape women. When such evidence is presented, it is claimed that even in those circumstances the murder victims are women and not men.

However, travellers, researchers and observers who have visited Kurdistan give a different view of women's position in Kurdish culture. Their account suggests that Kurdish women were more free compared to other women in the region. They draw attention to Kurdish women's immunity as a remarkable characteristic of Kurdish culture.

The concept of honour, as understood by many Swedes, does not exist in Kurdish culture. Moreover, “hedersmord”, as the concept has been defined, does not have its equivalent in Kurdish language. Where a killing has taken place due to honour, it primarily involves the killing of men who have molested or raped women. Contrary to many Swedes' understanding, the person who is murdered is not the female victim of rape or molestation but the male perpetrator of the act. The murder of a girl because of a love affair is out of question in Kurdish culture, while young lovers running away from their families is a tradition.

The concept of “hedersmord” among Kurds, as understood by many Swedes, is the prevailing paradigm, as paradigm has been defined by the historian and philosopher of science, Thomas Kuhn. Be it ordinary Swedes or intellectuals or relevant institutions, most people neglect to mention the murder of men who attempt or commit sexual assault against women. Such killings of men are left out of the concept of “hedersmords”. This however represents an anomaly that challenges the prevailing paradigm.

The media has played an important role in creating the prevailing paradigm of “hedersmord” of women in Kurdish culture and ascribing Shaindal's murder to it. The media have created a hyperreality, as defined by media theorist Jean Baudrillard, since they accept evidence that support their worldview and ignore evidence that run contrary to it. Thus they generate and perpetuate the concept of “hedersmord”. They have handled the subject in a misleading, and sometimes deliberately manipulative way, for reasons involving policy, segregation, lack of understanding of immigrant cultures and xenophobia.

The Key Words: Hedersmord, Kurdish culture, the status of Kurdish woman, the immunity of Kurdish woman, segregation.

NAVEROK

Pêşgotin	10
Armanca Lêkolînê	12
Pirsên ku Werin Bersivandin.....	12
Sînorên Lêkolînê	13
Metod	13
Çavkaniyên Ku Hatine Bikaranîn	14

BEŞ I

FADÎME ŞAHÎNDAL Û HEDERSMORD

1.1. Kuştina Fadîme Şahîndal	18
1.2. Min Rabirdûya Xwe Avêt – Lê Ez ne Poşman im.	19
1.2.1. <i>Namûs</i> li Gorî Swêdiyan	23
1.2.2. Li Gorî Swêdiyan <i>Namûs</i> di Çanda Namûsê de.....	24
1.2.3. Hedersmord	30
1.2.4. Nîqaşên “Hedersmord”ê.....	33

BEŞ II

AGAHIYÊN GIŞTÎ DI DERBARÊ JINÊN KURD DE

2.1. Jinên Kurd di Dîrokê de	39
2.2. Azadiya Jinên Kurd	41
2.3. Desthilatdariya Jinên Kurdan	47
2.4. Jinên Kurd di Siyaset û Dîplomasiyê de	52
2.5. Jinên Kurd di Malbatê de	55
2.6. Jina Kurd di Civakê de	57
2.7. Zewac û Revandina Keçan	62
2.8. Perwerdehiya Jinan	66
2.9. Jin di Dînên Kurdan de.....	67
2.10. Jin di Wêjeyê de	69
2.11. Statuya Jinan di Gotinên Pêşyan de	71

BEŞ III

KUŞTINA NAMÛSÎ LI NAV KURDAN

3.1. Têgeha Namûsê li Nav Kurdan	74
3.2. Kuştina Namûsî li Gel Kurdan	75

3.3. Di Nav Kurdan de “Fûhûş”	79
-------------------------------------	----

BEŞ IV

NIRXANDIN

4.1. “Hedersmord” Paradigmayek e	83
4.1.1. Rewşa Fadîme Paradîgmayek e	85
4.1.2. Bûyereke Zindî	89
4.2. Dîmen û Bûyera Fadîme Hîperrealîteyek e	91
4.3. Sedemên vê Helwesta Şaş	95
4.3.1. Cudaxwaziya Biyaniyan	95
4.3.2. Zenofobiya (xenofobia) û Etnocentrizm	97
4.3.3. Nezaniya Çanda Biyaniyan	99
4.3.4. Faktorên Siyasî-Îdeolojîk	102
4.4. Encam	109
ÇAVKANÎ	112

Pêşgotin

Li Swêdê di 21'ê meha Çileyê 2002an de, keçeke bi navê Fadîme Şahîndal, ku bi eslê xwe kurd bû, ji aliyê bavê xwe ve hat kuştin. Di dîroka Swêdê de heta îro, çî swêdî çî jî biyanî, gelek jin ji ber sedemên cûrbecûr ji aliyê mêrên nêzîkî xwe ve hatine kuştin, lê kuştina tu jinan weke ya vê keçê deng venedaye.

Vê bûyerê biqasî Swêdê li temama Ewrûpayê jî deng veda. Televîzyonên sereke BBC, Euronews, CNN, CNBC û hwd. ev bûyer weke nûçeya sereke ragihandin. Piştê li ser navê vê keçê komele, fond, weqf û organîzasyonên cûrbecûr hatin avakirin. Heta bahsa danîna heykelê wê li bajarê Uppsalayê û çêkirina filîmê wê li Hollywoodê hat kirin.

Swêdiyan ev kuştin weke “hedersmord” bi nav kirin û hebûna wê di çanda kurdan de pejirandin. Her çiqas ev têgeh berî vê bûyerê di zimanê swêdî de hebû jî, bi vê bûyerê re, weke têgeheke ku wê gavê têkeve zimanê swêdî, ket rojevê û nîqaşên dijwar li ser hatin kirin.

Lê çî di axaftinê de, çî jî di metnên nivîskî de, di zimanê kurdî de ev têgeh xuya nabe. Lewma bi alîkariya Prof. Dr. Kadri Yıldırım wergereke weke “kuştina namûsî” derket holê. Lê divê neyê jibîrakirin, tiştên ku swêdî ji “hedersmord”ê fêm dikin û tiştên ku kurd ji kuştina ji bo namûsê fêm dikin cuda ne. Lewma dema ku di vê xebatê de bahsa têgeha swêdî tê kirin, “hedersmord” û dema ku ji perspektîfa kurdan bahsa kuştinên ji bo namûsê tê kirin “kuştina namûsê” tê bikaranîn.

Li gorî swêdiyan, ê ku di “hedersmord” de tê kuştin jin tenê ye, heta di nav jinan de, keça malbatê tenê ye. Lê tê zanîn ku di nav kurdan de, di kuştina namûsî de kuştina mêran cîyekî berbiçav digire. Di dîroka kurdan de herweha heya îro jî, li hemberî îhlalkirina destnedayîna jinê, gelek mêr hatine kuştin, ev yek bûye sedema xwîndariya navbera eşîran ku bi dehan mêr ji hevdû kuştine. heta bûye sedema serhildanên li hemberî desthilatdariyan jî.

Çî di nav gelên swêdî de, çî jî di çavkaniyên ku di vê xebatê de hatine bikaranîn de, tu nîqaş li ser naveroka “hedersmord”ê nayê kirin. Ango ji perspektîfa swêdiyan

tenê ve tê nirxandin ku weke taybetmendiyeke çanda kurdan û ya gelên rojhilata navîn tê pejirandin.

Vê helwestê giraniyek mezin danî ser kurdên Swêdê, di jiyana wan a rojane de pirsgirêkên ciddî derxistin. Hin kurdên ku di nav swêdiyan de kar dikirin, mecbûr man dev ji karê xwe berdin û gelek malbatan zarokên xwe çend rojan neşandin dibistanan. Dihat gotin ku hin zarokên swêdiyan ji zarokên kurd ên keçik dipirsîn, digotin “dema ku hûn jî mezin bibin, wê bav û birên we, we jî bikujin?”

Ronakbîrên kurdan digotin “Her çar dewletên dagirker ji bo ku zerarê bidin Kurdan bi salan xebitîn, lê biqasî vê keçê zerar nedan kurdan.”

Sedema xebata ku li ser vê mijarê tê kirin, cudahiya di navbera perspektîfa swêdî û perspektîfa kurdan de, ya li ser kuştina ji bo namûsê ye. Armanca, tespîtkirin û ravekirina vê cudahiyê ye.

Cara yekem di beşa Medya-Ragihandinê de min teza lîsansê di vê mijarê de li ser ragihandina medyayê nivîsîbû. Pişt re jî di Beşa Zanista Çandê de min teza mastirê li ser mijara vê tezê, ango li ser “hedersmord”ê nivîsî. Lê ji ber hin sedeman min ev tez teslîm nekir û heta niha di destê min de ma.

Piştî destpêka xwendina Beşa Ziman û Çanda Kurdî li Zanîngeha Artukluyê dîsa ev xebat ket rojevê. Helbet hebûna derfetên peydekirina çavkaniyan li Kurdistanê jî, ji bo vegera ser vê xebatê bandoreke girîng kir.

Li gorî civakên Rojhilata Navîn, nirx û fikrên civakên çandên Ewrûpayê kêr zêde weke hev in. Lewma her çiqas ev xebat bi çanda swêdiyan hatibe bisînorkirin jî, di xala namûs û kuştinê ji bo namûsê de, bi tevahî nerînên ewrûpiyan rave dike. Lewre kêr zêde ewrûpî weke hevdû li vê mijarê dinerin.

Armanca Lêkolînê

Armanca vê xebatê ya sereke ew e ku têgeha "hedersmord"ê tê çi wateyê were zelalkirin. Tiştên ku swêdî ji vê têgehê fêmkirin, çiqasî di çanda kurdan de heye, di nav kurdan de li ser namûsê kuştinên çawa pêk tên, wê were ravekirin.

Ji ber ku di bingeha vê têgehê de namûs û jin heye, ravekirina wateya namûsê li gel swêdiyan û li gel kurdan çi ye û di çanda kurdan a klasîk de rewşa jinê çawa ye, yek ji armancên vê xebatê ye.

Pirsên ku Werin Bersivandin

Ji bo ku ev xebat bigihê armanca xwe, divê têgeha "hedersmord" a ku swêdî hebûna wê li gel kurdan qebûl dikin, were zelalkirin. Lewma pirs "Hedersmord çi ye?" di navenda vê xebatê de heye.

Bersiva vê pirsê bi alîkariya pirsên jêr tê dayîn.

"Namûs ji bo kurdan û ji bo swêdiyan tê çi wateyê?"

"Gelo 'hedersmord' weke têgeh di zimanê kurdî de heye?"

"Hedersmord di çanda kurdan de heye?"

"Kuştina namûsê çi ye?"

"Ên ku di helwesta paqijkirina namûsê de tên kuştin bêtir jin in an mêr in?"

Ji ber xurtbûna têkiliya jinê û namûsê bi hevdu re, divê di çanda kurdan de rewşa jinê were zelalkirin. Ji bo vê yekê bersiva pirs "Di çanda kurdan a klasîk de rewşa jinê çawa ye?" tê dayîn.

Diyar e ku di vê mijarê de di navbera nêrînên swêdî û kurdan de cudahiyan berbiçav hene. Ji bo ku sedemên vê cudahiye werin fêmkirin, pirs "Sedemên cudahiya dîtînan swêdiyan çi ne?" tê kirin.

Sînorên Lêkolînê

Ev xebat bi têgeha Swêdî “hedersmord” û xalên bi wê ve têkildar sînorkirî ye. Lewma têgeha namûsê li gel kurdan û li gel swêdiyan tê çî wateyê, “hedersmord” di nav kurdan de heye tune ye, bûyerên ku ji bo parastina namûsê pêk tên çawa pêk tên, tê ravekirin.

Ji ber ku li gora swêdiyan di navenda vê têgehê de jin û namûs heye, ji bo parastina namûsê kuştina jinan meşrû, heta mecbûr dibînin, rewşa jinan di çanda kurdan a klasîk de tê vekolîn û statuya jinan tê eşkerekirin. Ji ber ku di van salên dawiyê de, bi taybetî di dema Komara Tirkiyeyê de ji ber sedemên cûrbecûr zahmet e êdî mirov bahsa çandêke resen bike. Ji xwe têgeha “hedersmord”ê bixwe bêtir xwe dispêre çanda kurdan a resen. Lewma ji bo eşkerekirina çanda kurdan a resen, a berî avakirina Komara Tirkiyeyê, weke bingeha vê xebatê tê girtin û bisînorkirin.

Ji bo ku kuştina namûsê îro di çî astê de ye were eşkerekirin, çend bûyerên ku van bîst salên dawî di derbarê namûsê de pêk hatine weke mînak tên analîzkirin.

Metod

Bûyera Fadîme Şahîndal çawa dest pê kir, di medya de çawa hat ragihandin û kuştina wê çawa çê bû, bi kurtayî tê vegotin. Ji bo ku fikrên Fadîme yên di derbarê çanda kurdan û rewşa jina kurd de werin fêmkirin, axaftina ku wê di parlamentoya Swêdê de kiriye tê neqilkirin. Lew Fadîme di vê axaftinê de çanda kurdan ji bo pîrsgirêka xwe weke sedem nîşan dide. Li Swêdê çî kesên ji rêzê çî jî kesên ronakbîr, vê axaftinê ji xwe re weke referens qebûl dikin.

Ji bo ku bûyera Fadîme û nîqaşên li ser “hedermord”ê werin fêmkirin, nivîsên ku di çend kovarên çandî û zanistî de hatine kirin tên analîzkirin. Helbet nêrînên saziyên fermî yên ziman û çandê jî ji çavkaniyên van saziyan bixwe hatine girtin û tên nirxandin.

Ji bo diyarkirina rewşa jina kurd di çanda kurdî ya klasîk de, çavkaniyên ku berî avakirina Komara Tirkiyeyê hatine nivîsîn, weke bingeha hatine girtin. Ji bo ku nêrîna kurdan a li Fadîme û nîqaşên ku bi wê destpêkirin, hevpeyvîn bi çend pisporên bi mijarê

re t kildar hatine kirin. Ev hevpeyv n,  ro xal n weke, n r na kurdan li nam s   awa ye, rew a jin n kurd  awa ye, pirsgir k n weke y n Fad me  awa t n  areserkirin, rola n r na serdestan di van meseleyan de e kere dike.

 avkaniy n Ku Hatine Bikaran n

Di derbar  “hedermord”  de ji bo ravekirina n r n n Sw diyan, ji van kovar n kultur  zanist  hatiye  stifadekirin: Bang, Socionomen (Sosyolog), Kvinnor mot fundamentalism (Jin n dij  F ndamental zm ), ETC, Integration i Focus (Arman  ntegrasyon), Moderna tider (Dem n Modern)   I&M Invandrare Minoriteter (Biyaniy n Hindik n Civak ).

Xebata antropologa Profesor Unni Wikan, *En fr ga om heder (Pirsek li Ser Namus )* ku li  skand nawya li ser pirsra “**hedersmord**”  kiriye, di derheq  perspekt va  skand nawiy n de agahiy n h ja dide.

Teza doktora, ya do enta etnoloj  Annick Sj gren, *H r G r Gr nsen (S nor heta v der  ye)* ku li ser  anda sw d    gel n dora Bahra Sp  kiriye j  bi k r  v  xebat  hat.

Pirt ka Pierre Bourdieu ya bi nav  *Den manliga dominansen (Desthilatdariya M rani)* j  di xala nam s  de agahiy n h ja dide. Ev lokol na ku Bourdieu di sal n 1960’  de li ser qeb ley n Ereb n Bakur  Afr ka kiriye, di civaka patriarkal de statuya jin  vedib je. Ji ber ku di v  xal  de nirxandin n Bourdieu    n sw diyan di v  xal  de digih n hev, ji bo t gih stina n r na wan a nam s , min  st fade kir.

Ji bo ravekirina rew a jin  di  anda kurdan de, pirt k n ku ber  niha bi sed sal    w  de hatine niv s n, ji bo naveroka v  tez  b tir guncav in. Lew desthilatdariy n cuda ku pi t   er  C han  y  yekem Kurdistan li hev parve kirin   her yek  li gor  xwe li dij  nirx n kurdan pol t ka me andin, reseniya  anda kurdan tehr b kirine. Lewma pirt k n ku seyyah,  avd r   l kol ner n Ewrop  ber  van desthilatdariyan hatine, li Kurdistan  geriyane   li ser kurdan niv s ne, bi n r n n objekt f, di derbar  reseniya  anda kurdan de agahiy n h ja didin.

Lew ji bilî tehrîbkirina çanda kurdan, ji ber ku berhemên ku ji sed salî vir de di bin siya îdeolojiyên fermî de hatine nivîsîn, jixwe bi kêrî vê xebatê nayên. Ev xebat bixwe neynika wê dîmenê ye ku şaş hatiye afirandin.

Berhemek ji berhemên herî kevn ku reseniya çanda kurdan nîşan dide, berhema Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* ye. Ev berhem dusid sal berê rewşa jinê di çanda kurdan de çawa bû, ji me re vedibêje.

Muhammed Yusuf Hayr di xebata *Îslam Tarihinde Kürt Kadını* de, rewşa jinên kurd ên di dema Eyyûbiyan de vedibêje. Agahiyên ku ev pirtûk dide ji yên M. M. Bazidî kevintir in, lewma rewşa jina kurd a dîrokî hinekî rohnî dike.

Ely Bannister Soane yê îngîlîz ji 1907an û pê ve gelek salan li Kurdistana Başûr jiyaye, fêrî kurdî bûye û li herêma Helebçe katibtiya Adîle Xanima Seroka Eşîra Cafan kiriye. Soane cîgiriya konsolosiya îngîlîzan û gelek karên din di nav kurdan de kiriye. Di pirtûka xwe ya *Mezopotamya ve Kurdistan'a Gizli Yolculuk (To Mesopotamia and Kurdistan, in Disguise)* de, gelek agahiyên ku bi kêrî vê xebatê hatiye, dide.

Efserê îngîlîz William Ruppert Hay jî du salan li Kurdistana Başûr jiyaye û çavdêriyên xwe di pirtûka *Kürdistan'da İki Yıl, 1918-1920 (Two Years in Kurdistan, 1918-1920)* de dinivîse.

Dîsa efserekî îngîlîz Cecîl John Edmonds jî di navbera salên 1915 û 1937'an de li Kurdistana Başûr jiyaye, gelek karên siyasî, dîplomatîk û navnetewî kiriye û di pirtûka *Kürtler, Türkler ve Araplar (Kurds, Turks and Arabs)* de agahiyên bi kêr dide.

Serdarê îngîlîz Edward William Charles Noel jî hatiye li Kurdistana Bakur geriyaye û raporên xwe bi navê *Kurdistan 1919* nivîsiye. Noel bi pêşkêşên kurdan ên weke Celadet Elî Bedirxan, Kamiran Elî Bedirxan, Ekrem Cemîl Paşa û hwd. re hevdiştin kirine û li nav gelek eşîrên kurdan geriyaye. Her çiqas Noel çavdêriyên siyasî kiribin jî, çavdêriyên wî yên li ser çand û civaka kurdan, têra xwe balkêş in.

Endezyarê îngîlîz, Archibald Milne Hamilton jî weke yên din, di navbera 1928 û 1932'an de li Kurdistana Başûr jiyaye, rêya hesin a di navbera Hewlêr û Rewandûzê de

wî çêkiriye. Hamilton çavdêriyên xwe bi navê *Kürdistan'dan Geçen Yol (Road Through Kurdistan)* nivîsiye.

Pirtûka *Kürtler, Sosyolojik ve Tarihi İnceleme* ya konsolosê rûs ê Urmîyê Bazil Nikitine bi berfirehî bahsa kurdan dike û di çanda kurdan de ciyê jinê rave dike. Li gel Noelê ku bahsa Kurdên Bakur dike, Soane, Hamilton û hwd bahsa kurdên Başûr dikin, Nikitine jî bahsa kurdên Rojhilat dike.

Ji ber ku ev kesên biyanî li ser kurdên her çar perçeyên Kurdistanê agahiyên berî niha bi sed salî, bi helwesteke objektîf didin, xebatên wan pir alîkariya vê xebatê kirin.

Pirtûka *Kürtler, Bir El Kitabı* a Mehrdad R. Izady, di derheqê rewşa jina kurd di çanda kurdî ya klasîk de, agahiyên girîng dide.

Helbet ji bilî çavkaniyên ku kesên biyanî li ser çanda kurdan nivîsîne, ji çavkaniyên ku kurdan bixwe jî tê de bahsa çanda xwe kirine jî, hatiye îstîfadekirin.

Hin nivîsên ku di kovara *Rojî Kurd, Jîn û Hawarê* de jî nivîsên, agahiyên ji bo vê xebatê pêwîst, hene.

Helbet akademîsyenên ku di van salên dawî de li ser vê mijarê xebatên objektîf kirine jî hene. Pirtûka ku Zanîngeha Hakkari ji pêşkêşiyên *Kongreya Navnetewî ya Jina Kurd* pêk tê çap kiriye, ji kar û xebatên van akademîsyenan pêk tê. Di derbarê rewşa jina kurd a îro de, ev berhem baş bi kêrî vê xebatê hat.

Mehmet Bayrak, di berhema *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını* de rewşa jina kurd ji Dema Kevnare de heta îro dinirxîne. Pirtûka Prof. Shahrzad Mojab, a bi navê *Devletsiz Ulusun Kadınları* jî agahiyên hêja dide.

Ji bo ravekirina nêrîna Kurdan a li ser parastina jinan, ji pirtûka Ahmet Kahraman a bi navê *Kürt İsyamları (Tedip ve Tenkil)* jî hatiye îstîfadekirin. Berteka kurdan a li hemberî destavêtina jinekê çawa dibe destpêka Komkujiya Dêrsimê, di vê pirtûkê de tê vegotin.

Hemû agahiyên ku ji çavkaniyên bi zimanê swêdî, îngîlîzî û tirkî hatine wergirtin, min bixwe wergerandine kurdî. Helbet divê neyê jibîrkin ku hin ji van berheman ji zimanên din hatine wergerandin. Weke mînak pirtûka Pierre Bourdieu ya bi navê *Den Manliga Dominansen*, ji fransî bo swêdî hatiye wergerandin.

Ji bilî çavkaniyên nivîskî, hevpeyvînên ku bi Îsmâil Beşikçi, Malmîsanij, Reşo Zîlan, Ferhat Şakelî û Ahmet Kahraman re jî hatine kirin, regekî resen didin vê xebatê û vê xebatê dewlemend dikin.

Ji bilî van çavkaniyên bingehî, helbet bi gelek çavkaniyên cûrbecûr, weke rojname, tewlevîzyon, radyo û hwd. ev xebat hatiye dewlemend kirin.

BEŞ I

FADİME ŞAHİNDAL Û HEDERSMORD

Têgeha “hedersmord”ê, nîqaşên ku li ser tên kirin û bûyera Fadîme Şahîndal ku bûye destpêka nîqaşa “hedersmord”ê di vê beşê de tê vegotin.

1.1. Kuştina Fadîme Şahîndal

Fadîme Şahîndal li Elbîstana navçeya Maraşê di 1975an de çê bûye û piştî darbeya leşkerî ya 1980î, malbata wê bar dike dihere Swêdê û li bajarê Uppsala bi cî dibe. Li gel ku malbat elewî ye û Fadîme bixwe li Swêdê di malbata xwe de bi çanda tirkan mezin bûye, bi kurdî jî nizanîbû, ji aliyê swêdiyan ve weke kurdeke xas û misulmaneke xas hat nîşandan.

Fadîme 21ê Rêbendana 2002yan, li bajarê Uppsalayê ji aliyê bavê xwe ve hat kuştin. Li gorî îddîayên wê û yên medya swêdî, ji bo ku wê û xortekî swêdî ji hevdû hez dikirin, bavê wê ew tehdît dikir û piştî ew kuşt.

Cara yekem Fadîme di havîna 1998an de, bi nasnameya rastî û wêneyê xwe di medya de xuya bû. Dihat gotin ku heta wê demê, bi dizî bi xortekî swêdî re ketibû têkiliyeke evînî û bi awayê ku malbatê plan kiribû ku wê bi pismamê wê re bizewicîne, wê nedixwest bizewice.¹ Radigihand ku ji ber vê yekê bavê wê birayê wê zulmê li wê dikin û wê bi kuştinê tehdît dikin. Îddîa dikir ku li gorî çanda kurdan, îro keçek nikare bi xortekî swêdî re bizewice, herweha dema ku keçek bi kurdekî re bizewice divê keç bakîre be. Digot heger ku keç ne bakîre be, ew keç bi kuştinê tê cezakirin.

Piştî van gotinan, Fadîme di demeke kurt, biqasî çend hefteyan de, zêdeyî adetê meşhûr bû. Yek ji wan kesên ku herî pir di medya de xuya dibû êdî Fadîme bû. Di her nîqaşên ku li ser çanda biyaniyan dihatin kirin, di nîqaşên li ser pirsgerêkên civakî û di nûçeyan de bi hevpeyvînan, bi programên taybet, heta di programên pêşbazîyan de, êdî Fadîme figureke sereke bû.

¹ <http://sverigesradio.se/sida/artikel.aspx?programid=83&artikel=4918290> (23.05.2013)

Medyayê ew weke miroveke pir têgihîştî, zîrek, zana, baqil û pisporê çanda biyaniyan û ya swêdiyan dida nasîn. Ji bo pirsgerêkên entegrasyona biyaniyan, ew weke aktoreke diyarker nîşan didan. Ya herî girîng bi vê statuyê, swêdiyan di 20'ê Mijdara 2001'ê de li parlamentoya xwe destûra axaftinê dan wê. Biqasî 350 parlementer, serokên partiyên û wezîran li axaftina wê guhdar kirin.

Axaftina Fadîme di medya de hat weşandin. Di wê axaftinê de li ser çanda kurdan, statuya jinên kurd, perwerdeya keçan û hwd. gelek tişt îddîa dikirin. Ev axaftin bi tevahî fikrên Fadîme û nêrînên swêdiyan ên derheqê jina kurd û “hedersmord”ê vedibêje. Lewma hêja ye mirov vê axaftinê ji nêzîk ve bizanibe. Kurtenaveroka vê axaftinê di rojnameyekê de wiha hat weşandin:

1.2. Min Rabirdûya Xwe Avêt – Lê Ez ne Poşman im.

“Mayina di navbera daxwazên malbatê û daxwazên civakê de çiqasî zahmet e, ez ê ji we re bêjim. Dixwazim balê bikêşînim ku ev tişt ne tenê tê serê jinên Rojhilata Navîn.

Ez 26 salî me û ji herêma Kurdistanê, a li Tirkiyeyê, ji gundekî biçûk im. Ez ji malbateke bextewer im, ku her kesek ciyê wan bellî ye. Dema ku ez heft salî bûm, malbata min hat Swêdê. Ji min re hat gotin ku ez bi zarokên swêdî re nelîzim.

Li gorî nêrîna dê û bavê min, ji bo fêrbûna xwendin û nivîsandinê çûyîna dibistanê bes e û nelîzim e keç xwendina dibistanê berdewam bikin. A girîng ew bû ku ez dawîya dawiyê vegerim Tirkiyeyê û bizewicim.²

Her ku çû min êdî nema guhê xwe da wan sînoran. Min bi hevalên xwe yî swêdî re da û stend û êdî êvaran, ji dema ku ji min re gotibûn were malê, derengtir hatim. Karîna rawestina li ser lingên xwe, ji bo min girîng bû.

² Orjînal van hevokan di rojnameyê de reş in.

Xwendin û pêşvexistina şexsê min, ji bo min girîng bû. Malbata min ev yek qebûl nekir û asteng dikir. Li gorî malbata min, keçên swêdî beradayî ne, tu hurmeta wan ji malbata wan re tune ye. Dibêjin jinên Swêdî, bêyî ku li şerefa malbata xwe bifikirin kengî bixwazin mêrê xwe berdidin.

Nêrînen malbatê li ser pêşdaraziyan hatine avakirin. Vê yekê ez dudilî û tevlihev dikirim. Ez mecbûr bûm du jiyana bijîm. Rojekê min xortekî swêdî bi navê Patrik dît û me ji hevdû hez kir. Lê diviyabû hayê malbatê ji vê hezkirinê çênebûya. Lew, qewimînên ku wê bihata serê me, ez ditirsandim.

Piştî têkiliya me ya salekê, êdî em kêmtir li xwe miqate dibûn. Wê demê tiştê ku diviyabû neqewimiya, qewimî. Bavê min em dîtin. Berteka wî ya pêşî, lêxistina min û Patrik bû. Li gorî wî, parastina keça wî, wezîfeya wî bû.

Wî bawer dikir ku di navbera min û Patrik de têkiliya zayendî çê bûye. Bakîretî girîng bû, heta îro jî dema ku mirov bizewice, divê mirov xwîna li çarşefê rê bide.

Diviyabû ez ji bo malbata xwe, bi mêrekî kurd re bizewicîma. Lewma ji nişka ve ew keça kurd a baş, veguherî bû orospîyeke zikakan. Wê demê min biryar da, min têkiliyên xwe ji malbatê birî û min bar kir ez çûm Sundsvälê. Lê birayê min da dû min û ez tehdît kirim. Roj bi roj rewş xerabtir bû.

Birayê min ne reşît bû û wê ceza pir nexwara, lewma wî dida dû min. Min ev rewş li polîs gilî kir lê wan girîngî nedayê. Pêşniyaza polîs ew bû ku ez bi malbatê re bipeyivim da ku min tehdît nekin.

Lewma min berê xwe da medyayê û rewş ji raya giştî re eşkere kir. Bûyerê pir bal kişand. Wê demê gelek bûyerên din jî di rojevê de bûn. Min berê xwe da zulmê û dengê xwe li hemberî zulmê bilind kir.

Dema ku min cara duyem gilî kir, min polîsekî di vê mijarê de bi tecrûbe dît. Wî polisî ciddiyeta rewşê fêr kir û nasnameya veşartî pêşniyazî min kir.

Piştî gilî em çûn dadgehê. Bavê min ji ber tehdîta xwe ceza xwar. Ji aliyê malbatê ve, diya min, ji ber ku ez ji malê çûme, hat tawanbarkirin. Heta wê xwe bixwe jî tawanbar kir. Ez îro li Östersund dijîm û li wê derê dixwînim. Ez xwe bihêz û biistîkrar dibînim, lê heta ku giham vê radeyê, demeke dirêj derbas bû. Min êdî dev ji rabirdûya xwe berdaye û min dest bi avakirina nasnameyêke nû kiriye. Min dev ji malbata xwe jî berdaye.

Min bedelekî giran ji bo vê yekê daye. Heval ji min re bûne malbata min a nû. Ez ji devjêberdana malbata xwe poşman nebûme, lê ez xemgîn im ji bo ku ez mecbûrî vê bûme. Malbata min hem namûsa xwe wenda kirin hem jî keça xwe.

Dikarîbû pêşî li vê bihata girtin. Heger ku civakê berpirsiyariya xwe hilgirtibûya û malbata min bi civaka swêdî re entegre kiribûna, dibe ku pêşî li vê bihata girtin. Weke mînak, heger ku, Federasyona Komeleyên Kurdan alîkariya malbata min kiribûna, dibe ku pêşî li vê bigirtana.

Tu kî di hundurê min de tune ye, lê divê mirov ji van qewimînên ku hatine serê min, dersekê derxe. Hêvîdar im careke din bûyerên wanî nebe. Bi raya min pir girîng e mirov çavên xwe ji vê rewşa keçên biyanî re negire.”³

Lê di vê pirsgirêkê de balkêş e ku tu kesî di vê mijarê de, di derbarê van îddîayan de fikra malbatê nepirsîn.

Salek û du mehan piştî vê axaftinê, di 21ê Rêbendana 2002an de, dema ku Fadîme hat bajarê Uppsalayê cem mala xwişka xwe, bavê wê bi demançê ew kuşt. Vê kuştinê li Swêdê pir deng veda.

³ Rojnameya *Aftonbladet* 23.01. 2002

Aliyê meselê ku bi rêya medya dihat nîşandayîn, wanî bû. Lê belê di meselê de gelek tiştên ku bi zanebûn an jî nezanî nedihat bahskirin, hebûn. Ev alî di beşê nîrxandinê de tê zelalkirin û nîqaşkirin.

1.2.1. *Namûs* li Gorî Swêdiyan

Ferhenga fermî ya ku Enstîtuya Zanista Ziman a Wezaretê Perwerdeyê amade kiriye û Reşo Zîlan wergerandiye kurdî, ji têgeha *heder* re gotiye *rûmet, avrû, nav û namûs, namûs, şeref û îzet*.⁴ Li gel ku wateyên wê yên ferhengî hewqasî pir in jî, ev têgeh di jiyana rojane de û di nîqaşan de weke *namûsê* tê bahskirin.

Ferhenga fermî, ya Svenska Akamedien ku ji sala 1511an de li ser zimanê swêdî dixebite, dibêje *heder* tê wateya *îtîbar, rûmet, hurmet, rêzgirtin, rutbe û asta civakî*.⁵ Ferhenga Norstedts Svenska Ordbok ku bi alîkariya Zanîngeha Göteborg hatiye amadekirin, *namûsê* weke îtîbara ku li ser taybetmendiyan baş hatiye avakirin, rave dike.⁶ Lê divê mirov ji bîr neke ku naveroka têgeha *heder* li cîhanê ji bo her grûbeke mirovan bi şiklekî ye û bi awayekî cuda tê jiyîn.⁷

Îro li Swêdê dema ku bahsa têgeha *namûsê* dibe, bêtir civaka kevn tê bîra mirov. Di vê civaka modern de, bêtir bêhna şewaza jiyana kevn ji têgeha *namûsê* tê. Îro, ev gotin bi demên berê û civaka çîndar ve tê girêdan. Niha li Swêdê ji têgeha *namûsê* bêtir êdî bahsa parastina *durustiya tekakesî* tê kirin.⁸

Dema ku şexs li Swêdê di civaka cotkarî de dijiyan, peywendiyên wan bi têgeha *namûsê* re xurttir bûn. Taybetmendiyan *durustiya şexsî*, yên weke sûc û ûjdan bi civaka modern, bi şewaza jiyana tekakesî derketiye holê. Bi derketina holê ya vê şewazê re, wateya *namûs* û *fediye* ku bi hişkî bi jiyana civakî ve girêdayî ne, bi demê re wenda bûne. Lê li çandên dora Bahra Spî hîna jî îro *namûs* ciyekî girîng digire.⁹

Di vê dema modern de, gava bahsa *namûsê* dibe, tiştên baş, tiştên "binamûs", etîk û exlaqî û bi tevahî tiştên hêjayî rêzgirtinê tên bîra mirov. Ji bo swêdiyan ji rêzê

⁴ Reşo Zîlan, *Ferhenga swêdî-kurdî, lexin Språkleksikon för invandrare*, Statens Institut för Läromedel (SIL), Stockholm, 1989

⁵ <http://g3.spraakdata.gu.se/saob/> (12 Gulan 2013)

⁶ Norstedts Svenska Ordbok, Språkdata, Sture Allen och Norstedts Förlag, 1997

⁷ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 20

⁸ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.59

⁹ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.60

namûs tişteki wiha ye ku mirov ji bona wê tédikoşe, tişteki xweş, armanceke hêja ku mirov ji bonê dixebite.¹⁰

1.2.2. Li Gorî Swêdiyan *Namûs* di Çanda Namûsê de

Çi swêdiyên ji rêzê, çi jî yên ronakbîr, bi tevahî gelê swêdi çanda gelên dora Bahra Spî û gelên Rojhilata Navîn; bi taybetî çanda kurdan weke *Çanda Namûsê* bi nav dikin.¹¹ Lê balkeş e, di nîqaşan de yên ku tên kirin, têgeha *namûsê* di van çandan de tê çi wateyê, ne ji perspektîfa van gelan, lê bi helwesteke etnocentric, ji perspektîfa xwe dinirxînin. Lewma di vê xalê de, peydekirina materyalên ku nêrînen resen, ên ku ji perspektîfa ronakbîr û rayedarên van çandan ve mijarê dinirxînin, zahmet e.

Bi tevahî *namûs*, di *çanda namûsê* de weke zayendiya jinê tê îfade kirin. Bi taybetî zayendiya keça malbatê di navendê de ye. Her təkiliya zayendî, berî zewacê yan derveyî zewacê, ji bo keçan eyba li hemberî civakê ye. Dibe ku dîtina keçekê, yan jî peyva wê bi mêrekî re bibe sedem ku di derbarê wê keçê de paşgotinî werin kirin.¹²

Di *çandên namûsê* de, bi sedsalan bakîretiya keçan ji bo helwestên malbatê bi wateyeke girîng, nirxeke sembolîk wergirtiye. Di civakên kollektîf de bakîretî paqijiyaya moralî û rîtuêlî îfade dike û di heman demê de di civakên modern ên tekakesî de tenê şexs eleqeder dike, herweha pîrseke di derbarê azadî û durustiya şexsî de ye. Ev herdu xalên bingehî, nayên ba hev. Ne mumkun e mirov rewşê bi awayekî rasyonel îzah bike. Moral li hemberî moral e, ev jî sînor bixwe ye.¹³

Bakîretî ku bi rengekî civakî xwe digihîne rasyoneliyê û ji bo vê civaka Swêdi ya modern ku tekakesî ye, pîr xerîb e. Divê mirov îro bi taybetî ji perspektîfa swêdiyan a tekakesî ku pîr dîrî nerîna klasîk e, hewl nede sedemên vê yekê diyar bike.¹⁴ Lêbelê bakîretî li Swêda kevn jî hebû. Di zimanê swêdi de gotina “oäkta barn” ango “zarokên xeyrîmeşrû” rewşa Swêdê ya kevn diyar dike.¹⁵

¹⁰ www.aftonbladet.se/nyheter/kolumnister/elisabethoglund/article16805165.ab (23.05.2013)

¹¹ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 21

¹² Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 23

¹³ Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r. 70

¹⁴ Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r. 67

¹⁵ Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r. 69

Mêr tenê di *çandên namûsê* de xwedî namûs in û *namûs* herî pir bi zayendiya jinê ve girêdayî ye. Heger ku keçek an jinek li dijî normên civakî tevbigere, mêr di malbatê de namûsa xwe wenda dike. Ne tenê namûsa bav an mêtê jinê, herweha namûsa temama malbatê û ya xismên malbatê dikeve rîskê.¹⁶ Wateya xizman an a tekakesan di van çandan de, li gorî asta girêdana bi grûbê ve, diyar dibe, bi vê astê mirov dibe mirovekî baş an mirovekî xerab. Mirov bi jiyana hevbeş di grûbê de, dibe xwedî namûs.¹⁷

Lêkolîn, di civakên klasîk de, helwestên kodên *namûsê*, çawa hêzên hiyerarşik diafirînin, eşkere dikin.¹⁸ Di vê xalê de rewşa akademîsyenên îranî yên ku li Îranê gihaştine û hatine, niha li Swêdê dijîn, mînakên balkêş in. Karên weke şixulandina dikaneke biçûk ku li Îranê qet nafikirin bikin, li Swêdê dikin. Bi fikra ku ne di bin emrê tu kesî de bin û qîmetê xwe biparêzin, karên wanî tercîh dikin. Bi vî awayî xwe kêmtî tu kesên bi nêrîna wan kêmtî namûs, nabînin.¹⁹

Di çandên ku namûs hiyerarşiya civakê diafirîne de, şexs bixwe bi *namûs* çê dibe, lewma namûs nikare were zêdekirin, dikare tenê were wergirtin û neqlî nîfşên din bê kirin. Li gorî vê perspektîfê, *namûs* nirxekî îtîbarê ye: Nirxên ku li derve tîr tarîfkirin, weke wekhevî û rûmetê ye. Lêkolînên ku li ser kodên namûsê hatine kirin, eşkere kirine ku namûs di hin naverokên civakî de, ji bilî jinan, teqez îmtiyazeke mêtanî ye.²⁰

Antropologê îngîlîz Lulian Pitt-Rivers di salên 1950'yî de li Îspanyayê ku *çanda namûsê* lê heye, li ser *namûsê* lêkolîn kiriye. Rivers dibêje *namûs* ew tiştê ku mirov bixwe li xwe miqate ye û dixwaze bi mirov re hebe, herweha ew tişt e ku civak jî dixwaze bi mirovan re hebe.²¹

Namûs li gorî antropologê lubnanî Michael Gilsonan, mafê stendina xûrûra ji xwe û mafê statuyê ye. Statu jî bi nasnameyeke civakî ya qewîn tê avakirin. Pîvanên

¹⁶ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 66

¹⁷ Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r. 67

¹⁸ www.nck.uu.se

¹⁹ Hassan Hosseini vgz. Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r.163

²⁰ www.nck.uu.se

²¹ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.58

nirxandina mirovan, ên weke rastî û şaşî, başî û xerabî, xweşik an jî çirkîn bi bandora adetên herêmî tên diyarkirin. Veya jî ji nirxên gel re dibin bingeh û xwe bi vî awayî ji rêbazên olî cuda dike. Gilsenan vê yekê weke wicdanê civakê yê kolektîf bi nav dike.²²

Li gorî lêkolîner Peristiany ku di salên 1950-1960î de li dora Bahra Spî li ser pêvajoya guhertina *namûsê* xebitiye, civak dikare bijî, dema ku rêbaz ji bo rabûn û rûniştina mirovan hebin. Lewma divê rêbaz û cezayên civakê yên ku werin pejirandin, hebin. Namûs û fedî ji vana du rêbaz in.²³ Peristiany mirovên çanda namûsê dike du beş: Ên binamûs û yên bênamûs. Ên bênamûs, ne mirovên xwedî qîmetê temam in, li derveyî civakê ne û mafê wan ê ku ji aliyê civakê ve werin parastin, tune ne. Ew bixwe, li hemberî civakê xwe ji bo tu tiştî berpirsiyar nabînin. Bi tu tiştî nayên hesibandin, lewma mirov nikare bi wan bawer bibe.²⁴

Sosyologê Fransiz Pierre Bourdieu jî di salên 1960'î de li Cezayir di nav gelê berber de, li ser *namûsê* lêkolînek kiriye. Bourdieu çanda gelê berber weke çanda namûsê dinirxîne, her çiqas bahsa çend aliyên *namûsê* dike jî, di navenda *namûsê* de, zayendiya jinê dibîne.²⁵

Li gorî nêrîna Bourdieu, sînore jinekê di çandên namûsê de doxîn e. Hemû tişt li vî sînorî disekine. Jina ku doxîna xwe jidiyayî biparêze û veneke, weke jina bi îffet û bifazîlet tê dîtin. Herweha ev yek, ji bo wê jinê weke paqijiyê tê hesibandin. *Namûs*, nirxekî kolektîf e û di nav rêbazên civakê de weke sembol xwe îfade dike. Ango namûs îdealekî wiha ye ku gelek caran bidestxistina wê zahmet e. Mêritî li gel mêran di warê zayendî û civakî de weke qabîliyeta afirandinê, weke qabîliyeta hêzê û ji bo bikaranîna hêzê (bi taybetî di tolhildanan de) weke wezîfeyekê tê qebûlkin.²⁶

²² Michael Gilsenan vgz. Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.59

²³ Peristiany, vgz. Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r.155

²⁴ Peristiany, vgz. Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r.156

²⁵ Pierre Bourdieu, *Den manliga dominansen*, r. 28

²⁶ Pierre Bourdieu, *Den manliga dominansen*, r. 28

Li hemberî vêya, zayendiya jinê weke taybetmendiyeke nerênî tê qebûlkirin. Dikare were parastin an wendakirin, lew fazîleta wê berî her tiştî bi bakîretiya wê û pişt re jî bi sêdaqeta bi mêrê wê re derdikeve holê.²⁷

Pesn û qîmetê mêrantî di tirs û xofê de ku jin diafirînin, veşartî ye. Jin qels in, dibin sedema rêbazên qels, lewma zeafa ewlehiya rêbazên *namûsê* diafirînin. *Hurme*, ango jina ku sembola zayendiyê ye, dibe hertim were îhlalkirin. Di heman demê de bi hemû selehên qelsiyê yên weke qurnaziya şeytanî û sêhrê hatine pêçan. Ev taybetmendî, li gel ewlehiya qels ku bi jinê re heye, hemû rêbazên îdeala mêranî, bloke dike.²⁸

Jin ne di nav jiyana derve ya hevpar de ne. Hemû tiştên ciddî ku li derve, di jiyana mêranî de dimeşin, weke lîstika *namûsê* tên dîtin. Ji ber ku yên di jiyana hevpar de bi awayekî aktîf hene, mêr in, *namûs* weke rêbazekê xwe digihîne mêran. Mêrekî ku bi rastî xwe mêr bibîne, mecbûr e li gorî derfetên xwe hewl bide da ku li derve, *namûs* û xatirê xwe zêdetir bike.²⁹

Mêrekî binamûs li Cezayirê divê serê sibê ji malê derkeve û rojava vegere malê. Heger ku karê wî tune be, divê bi mêrên hinkûfê xwe re li qahweyekê rûnê, agahiyên bikêr bidest bixe, têkiliyên nû ava bike, li ser pîrsgirêkên civakê biaxive, wensa xwe û ya hevalên xwe bîne.³⁰

Di eslê xwe de hem têgeha *namûsê* û hem jî ya *duristiya tekakesî* di jiyane de ji bo parastina nixên girîng tê bikar anîn. Lewma jî herdû têgeh, statuyên îdeolojîk diyar dikin.³¹

Rêbazên civakî yên *namûsê*, di grûbê de eşkere ne û weke *kodên namûsê* ji aliyê hemû kesî ve tên naskirin.³² Ev kod ne nivîskî ne û ji nifşekî derbasî nifşekî dibin.³³ Niyetên mirovan bi van kodan tên stran, *namûs* çawa dikare were bidestxistin û çawa dikare were wendakirin, di van kodan de diyar e. Ev kod bi rêbazên sîstematîk hatine

²⁷ Pierre Bourdieu, *Den manliga dominansen*, r. 29

²⁸ Pierre Bourdieu, *Den manliga dominansen*, r. 65

²⁹ Pierre Bourdieu, *Den manliga dominansen*, r. 63

³⁰ Pierre Bourdieu vgz. Annick Sjögren, *Här går gränsen*. r.158

³¹ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.59

³² Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 65-66

³³ Riyadh Al Baldawi, *Migration och familjestrukturer*. r. 109

hilibjartin û wate ji bo wan hatiye dayîn. Rêbaza girîng, miqatebûna li nirxên bingehî ne. Dema ku mirov li dijî wan tevbigere, mirov *namûsa* xwe wenda dike. Li gorî van kodan, namûs mafekî şexsî ye da ku ew şexs bi nirxekî taybet were pêşwazîkirin. Mêrekî binamûs, bi derûdora xwe re di têkiliyeke xurt de ye: derûdora wî mecbûr e rêza wî bigire. Herweha namûs bi jiyana kollektîf, a malbatê, xizman û hwd. re jî girêdayî ye. Hemû endamên malbatê di namûsê de şîrîkên hevdû ne. Bêxirûrbûna yekî, bandorê li yên din jî dike.³⁴

Namûs li derve ye, di rengê fêmkirina tişt û bûyeran de ye. Lewma paşgotinî girîng dibin. Tiştên ku derûdor dibêjin, xwedî wateyeke mezin e û dikare namûs û xûrûra malbatekê bi temamî xera bike.³⁵

Di civakên wanî de rêya statu û xweşiyê, ango ew tiştên ku di hemû civakan de girîng in lê bi riyên cuda tên bidestxistin, *namûs* e. Di van civakan de, ciyê dewleta xweşhaliyê, *namûs* bixwe dadigire û weke encamekê *namûsa* xas ku xera nebûye, jiyanêke xweş û baş diafirîne.³⁶

Lena-Katarina Swanberg balê dikşîne ser têkiliya gotina *aibah* (eyb) û *namûsê*. Dibêje ev gotina ku tê wateya “şerm, şaşî, devjêberde!”, di zimanê kurdî û erebî de xwedî wateyeke mezin e. Gotina *aibah* gotineke wiha girîng e ku zarokên keç û kur di demeke zû de dibihîzin. Divê keç bizanibin *aibah* çi ye, da ku *namûsa* xwe û ya malê nexin rîskê. Divê kur jî fêr bibin *aibah* tê çi wateyê, lew tê hêvîkirin ku xwişkên xwe biparêzin. Weke mînak kenê bilind, cilên vekirî ku laşê mirov tê re xuya bikin, berî her tiştî paşgotiniyên ku bêjin ev keçik êdî ne bakîre ye, *aibah* in (eyb in).³⁷

Etnolog Annick Sjögren bi awayekî berfireh têgeha *namûsê* dinirxîne û dibêje *namûs* di *çandên namûsê* de dîmenekî wiha ye ku şexs û malbat xwe bi wê îfade dîkin. Hestên *namûsê* yekitiya malbatê xurtir dike. Hemû kesên malbatê, ji *namûsa* malbatê berpirsiyar in. Lê van kesan li gorî asta berpirsiyariyê, dike sê beş. Yek ji vanan mêr, bi taybetî bav e ku weke serokê malbatê tê dîtin, a duyem jin in ku ji ber zayendiya xwe

³⁴ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 65

³⁵ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 67

³⁶ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 73-74

³⁷ Lena-Katarina Swanberg, *Hedersmord på Pela: lilla systemen berättar*, r. 87

xwedî taybetmendî ne û ya sêyem zarok in ku ew jî bi hemû rabûn û rûniştinên xwe di vê dîmenê de cî digrin.³⁸

Mêr xwe weke parêzvanên hemû kesên malbatê û xisman dihesibîne lew mêr ruhê malbatê yê derve ye û mecbûr e ku karibe vê mesûliyetê hilgire. Divê li malê karibe mêvanan pêşwazî bike. Têkiliya mêvanên ku ji cîhana derve tîne mêr pêk tîne û ew mêvan çiqasî dikarin nêzîkî malbatê bibin, mêr diyar dike. Piştî mêr, jin û zarok vê berpirsiyariyê werdigirin.³⁹

Jin bi hêza balkêşiya xwe, berpirsiyariya zayendiyê hildigire. Zayendiya jinê bi jiyana malbatê ve girêdayî ye. Bakîretî û îffeta jinê babeteke malbatî ye û *pirseke namûsê* ye. Yên ku namûsa malbatê li hemberî derve diparêze mêr e, lewma divê bav, mêrê jinê û bira çavdêriya zayendiya jinê bikin. Dema ku keçek zewicî şeva yekem bakîretiya xwe neçespîne, dibe ku malbatê rezîl bike. Bêyî ku tu kes bifikire ev yek ji bo wê keçê tê çî wateyê, ev yek ji bo xûrûra hemû grûbê talûke ye, lewma divê berî her tiştî bakîretiya keçê were parastin.⁴⁰

Namûs cudahiyeke şexsî dixwaze, herweha divê civak biçûk be da ku têkiliyên civakî germ bin. Bi vî awayî çavên endamên civakê li ser hevdû ne.⁴¹

Di jiyana rojane de, ji bo ku mirov xwe ji tolhildanên trajîk biparêze, di rêbazên *namûsê* de nêrîneke pragmatîk jî derdikeve pêş. Divê mirov tiştê eşkere, yê li ber çavan tenê qebûl bike û danekeve kûrahiya tiştan.⁴² Lê heger ku mirov bixwaze *namûsa* xwe biparêze, divê mirov tu gotin an jî helwestên provokatîf, bê bersiv nehêle. Li gel ku ev rêbaz heye jî, hewce nake mirov li hemberî hemû paşgotiniyan bertekê nîşan bide, divê mirov guhê xwe nede hemû paşgotiniyan, an jî weke ku mirov nebihîstibe, tevbigere.⁴³

Helbet *namûsa* malbatê ne tenê bi zayendiya jinê tê parastin, edeba zarokan a derve jî di vê mijarê de rolekî girîng dilîze. Şerê ciwanan, bi şertê ku negîhê sînorên

³⁸ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.57

³⁹ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.57

⁴⁰ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.59

⁴¹ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.59

⁴² Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.65

⁴³ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.65

krîmînalîteyê, ne pir bi talûke ye. Yên ku ji ber sedemên krîmînel têkevin hebsê, malbatê rezîl dikin. Ev qîsûr li hemberî civakê dibe weke mohreke ji her kesî re eşkere. Yê ku berpirsiyariya vê qîsûrê hildigire, bav e.⁴⁴

Li gel ku li hin welatên jêr, ên dora Bahra Spî gotina *namûsê* pir nayê gotin jî, di jiyana rojane de giraniya *namûsê* pir heye. Dema ku sîstema dewletê qels dibe, dibe ku rêbazên *namûsê* ji bo parastina hiyerarşiya civakê weke alternatîfêkê derkeve holê. Wê gavê meşandina sîstema civakê bi pênasîna *namûsê* û baweriya bi wê, dimeşe, li gel ku di civakên modern de sîstem li ser rêbazên demokratîk dimeşin.⁴⁵

1.2.3. Hedersmord⁴⁶

Têgeha *hedersmord*, navekî hevedûdanî ye. Ji gotina *heder* ku tê wateya *namûsê* û gotina *mord* ku tê wateya *kuştinê* hatiye afirandin.⁴⁷ Lê çî nivîskî, çî jî devkî, di zebatan de yê ku ji bo vê teze hatine kirin têgeheke ku wateya “hedersmord”ê bide xuya nabe. Lewma mirov dikare wateya vê têgehê bi wergerê rave bike. Ji ber ku bi fikra ku ev kuştin ji bo parastina *namûsê* tê kirin, ev nav lê hatiye kirin, bi alîkariya Prof. Dr. Kardi Yıldıırım, ev têgeh weke *kuştina namûsî* ji bo kurdî hat wergerandin. Herweha bahsa gotinên weke *kuştina ji bo namûsê*, *kuştina li ser namûsê* û hwd. jî hat kirin.

Lê di navbera tiştên ku kurd ji *kuştina namûsî*, *kuştina ji bo namûsê* û *kuştina li ser namûsê* û hwd. fêm dikin û tiştên ku swêdî ji “hedersmord”ê fêm dikin de, cudahiyên ciddî hene. Di “hedersmord”ê de yê ku tîna kuştin jin in, bi taybetî keça malbatê ye.⁴⁸

Li gorî ferhenga Svenska Akademien; ji bo ku *namûsa* malbatê were paqijkirin, ji *kuştina* jinên malbatê, yê ku *namûsa* malbatê gemarî kirine re “hedersmord” tê gotin.⁴⁹ Amnestiya Navnetewî ya Şaxê Swêdê dibêje dema ku keçek berî bizewice

⁴⁴ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.66

⁴⁵ Annick Sjögren, *Här går gränsen* r.68

⁴⁶ Weke “hedersmurd” tê xwendin.

⁴⁷ Reşo Zilan, *Ferhenga swêdî-kurdî, lexin Språkklexikon för invandrare*, Statens Institut för Läromedel (SIL), Stockholm, 1989

⁴⁸ Ferhad Şakelî, *Hevpeyvîn li Zanîngeha Uppsalayê* 06.05.2003

⁴⁹ <http://www.svenskaakademien.se> (13 Gulan 2001)

têkeve têkiliyeke zayendî, yan zewicî be, lê bi hin kesên din re têkeve têkiliyeke zayendî, tê kuştin. Ji vê kuştinê re “hedersmord” tê gotin.⁵⁰

Rêxistina Amnesty International şaxê Swêdê bahsa çend sedemên “hedersmord”ê yê din jî dike. Radigihîne ku jin ne ji ber têkiliyên zayendî tenê, herweha ji bo zewaca bi mêrê ku ew bixwe dibijêrin, ji bo qetandina ji mêrê ku li wê dixwe, ji bo flortkirinê, ji bo îteata kêr û ji bo ku wê “destûr daye” tecawizî wê were kirin jî tên kuştin.⁵¹

Amnesty balê dikşîne ser mêrên homoseksuel û dibêje mêrên ku pêrgî “hedersmord”ê dibin jî hene. Ne tenê keç û jin, herweha dema ku kur jî dijî normên zayendî yê civakê tevbigerin, dibe ku têkevin rîska “hedersmord”ê. Weke mînak di van salên dawiyê de, li Swêdê rewşa kur/mêrên homoseksuel ku dibin armanca çewisandinê, bala mirov dikşîne.⁵²

Lijneya Zimanê Swêdî li ser wateya ku ew bixwe li “hedersmord”ê bar dikin, nerazîbûna xwe diyar dike û dibêje: “Em wan daxwazên hewqasî hişk, ên li ser namûsa malbatê qebûl nakin. Berî her tiştî em fêr nakin ku hin kes di malbatê de namûsê hewqasî girîng bibînin ku keça xwe, xwişka xwe yan jî hin jinên din ji malbatê, bi fikra ku malbat gemarî kirine, bikujin.”⁵³

Ansîklopediya swêdî ya Netewî (Nationalencyklopedin) “hedersmord”ê weke Lijneya Zimanê Swêdî rave dike û dibêje “hedersmord” helwesteke hêzê, ya ku sedema wê sererastkirina namûsa malbatê yan a xizman e.⁵⁴

Li gorî antropologa civakî Unnî Wikan “hedersmord” tê wateya ku mirov xwe bi kuştina keç an kuştina xwişka xwe, ji eybê dişo. Ji bo pêkhatina vê yekê, divê komeke mirovên di heman fikrê de û bi heman kodan tevdigerin, hebe.⁵⁵ Dema ku rabûn û rûniştina keçekê yan a jinekê li dijî normên civakê çê dibe, malbat namûsa xwe wenda

⁵⁰ <http://www.amnesty.se/vad-gor-vi/kvinnors-rattigheter/hedersmord/>

⁵¹ <http://www.amnesty.se/vad-gor-vi/kvinnors-rattigheter/hedersmord/>

⁵² <http://www.amnesty.se/vad-gor-vi/kvinnors-rattigheter/hedersmord/>

⁵³ <http://www.spraknamnden.se/> (Malpera fermî, ya Enstîtuya Ziman û Bîra Gel)

⁵⁴ <http://www.ne.se/hedersmord> (18.05.2013)

⁵⁵ Unni Wikan, *En fråga om heder*, r. 39

dike.⁵⁶ Ne namûsa bav an a mêrê wê jinê tenê, namûsa temama malbatê û ya temama xizman di meseleyê de ye.⁵⁷ Dema qenaet rûnişt ku jinekê malbata xwe gemarî kiriye, mêrên malbatê amade ne ji bo ku namûsa malbatê paqij bikin. Temama xizman jî hêvî dikin ku bi kuştina keç an a jina ku ew şaşî kiriye, namûs were paqijkirin. Lewma ev kuştin weke kuştineke rast tê dîtin. Bi vî awayî çewisandinên derûdorê bi bav an bira “hedersmord”ê dide kirin.⁵⁸ Weke ku diyar e, mêrekî ku “hedersmord”ê dike, ne namûsa xwe tenê diparêze, herweha exlaqê civakê jî diparêze.⁵⁹

Di derbarê civakên ku “hedersmord” lê dimeşe de, Astrid Schlytter ku li Zanîngeha Stockholmê doçenta civaknasî ye, bahsa zewaca keçan dike û dibêje dema ku keçek dizewice divê destê tu kesî bi wê nebûbe. Bakîretî di zewacê de mijareke diyarker ye. Heger ku ne bakîre be, dibe were redkirin û were kuştin. Jiyana keçekê ya evînî û zayendî, di civakê de statuya wê diyar dike. Başbûna wê li gorî paşgotinîyên ku berî zewacê li ser wê tên kirin, diyar dibe. Hetta, tiştê ku jê tê xwestin ew e ku bi xortan re nepeyive û têkiliyên wê bi wan re çênebe. Heger ku keç doza azadiya xwe bikin, malbat û xizmên wan namûsa xwe wenda dikin. Ji bo ku malbat namûs û şerefa xwe dîsa bişûnde bistînin, dibe ew keç bibe qurban û were kuştin.⁶⁰

Armanca “hedersmord”ê ew e sîstema ku jin bi awayekî kollektîf lê hatine cezakirin û kêmxistin û bi vî awayî bûne malê mêran, were parastin.⁶¹ Li welatên misulman, gelek bûyer rê didin, jinên ku tên tecawizkirin, ji bo “hedersmord”ê dikevin rîskê. Tecawiz, ne weke kêmxistin û şikenandina tekakesî, lê weke sûcekî li hemberî jiyana kollektîf tê dîtin. Dema ku tecawiz eşkere dibe, mêzîn bi carekê hildiweşe. A herî xerab ew e; weke ku jinê, malbat û temama civakê gemarî kiribe, tê dîtin.⁶²

Fereshteh Ahmadi Lewin û Bo Lewin çandan weke *çandên fediyê* û *çandên sûcî*, dike du beş. Di *çandên sûcî* de tekakes li hemberî civakê ne berpirsiyar e û ew bi xwe, xwe dîsîplîne dike. Di *çandên fediyê* de şexs li hemberî malbatê û civakê berpirsiyar e.

⁵⁶ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 57-58

⁵⁷ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 66

⁵⁸ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 21

⁵⁹ Unni Wikan, *En fråga om heder*. r. 65

⁶⁰ Kovara *Socionomen* 3, 2002. r. 9

⁶¹ Rojnameya Expressen, *En rättvis dom*, 04.04.2002

⁶² Charlotte Westerberg, *Heder Och Samvete Det svenska rättsystemets hantering av hedersmord*, r.14

Di *çandên fediyê* de di navenda jiyânê de namûs heye, di navenda namûsê de jî jin û bi taybetî keça malbatê heye. Ji keçan tê hêvîkirin ku bakîretiya xwe heta zewacê biparêzin. Heger ku gotin were ser zayendiya keçê, keç bi kuştinê re rû bi rû dimîne. Di mijarên zayendî de temama endamên malbatê, heta etnisiteya ku ew keç bixwe jê ye jî mudaxil dibin.⁶³

1.2.4. Nîqaşên “Hedersmord”ê

Her çiqas bi tevahî “hedersmord” weke encama rêbazên çandî tê dîtin jî, hindik bin jî, hin kesên ku “hedersmord”ê weke encama civaka patriarkal dibînin, hene. Lê çi ji ber hindikbûna wan, çi jî ji ber gelek sedemên din, dengê van kesan dernakeve.

Sosyolog Doç. Dr. Masud Kamali ku bi eslê xwe faris e û ji Îranê ye, nirxandineke cuda dike. Kamalî çandê weke nirxekî homojen û statîk nabîne û bi herêmên coxrafîk ve girê nade. Bi taybetî kuştina Fadîme Şahîndal weke encama nakokiyên navbera çanda swêdî û ya biyanîyên Swêdê dibîne. Kamali bahsa du aliyên çandê dike; yek jê sembol, nirx û şiklê tercumekirina tiştan, a din helwestên civakî. Çand ne tişteki statîk, ne jî tişteki biçûk e. Çand bi têkiliyên civakî tê afirandin û xwe diguhere, herweha bi şertên civakî ve jî girêdayî ye û ev rewş alîkariya afirandin û guhertinê dike. A herî girîng ew e ku bi naveroka xwe ve girêdayî ye. Lewma divê ev rewşa civakî bi herêmên coxrafîk ve neyê girêdan.⁶⁴

Kamalî nîqaşên ku piştî kuştina Fadîme Şahîndal li ser kurdan hatin kirin, rexne dike û dibêje bîyî ku cudahiya têkiliyên civakî yên herêmên ku kurd lê dijîn were fikirandin, çandên kurdan bi yekhejmarî tînen qebûlkirin û weke ku taybetmendiyên vê çandê bi hemû kurdan re hebe, tê nirxandin.⁶⁵

Masud Kamali balê dikêşe ser herêmên Swêdê yên ku biyanî lê pir in û dibêje nîqaşên ku li ser “hedersmord”ê tînen kirin, encamên şert û mercên çanda herêmên ku

⁶³ Kovara *I&M Invandrare Minoriteter* 3. 2002. r. 15

⁶⁴ Kovara *Socionomen* 2. 2002 r. 12

⁶⁵ Kovara *Socionomen* 2 2002 r. 13

biyanî lê pir in bixwe ye. Bahsa teoriyeke nû dike û dibêje ku li herêmên wanî ji ber têkiliyên di navbera etnîsîte û çandên cuda de, çandêke melez derdikeve holê.⁶⁶

1.2.4.1. “Hedersmord” Çandî ye

Ji kesên ji rêzê heta kesên ronakbîr, siyasetmedar, akademîsyen û hwd, bi tevayî “hedersmord” li Swêdê weke helwesteke çandî tê dîtin.

Astrid Schlytter, ku li Zanîngeha Stockholmê li Enstîtuya Xebatên Pêşerojê û Enstîtuya Karên Civakî dixebite, “hedersmord”ê weke helwesteke çandî dibîne. Schlytter dibêje di çandên namûsê de dema ku keçek dizewice, divê tu kesî dest nedabe wê. Lew bekarê mijareke diyarker e. Heger ku ne bakîre be dibe ji malbatê were redkirin û were kuştin.⁶⁷

Josefîn Brînk ku şefredaktora kovara *Bangê* ye jî, “hedersmord”ê weke helwesteke çandî dinirxîne û li gorî wê yên ku di bûyerên wanî de maxdûr dibin jin in. Statuya jinan di bin a mêran re ye, dema ku bi awayekî derdikevin pêş, tîcêzakin.⁶⁸

Nivîskar Anette Andersson jî dibêje di “hedersmord”ê rengê çandî heye û îddîa dike ku sazîyên Swêdî kuştinên wiha weke kuştinên asayî nabînin dema ku rengê çandî tê de hebe. Herweha bûyera Fadîme jî bûyereke bi vî rengî dibîne û çanda swêdî bi “durûtîyê” tawanbar dike. Li gorî wê heger ku sazîyên swêdî bi durûtî tevnegeriyaba, ev kuştin ê pêk nehata. Vê yekê bi mînakê rave dike: Dema ku Filîstîniyekî xiristîyan, ji bo ku keça wî ya hîjde salî bi xortekî misulman re bû, bi kêrê keça xwe kuşt. Ev bav ji dêvîla kuştinê, ji bo birînkirinê hat cezakin. Anderson îddîa dike ku çanda erebî bûyerên bi vî awayî teşwîk dike lewma ev bav bi dijwarî ketiye nav vî helwestê.⁶⁹

Fereshteh Ahmadi Lewin û Bo Lewin bi hevdu re, mijarê bi perspektîfeke sosyolojîk dinirxînin. Balê dikşînin ser pergala civakê ya çandî û bahsa mesafeya navbera gurûb û tekakesan dikin. Dibêjin li civakên Rojava ku li ser çanda tekakesî

⁶⁶ Kovara *Socionomen* 2, 2002 r. 13

⁶⁷ Kovara *Socionomen* 3, 2002 r. 9

⁶⁸ Kovara *ETC* 1 2002 r. 31

⁶⁹ Kovara *ETC* 1 2002. r. 7

hatine avakirin, şexs berê tê. Lê di wan civakan de, yên ku li ser çanda kollektîfî hatine avakirin, rewş eksê vêya ye, fikra kollektîfî û hevkarî berê tê.⁷⁰

Herdû nivîskar di çanda tekakesî de *sûc* û di çana kollektîfî de *fediyê* weke taybetmendiyên sereke ku herdû çandan ji hevdû cuda dikin, dinirxînin. Kesekî ku di çanda tekakesî de dijî, ew bixwe ji ber tevgera xwe ya şexsî (lê ne tevgera kesên din) berpirsîyar e. Di civaka wanî de kontrola civakî di hundurê şexs bixwe de bi hestên *ûcdan* hatiye avakirin û ev kontrol rê li ber kiryarên sûcî digire. Lê di çandên fediyê de ev yek bi tamamî tê guhertin. Kontrola civakî ku heye, li derveyî şexs, ji aliyê gurûbê ve tê kirin. A herî girîng ew e ku li hemberî kesên din serê wî neyê xwarê. Dema ku mijar zayendiya jinê û têkiliyên zayendî be, ev rêbaz hîn hişktir û dijwartir dibe.⁷¹

Nivîskara bi navê Caroline Hemlin, zayendiya keça malbatê nîqaş dike û çanda civakên ku “hedersmord” lê pêk tê, di nivîsekî de weke “çanda bakîretiyê”⁷² û di nivîseke din de weke “çanda îffetê”⁷³ bi nav dike. Dibêje di çandên wanî de, rabûn û rûniştina keçê, bi taybetî parastina bakîretiya keçê, bi namûsa malbatê ve girêdayî ye.⁷⁴ Balê dikşîne ser zayendiya keçan û dibêje bakîretiya keçan bi namûsa malê ve girêdayî ye. Vêya regekî jiyana ye ku bi dijwarî li gelek herêmên Asya, Afrika û Rojhilata Navîn jiyana jinan bi sînor dike û wan dixê tengasiyê.⁷⁵

Di derbarê jiyana keçên biyanî, yên ku li Swêdê dijîn de Astrid Schlytter dibêje têkiliyên civakî yên keçên biyanî li gorî rêbazên *çanda namûsê* tîndîr diyarînin. Li gorî wê divê dayîn û stendina keçan bi xortan re tune be, bi wan re nepeyivin da ku li pişt wan gotinên xerab neyên gotin. Ev giranî dibe sedem ku dê û bavê keçan, wan bi zorê bi hin kesan re ku ji welêt tîndîr bizewicîne. Schlytter îddîa dike ku ev yek di nav biyaniyan de zewaceke ji rêzê ye. Li gorî wê dê û bav bi vî awayî kevneşopiyên xwe diparêzin û neqlî nifşên nû dikin.⁷⁶

⁷⁰ Kovara *I&M Invandrare och Minoriteter* 3 2002. r. 9

⁷¹ Kovara *I&M Invandrare och Minoriteter* 3 2002. r. 10

⁷² Kovara *Bang* 2001 2 r.51-52

⁷³ *Bang* 2 2002 r. 5

⁷⁴ Kovara *Bang* 2001 2 r.51-52

⁷⁵ *Bang* 2 2002 r. 5

⁷⁶ Kovara *Socionomen* 3 2002 r. 10

Schlytter dibêje sedem ev e ku di navbera nifşên nû, bi taybetî di navbera keçan û malbatên wan de nakokî hene. Heger ku keç nexwaze li gorî çand û kevneşopiyên malbatê bimeşin, ew keç bêqîmet tên dîtin.⁷⁷

1.2.4.2. “Hedersmord” Patrîarkalî ye

Li gorî hin kesan “hedersmord” encameke sîstema civaka patrîarkal e, lewma ne li hin herêman tenê, li temama cîhanê ev bûyer pêk tê. Lew li temama cîhanê sîstema patrîarkal heye.

Amnestiya Navnetewî, Şaxê Swêdê dibêje di civakên patrîarkal ên dijwar de, têkiliyên jinan ên berî zewacê yan jî têkiliyên jinên zewicî yên derveyî zewacê, ji bo namûsa mêran û ya malbatê, tehdîta herî mezin tê dîtin. Têgeha *namûsê* bi zayendîya jinê ya qedexe, bi tevgerêke bêexlaqî yan jî tevgerêke ku nayê qebûlkirin ve girêdayî ye. Dema ku jin, ne bi tevgera xwe ya rastî yan a ku jê tê hêvîkirin, lê li hemberî normên civakî tevbigerin, malbata xwe, herweha temama xisman, heta civakê gemarî dikin.⁷⁸

Redaktora kovara *Bangê* Josefîn Brink, “hedersmord”ê di civaka patrîarkal de li hemberî statuya jinê, weke cûreyekî xwe îfadekirinê dinirxîne. Ev îfadekirin li cîhanê li herêmên cuda bi tevgerên cuda derdikeve holê, lew li her derê heman bingeş û heman naverok heye. statuya jinan di bin a mêran re ye, dema ku hewl didin xwe ji vê statuyê xelas bikin, bi dijwarî tên cezakirin.⁷⁹

Brink hemû zulma li ser jinan, bûyerên lêxistin û kuştinê, yên ku di civaka swêdiyan bixwe de pêk tînin weke encameke civaka patrîarkal dinirxîne û navê “hedersmord”ê lê dike. Balê dikşîne ser cudahiya nêrîna swêdiyan a li ser “hedersmord”ê û zulma li ser jinên swêdî û dibêje swêdî naxwazin lêxistin, tecawiz û kuştinên di civaka xwe de bibînin lewma navê “hedersmord”ê lê nakin daku tehdîtên wanî ji xwe dûr bixin. Tehdîtên wanî dixin kreşan, dixin kuçeyên tarî, heta hîn dûrtir dibin, dixin çandên din. Brinks kesên ku “hedersmord”ê di çandên din de dibînin rexne

⁷⁷ Kovara *Socionomen* 3 2002 r. 10

⁷⁸ <http://www.amnesty.se/vad-gor-vi/kvinnors-rattigheter/hedersmord/>

⁷⁹ Kovara *ETC* 1 2002

dike û bibîr tîne ku mêrên swêdî yên ji rêzê jî li hemberî jinê hêzê bikar tînin, lê swêdî naxwazin bibînin.⁸⁰

Redaktora kovara *Kvinnor mot Fundamentalism (Jinên Dijî Fûndamentalîzmê)* Sholeh Irani, bi perspektîveke femînîstî mijarê dinirxîne. Li gorî wê şert û mercên aborî û civakî rêbazên wanî diyar dike, lewma li civakên ku di warê aborî û civakî de pêş ve neketine, bûyerên wanî bêtir diqewimin. Tiştê ku namûsa eşîr û malbatê diyar dike, zayendiya jinê ye. Ji ber vê yekê, jinên ku îteat nakin û li hemberî vê rêbazê derdikevin, weke qurban tên kuştin.⁸¹

Irani balê dikêşîne ser medernîzma global û rola modernîzmê di hilweşîna desthilatdariya mêran de girîng dibîne. Li hemû herêmên cîhanê pêşveçûna aborî û civakî dibe sedem ku pergala desthilatdariya mêran hêza xwe ya berê wenda bike. Bahsa şert û mercên bingeha fikrên wanî dike û dibêje li welatên ku demokrasî û refaha aborî lê tune ye, çandên patriarkal û bişûnde mayî xwebixwe diafirînin. Kurdistanê, têkoşîna kurdan û gelek saziyên ku li Kurdistanê ji bo guhertina kevneşoyên wanî hatine avakirin, weke mînak nîşan dide. Îranî bi taybetî civaka swêdî hişyar dike da ku hemû mêrên kurd ji ber bûyerên wanî tawanbar nekin.⁸²

1.2.5. Pêşniyazên Çareserîya “Hedersmord”ê

Weke tê dîtin di têgeha “hedersmord”ê de swêdî weke hev difikirin û teoriyên xwe li ser vê bingehe ava dikin. Lê di derbarê çareserîya vê pirsgirêkê de, pêşniyazên cûda tên kirin.

Carolina Hemlin “hedersmord”ê weke xaleke hessas dinirxîne û vê hesasiyetê ji bo nîqaşa wê weke asteng dibîne. Lewma nîqaşên ku bi bûyera Fadîme Şahîndal dest pê kirine jî weke destpêkeke dereng dibîne. Li gorî wê sedem ew e ku niha bi awayekî egzotîk, xerîb û heta, hinekî bi kelecana tê ravekirin. “Kesên ku vî sûcî dikin, bi awayekî

⁸⁰ Kovara *ETC* 1 2002

⁸¹ Kovara *Kvinnor mot Fundamentalism* 4 2002 r. 13

⁸² Kovara *Kvinnor mot Fundamentalism* 4 2002 r. 14

radîkal û ji “me” swêdiyan cuda tèn nîşandan.”⁸³ Hemlin medya, ji ber ku di avakirina hestên “em” û “ew” de rolekî girîng dilîze, tawanbar dike. Bi vî awayî medya, mêrên biyanî, yên ku di “hedersmord”ê de rol dilîze, teqez eksê mêrên swêdî yên spî nîşan dide.⁸⁴

Li gorî Hemlin lazim e xebat li ser cûdahî û dûrahiya navbera çandên biyanî û ya swêdî were kirin û herdû çand bigihên hevdû. Li gorî wê, lazim e di vê xebatê de hunerê pejiwandina cudahiyan derkeve holê, bi vî awayî divê gihaştina hevdû û heta nakokiyên navbera çanda îffetê û çanda wekhevîyê werin qebûlkirin.⁸⁵

Massoud Kamali di çareseriyê pirsgirêkên wanî de, rola saziyên swêdî yên têkildar girîng dibîne. Kamalî bibîr dixîne ku li gelek welatên ku biyaniyî jê hatine, saziyên fermî û gelêrî di rewşeke marjînal de ne û di jiyana rojane de rolekî girîng nalîzin. Ji ber vê yekê dibe ku ji bo hin biyaniyan, li Swêdê, bi armanca çareseriyê problemên wanî, têkiliyên bi saziyên têkildar re zahmet be. Helwesteke wanî li hemberî karkerên saziyan, hestên “me” û “wan” çê dike.⁸⁶ Kamalî balê dikêşîne ser rola medya û dibêje di heman demê de medya jî pirsgirêkên li ser çand û hewldanên çandî hêsan dikin. Herweha ev yek jî dibe sedem ku di nav gelê ji rêzê de pêşdarazî bêtir û diwartir bibin.⁸⁷

Nivîskar Anette Andersson kuştina Fadîme Şahîndal weke têkçûyîna polîtîka entegrasyonê dibîne. Saziyên Swêdê rexne dike û wan bi fêrnêkirina rewşa malê ya keçên biyanî, tawanbar dike. Li gorî wê, polîsan xwestiyê alîkariya Fadîme bikin lê siyasîmedaran piştî xwe dane wê. Di vê bûyerê de ji ber helwesta medya, pesnê medya dide. Li gorî wê bi giştî rojnamegeran kirin ku gel bertekê nîşan bide lê nekirin ku ji bo çareseriyê tevbigerin.⁸⁸

⁸³ Kovara *Bang* 2. 2002 r. 5

⁸⁴ Kovara *Bang* 2. 2002 r. 5

⁸⁵ Kovara *Bang* 2. 2002 r. 5

⁸⁶ Kovara *Socionomen* 2. 2002 r. 13

⁸⁷ Kovara *Socionomen* 2 2002 r. 13

⁸⁸ Kovara *ETC* 1 2002. r. 7

BEŞ II

AGAHIYÊN GIŞTÎ DI DERBARÊ JINÊN KURD DE

Ji ber ku kuştina Fadîme Şahîndal weke “hedersmord” hat binavkirin û “hedersmord” jî weke encameke rewşa jinê ya di çanda kurdî de tê dîtin, lazim e mirov di derbarê ciyê jinê yê di çanda kurdî de dîmenekî giştî bide. Gelo bi rastî dibe ku rewşa jinê ya di çanda kurdî de bibe sedema bûyereke wiha yan na, wê bi vê dîmenê baştir were fêmkirin.

Di dîroka kurdan de gelek jinên bi nav û deng peyde bûne û demên dirêj desthilatdariya civakê kirine, ji bo pêşveçûna civakê xebitîne, ferman dane, qanûn derxistine. Bi desthilatdariyên dora xwe re hevdîtinên siyasî, bi dîplomatên navnetewî re têkiliyên dîplomatîk kirine, fermanên şer dane û aştî ava kirine.

Herweha di warê ronakbîrî de jî li gorî jinên gelên cîran ên hevdemên xwe rolekî berbiçav listine. Gelek jinên alim û ronakbîr hebûne ku di wêjeya kurdî de ciyekî berbiçav girtine.

Ji ber girîngiya vê yekê, ev rewş li jêr xal bi xal tê vegotin.

2.1. Jinên Kurd di Dîrokê de

Lêkolînên ku di derbarê statuya jinê ya dîrokî de hatine kirin, agahiyên balkêş didin. Tê gotin ku di baweriyên lûlûyên ku pêşiyên kurdan tînin qebûlkirin de, îlahe hebûn. Ev îlahe di ser qralan re bûne. Biqasî 4300 sal berê, lûlûyan bawer dikirin şerê ku Qralê wan Abubanî li hemberî hêzên samiyan kiriye, bi saya îlaheyan biser ketiye. Ji ber vê serkeftinê, îlaheyekê xelemekê daye wî û ew pîroz kiriye.⁸⁹

Di sala 1998an de li bakurê Keleha Hekarî çend tabletên ku di derbarê jinên pêşiyên kurdan de agahiyên balkêş didin, hatine dîtin. Ji 13 stellên ku hatine dîtin, 11 heb ên şervanên mîr, 2 heb jî yên şervanên jin in. Li gorî Prof. Veli Sevin, ev stell ji bo ruhê pêşiyên ku mirine sembolîze dikin, hatine çêkirin. Heger ku ev analîz rast be, berî 3500 salî Qraliyeta Hûbîşî ku bi koka xwe hurî ye, biqasî ku di stellên abîdeyên xwe de

⁸⁹ Îhsan Colemêrgî, Uluslar arası Kürt Kadın Kongresi, “Zagroslarda İştâr’ın İzleri” r. 165

cî didin jinan, rêza mezinên xwe yên jin digirin. Herweha ji 79 îlahên ku ûrartûyan jê bawer dikirin, 16 heb îlahe bûn.⁹⁰

Di mîtolojiyên kurdan de jî jin ciyekî girîng digirin. Weke mînak di destana Memê Alan de, sê keçên Padîşahê Periyân hene. Navê yekê Rojbanû, navê ya din Aybanû û navê ya sisiya Stêrbânû bûye. Ev hersê keç bi alîkariya cinan diherin Cizîrê, radîhêlin Zînê û dibin Mexribê cem Memoyê evîndarê wê û wan digihînin hevdu.⁹¹

Lêkolînên ku li ser jinên Anadolê û Mezopotamyaya kevn hatine kirin, rê didin ku 4000 sal berê bi gelek awayan ciyê jinê li gorî îro hîn pêşdetir bûye. B.z. di salên 2000an de jinan di warê dînî, bazirganî, îdareya dewletê û îdareyên gelek rewşên din de cîh digirtin. Di zewac û hevdûberdanê de jin weke mêran xwediyê heman mafî bûne, di kiryarên zînê de jî, jinan li gorî rewşê ceza nedigirtin.⁹²

Di nav hin qewmên pêşiyên kurdan, di nav Hurri-Gûtiyan de, jinan pir caran serokatiya arteşê kirine. Hema hema 2000 sal piştî Gûtiyan, dîrokzanê Yûnan-Romayî Plutarch dibêje gelê Kurdistana Bakur û yê Kurdistana Rojava, b.z. di sedsala 1'ê de li hemberî dagirkirina arteşên romayîyan, erdê xwe bi hemû hêza xwe parastine. Di nav van şervanan de, bi taybetî bahsa hebûna jinên "Amazon" dike. Jinên çekdar ji bo yûnanî û romayîyan dihatin wateya naletê.⁹³

Dema ku hanedana kurdan a bi navê Zend ku li Rojhilata Navîn hanedana kurdan a dawiyê bû (1750-1790), êrîşî Qraliyeta Farisan dike, di seferên leşkerî de gelek jinên şervan hebûne.⁹⁴

Lêkolîn li ser jinên kurd ên demên selçûkiyan jî hatine kirin. Di wê demê de, jinên kurdan li gel mêrên xwe şer dikirin û di şeran de xizmeta pişt şer dikirin, bi taybetî av tanîn û alîkariya birîndaran dikirin.⁹⁵

⁹⁰ Îhsan Colemêrgî, *Uluslar arası Kürt Kadın Kongresi, "Zagroslarda İştâr'ın İzleri"* r. 166

⁹¹ Îhsan Colemêrgî, *Uluslar arası Kürt Kadın Kongresi, "Zagroslarda İştâr'ın İzleri"* r. 168

⁹² Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 7

⁹³ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 337

⁹⁴ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 338

⁹⁵ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 10

Rewşa jinên kurd, di dema Osmaniyan de jî xwedî taybetmendî ye. Gelek eşîrên kurd bi serokatiya jinan li hemberî Osmaniyan şer kirine. Mama Pura Halimeya Fizhdarî, Mama Kara Nêrgiza seroka eşîra Şivan, Mama Pêşenga seroka eşîra Milan çend jinên wiha ne ku serokatiya eşîran kirine.⁹⁶

Di dema Osmaniyan de, jinek ji jinên serdest ku pir dihat bahs kirin, Fata Reş e. Fata Reş di Şerê Kirimê de, li gel 300 leşkerên siwarî çûye Stenbolê û li Saraya Osmaniyan bi padîşah re hevdîtinên girîng kirine. Tê gotin ku nêviyê leşkerên wê jin bûn. Vê rewşê pir bala çapemeniya welatên Rojava kişandiyê, lewma gelek kovar û rojnameyan di weşanên xwe de Fata Reş bi navê “Amazona Kurd” binav kirine.⁹⁷

Li gorî hin lêkolîneran, şêwaza aboriya kurdan, jinên kurd mecbûrî beşdariya civakê dike. Tê gotin ku aboriya kurdan, berî zayinê, piştî zayinê û îro jî, bêtir li ser cotkarî û heywanan bûye. Ev pergala aboriyê bi awayekî xwezayî jin û mêran mecbûrî xebata bi hevdû re dike. Ev têkiliyên hilberînê jinê mecbûr dike û dixê nav jiyana xebatê.⁹⁸

2.2. Azadiya Jinên Kurd

Lêkolîn û çavdêriyên ku berî avakirina Komara Tirkîyeyê, ji aliyê kesên biyanî ve, di derbarê azadiya jina kurd de, hatine kirin, agahiyên balkêş didin. Seyyahên ku hatine li Kurdistanê geriyane, radigihînin ku di warê azadiyê de, rewşa jinên Kurdistanê ji jinên Tirkîyeyê û yê Îranê baştir e. Jinên kurd ji aliyê mêrên xwe ve têkiliyeke wekhev dibînin; mêr bi dê û bav, xwişk û birayên xwe ve girêdayî ne, li hemberî jinan bi wekhevî tevdigerin. Di suwarî û şervaniyê de jî jinên kurd ji yê gelên cîran cûda ne, lewma bi pesin bahsa suwarî û şervaniya wan tê kirin.⁹⁹

Li gorî jinên Rojhilat, weke mînak li gorî jinên Çînî, Îranî û Hindî jinên kurd bêtir azad in. Di sedsala 1500î de jineke kurd bi navê Xanzad, piştî birayê xwe yê

⁹⁶ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 15

⁹⁷ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 76

⁹⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. XIII

⁹⁹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 131

mezin, li gel ku gelek birayên wê jî hebûne, wê bixwe desthilatdariya herêma Soran û Herîrê kiriye û gelek salan kurd îdare kirine.¹⁰⁰

Biqasî ku di nav jinên Rojhilat de jina kurd, jina herî azad tê dîtin, ewqasî tê diyarkirin ku cesaret û mêrxasiya wan jî biqasî ya mêran e. Weke mînak, pir bahsa Fata Reş tê kirin. Fata Reş ku li Rewandiza Torosa dijiya, di Şerê Kirimê de hêzeke xwe yê leşkerî ava kiriye, ji bo ku li gel Padîşahê Osmanî, li hemberî rûsan şer bike çûye Stenbolê, ba padîşahê Osmanî.¹⁰¹

Mehmet Bayrak radigihîne ku nivîskarê awistûrî, Amand Freiherr Von Schweiger-Lerhenfeld balê dikşîne ser xwezaya dijwar a ku jinên kurd tê de dijîn û di stendina karakterê wê de bahsa bandora vê xwezayê dike. Li gorî wî jinên kurd di xwezaya Kurdistanê ya dijwar de şikil stendine, karakterê wan jî weke vê xwezayê dijwar bûye. Lewma bi hêsanî hin caran bi tena serê xwe bi mehan li zozanan dimînin, hin caran jî li kelehê li rex mêrê xwe, ji bo mêvanên xwe mazûbantiyê dikin. Di derbarê têkiliyên xanedan û hareman de yên ku di dema osmanî û farisan de hebûn, rewşa jinên kurd ji yên faris û osmanî baştir dibîne, lew di vê xalê de di nav kurdan de harem tune bûne, herweha jinên kurd weke jinên tirk û faris haremê nas nakin. Di jiyana û karê malê de lezgîn in û têra xwe bi huner in.¹⁰²

Elly Bannister Soane di derbarê azadiya jinên kurd de agahiyên balkêş dide. Li gorî nirxandinên wî, jinên kurd bi awayekî berbiçav azad in û di helwesta xwe de samîmî û cesûr in. Soane pesnên jinên kurd dide û dibêje biqasî ku di karên malê de hêjayî pesnan in, bi xweşikbûna xwe ya fîzîkî jî pesnan heq dikin. Gelek ji wan bi hêz in û siwarên sivik in, dikarin çekan bi kar bînin, di eşîrên hîn şervantir de, jin bixwe beşdarî şeran dibin.¹⁰³

Mark Sykes jî azadiya jinên kurd berfireh dibîne û di rewşên weke siwarbûna li hespan û bikaranîna çekan de, wan weke mêran çalak dinirxîne. Di xala kar û xebatê de

¹⁰⁰ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 339

¹⁰¹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 26

¹⁰² Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 28

¹⁰³ E. B. Soane, *Mezopotamya'ya ve kurdistan'a Gizli Yolculuk*, r. 406.

jî radigihîne ku ji bilî çêkirina mêst, kilana dew, çêkirina rûn û karên din ê malê tu karên din nakin.¹⁰⁴

Serdarê înglîz E. W. Charles Noel di derbarê têkiliyên sosyal bi kesên biyanî re de, bahsa rihetiya jinên kurd dike. Dema ku li kurdistanê geriyaye, xwestiye wêneyê wan bikîşîne, jinan bêyî ku xwe ji wî vegirin destûr dane wî ku wêneyê wan jî weke yê mêran bikişîne. Di vê xalê de mêrekî kurd rîspî jê re gotiye ”jinên me naşubin jinên tirk. Jinên tirk serê xwe digirin û çîpên xwe vedikin, lê yên me eksê wan dikin.”¹⁰⁵

Kurdologê Brîtanî Godfrey Rolles Driver bi tevahî jina kurd di tevgera xwe de azad dibîne. Di warê civakî de, diyaloga bi wan re hêsan dibîne, herweha Driver radigihîne ku kêma zêde li temama eşîran jin vekirî ne û xwe nanixwêmin. Di warê wekheviya jin û mêran de jina kurd û ya tirk dide berhev û dibêje dema ku mirov rewşa jinên kurd bi rewşa jinên tirk a koletiya gerdîşî dide ber hev, jinên kurd ji aliyê mêrên xwe ve bi helwesteke wekhev tîna pêşwazîkirin.¹⁰⁶

Di civakeke îslamî de, nenixumandina jina kurd bala kurdologê Fransî Thomas Bois jî kişandiye, lewma Bois bi taybetî di agahiyên xwe de radigihîne ku jina kurd serçavê xwe nanixwême. Eksê wê îmaja ku derbarê civakên îslamî de li cem wan heye, Bois bi xwe, di civaka kurdan de wekheviya jin û mêrên kurd nîşan dide.¹⁰⁷

Dîrokzanê rûs Bazil Nikitin bahsa romana Madam Paule Henry-Bordeaux a bi navê *Trabzonlu Antaram* dike û di wê romanê de nêrîna keçeke ermenî ku hatiye surgûnkirin û pişt re firotine kurdekî, wiha vedibêje:

“Keça ciwan a ermenî koletiya xwe wiha vedibêje: Ez çi bûm? Kole! Xizmetçî! Penaber! Çima ez kirîbûm? Di kesayetiya vî barbarî de esaleteke kevnare dijî. Daxwaza serxwebûneke dînitîyê heye. Harema wî tune ye. Di nav

¹⁰⁴ Mustafa Aslan, “Kürt Kadını’nın Toplumsal Statüsü”, *Uluslararası Kürt Kadını Kongresi*, r. 114

¹⁰⁵ Edward Williem Charles Noel, *Kurdistan 1919*, r. 25

¹⁰⁶ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 337

¹⁰⁷ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 31

kurdan de ev rêzgirtina ku qewmên misulman nizanin, ji kê-derê tê? ... /... Min ji vî mêrê ku ez tu tiştêkî wî, zimanê wî, dîroka wî nizamim, hez kir.”¹⁰⁸

Di warê azadiya jinên kurdan de, Nikitin bahsa nivîseke Kamûran Bedirxanê ku bi eslê xwe ji malbateke xanedan e, dike û dibêje di vê nivîsê de li gel kurdan bahsa tunebûna haremê tê kirin. Nikitin li gel kurdan tunebûna haremê bixwe weke sedemeke azadiya jina kurd dinirxîne.¹⁰⁹

Li gorî lêkolîna antropologê Danîmarkî Harald Hansen, di navbêna rewşa jinên arîstokrat û yên ji rêzê de hinekî cûdahî hene. Jinên arîstokrat bi awayekî hêsan xwe dinixwêmin. Lê belê di navbêna wan û mêrê wan de wekhevî heye. Heta Hansen îddîa dike ku ev jin serdestên mêrê xwe ne. Lê di civakên ji rêzê de, rewşa jinê berovajî rewşa jinên arîstokrat e. Li civakên mutewazîtir û gundan, li gorî jina arîstokrat azadiya jinan hîn bêtir e lê wekheviya wan ne weke ya mêrê wan e.¹¹⁰ Di derbarê jiyana jinên gundan de di kovara *Rojî Kurd* de tê gotin ku jinên kurd ji bo genimê xwe, êzîngên xwe bifiroşe, peyatî, bi tena serê xwe, bi saetan rê dimeşe, dihere bajêr, bi serbestî bazarê dike, malê xwe difiroşe, karê xwe diqedîne û dîsa bi paqijî û azadî vedigere tê gundê xwe. Li derên tenha ku mêr newêrin tê re bimeşin, derên ku diz xwe bi dizî tê de vedişêrin, jin bi tena serê xwe, bêtirs dimeşin. Vêya jî rê dide ku di malbata kurd de jin di jiyana derve de di asteke nêzîkî mêr de dixebite.¹¹¹

Lêkolînera jin a Amerîkî Katherine Begley ku du salan li Anadolê geriyaye, di derbarê jinên kurd û yên tirk de lêkolîn kiriye, jinên kurd ji yên tirk azadtir dibîne û bi taybetî di têkiliya jin û mêrên bi hevdu re zewicî de, balê dikşîne ku jin bi hêsanî dikare mêrê xwe rexne bike. Di warê pêşveçûna gerdûnî de, Begley jinên kurdên sunnî û yên elewî dide berhev û jinên elewî ji yên sunnî moderntir dibîne. Di statuya civakî de jî jinên kurd û yên tirk dide berhev û jinên kurd di civaka xwe de ji jinên tirk azadtir û

¹⁰⁸ Bazil Nikitin, *Kürtler* r. 181

¹⁰⁹ Bazil Nikitin, *Kürtler*, r. 187

¹¹⁰ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 145

¹¹¹ Kovara *Rojî Kurd*, Hejmar 4 / r. 105

bêtir biqîmet dinirxîne. Balkêş e ku dibêje dema ku jinên tirkan pîr dibin biqîmet dibin.¹¹²

Di derbarê ciyê jinên kurdan ên di dîrokê de, kurdologê navdar Martin Van Brunessen dibêje mumkun e mirov di pêvajoya dîroka kurdan de jinên ku di statuyên bilind de cî girtine, di siyasetê de bûne xwedî gotin, heta serleşkerî kirine, dibîne. Li hemberê vê statuya jinê, bahsa helwesta kurdan dike û radigihîne ku jinên wisa, di nav kurdan de bûne simbolên netewî, herweha li hemberî cîranên kurdan bûne nîşana serdestiya exlaqî.¹¹³

Prof. Wadie Jwaideh radigihîne ku gelek nivîskar di warê azadiyê de di derbarê ku jinên kurd bi awayekî berbiçav azad in, hemfikir in. Tê gotin ku ev azadî çî li malê çî jî li derveyî malê, di têkiliyên civakî de, bi şiklên cuda xwe xuya dike. Jina kurd li mala xwe xanima mala xwe ye. Di hundurê malê de bandora wê têra xwe heye, fikrên wê bi qîmet in, rêza wê tê girtin. Herweha di dayîn û stendina têkiliyên civakî de, tu kes nikare jinên kurd di hundir de bigire û serçavên wan binixwême. Bi serbestî dikevin nav mêran û mahcûbiyeta xwenixumandinê bi wan re çê nabe. Jin û mîrên kurd di cejn, dawet û pîrozbahiyên din de bi hevdu re direqisin. Bi kesên biyanî re bi hêsanî diyalogê datînin, beşdarî şeran dibin û li hemberî mîrê wan wekheviya wan heye.¹¹⁴

Ji bilî çavdêrî û nirxandinên şexsî, Komara Sowyetê jî weke ku di derbarê pir gelan de lêkolîn kiriye û bi raporekê taybetmendiyan wan rave kiriye, di derbarê kurdan de jî di sala 1927an de lêkolîn kiriye û taybetmendiyan wan weke rapor nivîsine. Rapora ku ji aliyê rayedarekî bi navê N. A. Smirnov de hatiye nivîsîn, di derbarê jinên kurdan de tespîten girîng hene. Di warê azadiyê de Smirnov jî rewşa jina kurd û yên cîran dide ber hev û rewşa jinên kurd ji jinên ereb, faris, tirk û ermenî azadtir dinirxîne. Radigihîne ku jin di jiyana eşîrtiyê de beşdarî hemû bûyerên girîng dibin, di hin grûban de serokatîyê jî dikin. Smirnov vê rewşê bi taybetmendiya jinê ya dîrokî ve girê dide û vê yekê weke mayîna taybetmendiyeke ji kevneşopîya civaka matriarkal dinirxîne. Hebûna

¹¹² Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 35

¹¹³ Martin Van Brunessen, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 11

¹¹⁴ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 35

vê taybetmendiye weke nîşaneke parastina hin nirxên civaka matriarkal di civaka kurdan de dibîne.¹¹⁵

Di meseleya nixumandinê de jî Smirnov radigihîne ku jinên kurd serçavên xwe nanixwêmin, di warê statuya civakî de li gel mêran cî digirin û bi awayekî wekhev beşdarî civakê dibin. Di pêşwazîkirina kesên derveyî malbatê de bi awayekî balkêş bahsa jina kurd dike û dibêje dema ku li gund mêr nehazir bin, jin bixwe mêvanan pêşwazî dikin. Smirnov jî rewşa jina kurd û ya jinên cîran dide berhev û ew jî weke yên din, jina kurd ji yên cîran azadtir dibîne. Li gorî wî jinên kurd bi vê statuya azad, xwe ji jina tirk ku xwe ji kesên biyanî vedişêre, cuda dike. Herweha Smirnov vê rewşa jinên tirk weke înzîwa bi nav dike û li gel jinên kurd balê dikşîne ser tunebûna înzîwayê.¹¹⁶

Ji bilî kesên biyanî, mirov di weşanên kurdan de dibîne ku kurdan bixwe jî rewşa jinê ji bîr nekirine, li ser nivîsîne û rewşa wê nirxandine. Weke mînak, Memduh C. Selîmbegî di kovara *Jînê* de nivîsek li ser rewşa jinê nivîsiye, di derbarê azadiya jinê de, agahiyên balkêş dide. Selîmbegî jina kurd xwedî azadiyeke berfireh dinirxîne û radigihîne ku ev azadî weke encam, hakimtiya wê ya malbata wê bixwe re tîne. Lewma Selîmbegî dibêje jina kurd hakimê mala xwe ye.¹¹⁷

Di xala nixumandinê de Memduh Selîmbegî jî agahiyên weke kesên biyanî dide. Bahsa rêbazên îslamê dike û radigihîne ku ji bilî rêbazên îslamê yên eşkere, jina kurd xwe zêde nanuxwême; di jiyana civakî ku mêr jî di nav de ne, bi awayekî rêzdar jin hene.¹¹⁸

Selîmbegî weke antropologê Danîmarkî Harald Hansen bahsa cudahiya jinên tebeqeya bilind dike û dibêje heger ku mirov hinekî li tebeqeyeke bilindtir binêre, mirov saltanateke jinan jî dibîne. Di jiyana asayî de, jina kurd, di tîkiliyên civakî de, yên bi mêran re, wezîfeya mêrê xwe jî dike; weke mînak mêvanan pêşwazî dike û weke mêran mazûbantiyê dike.¹¹⁹

¹¹⁵ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 29

¹¹⁶ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 220

¹¹⁷ Kovara *Jîn*, Hejmar III, hejmar 14 / r. 631

¹¹⁸ Kovara *Jîn*, Hejmar III, hejmar 14 / r. 631

¹¹⁹ Kovara *Jîn*, Hejmar III, hejmar 14 / r. 631

2.3. Desthilatdariya Jinên Kurdan

Di dîroka kurdan de gelek jinan serdestiya civakê kirine û rêberî ji derûdora xwe re kirine. Jina kurd bi vê taybetmendiya xwe, di nav gelên herêmê de, li hemberî rêbaza ku hertim mêr serdest in, weke îstîsnayekê derdikeve holê. Ji ber ku ev yek li nav kurdan tenê heye, Sharzad Mojab vê yekê weke anomaliyekê binav dike. Mojab dibêje xuya ye anomaliya hukumdariya jinan, li Rojhilata Navîn, li gorî gelên din, di nav kurdan de bêtir tê qebûlkirin. Mirov jinên ku berpirsiyariya temama eşîrê hilgirtine jî dibîne.¹²⁰

Seyahekî Îtalî, Pietro Della Valley di bîranînên xwe de bahsa serdestiya jina kurd dike. Valley û jina xwe ya ku xiristiyana Sûrî ye, di sala 1620'an de ji mecbûrî ji Bexdê direvin, diherin Îranê, pişt re xwe digihînin nêzîkî Qesra Şêrîn. Li wê derê jineke kurd bi navê Sultan Xanim, seroka eşîrekê bi mêvanperwerî wan pêşwazî dike. Valley bahsa serdestî û hêza vê jinê dike û radigihîne ku bi saya wê xwe xelas kirine, çûne Ewrûpa.¹²¹

Evliya Çelebi di seyahatnameya xwe de qala qanûnnameya Şarezorê ku ji aliyê kurdan ve hatiye amadekirin, dike û radigihîne ku ev qanûnname mafê desthilatdariyê dide jinan. Li gorî Çelebî, hin xalên ku keçek dikare îdareyê wergire tê de hene, bi vî awayî wergirtina îdareyê di nav kurdan de têra xwe çê dibe û tê qebûlkirin.¹²² Evliya Çelebi berî seyeheta xwe, di derbarê jinên kurd de çîrokên ku bihîstine vê qanûnnameyê diçespîne. Çelebi çîrokeke ku di derbarê milîtaneke jin de bihîstiyê, bi heyraniyeke eşkere dixemilîne û wiha vedibêje:

”Di dema Sûltan Mûrad IV (1623-1640) de herêma Soran û Herîrê ji aliyê jineke rêzdar, bi navê Xanzade Sûltan ve dihat îdare kirin. Vê jinê femandariya arteşeke bi 12 hezar leşker û 10 hezar siwariyên bi tîr û kevan dikir. Li qada şer serçavê wê bi xêliyekê, bedena wê bi herwaniyekê reş nuxumandî, dema ku li ser hespa xas erebî bi cesaret hunerê xwe nîşan

¹²⁰ Evliya Çelebî, vg. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 135

¹²¹ Evliya Çelebî, vg. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 136

¹²² Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 137

dida, kurê Nerîman Sam tanî bîra mirov. Bi arteşên ku ji 40 an 50 hezaran pêk dihat gelek caran êrîşî Îranê kiriye, piştî ku bajarên weke Dergezin, Cemcenab û yên din ên girîng talan dikir, bi serfirazî, tev xenîmetan vegehiyaye Soranê.”¹²³

Martin Van Brunessen ji Xanim Sûltana ku di destpêka sedsala 17'an de Pietro Della Valle li Kurdistanê Rojhilat pêşwazî kiriye dest pê dike, di heman demê de Xanzade Sûltana ku herêma Soran û Herîr îdare kiriye, heta Fata Reş ya ku di sedsala 19an de desthilatdarî kiriye û Adîle Xanima ku serokatiya eşîra Cafan kiriye, bahsa gelek jinan dike.¹²⁴

Dîrokzanê kurd Mehrdad İzady pesnê hin jinên kurd ku di dîrokê de serdestî kirine dide û bi taybetî qala Seyyida Mama Xana ku di Serdema Navîn de hukumdarî kiriye, dike. Xanedanê kurd ê Deylemît ku di Serdema Navîn de li Ray (Tahrana îro) hikum kiriye, dibêje seroka Hanedana Biweyhîdan a dawiyê jineke bi navê Seyyida Mama Xan bû û vê Xanedaniyê bi saya cesaret û zekaya wê ya dîplomatîk 30 salî xwe li hemberî hêzên tirk ên koçer li ser nigan girtiye.¹²⁵

Zanayê kurd Mûsa Anter di derbarê desthilatdariya jinan de ji Adîle Xanima Helepçeyî dest pê dike, heta herêma xwe ya Mêrdînê bahsa gelek mînakan dike. Di nav van mînakan de, ya herî tê naskirin, ku di gelek stranan de jî bahsa wê dibe, Perîxan Xatûn e. Piştî ku serokê eşîra Ramanan ku mêrê Perîxan Xatûn bû dimire, êdî serokatiya eşîrê dikeve destê Perîxan Xatûnê û heta ku lawê wê, Emîn mezin dibe, ew bixwe eşîrê bi rê ve dibe. Piştî ku lawê wê dibe serokê eşîrê, êdî bi navê wê tê naskirin û jê re dibêjin Emînê Perîxanê.¹²⁶

Anter bahsa bûyereke din, ku dişibe vê bûyerê, dike. Li herêma Mêrdînê Şemsê Xatûn serokatiya eşîra Omeriyan kiriye. Piştî ku mêrê wê dimire, ew jî weke Perîxanê, heta ku lawê wê mezin dibe serokatiya eşîrê dike. Piştî ku lawê wê mezin dibe û êdî dest

¹²³ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 137

¹²⁴ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 13

¹²⁵ Mehrdad İzady, *Bir El Kitabı, Kürtler*, r. 194

¹²⁶ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 139

bi serokatîya eşîrê dike, ev law jî weke Emînê Perîxanê, bi navê diya xwe tê naskirin û jê re dibêjin Mihemedê Şemsê.¹²⁷

Di nav mînakên ku Mûsa Anter bahs dike de, ya herî balkêş mînaka diya wî bixwe ye. Diya wî, Fesla Xatûn, heta ku di sala 1963an de miriye, nêzîkî çel salî serokatîya eşîra Temikan kiriye. Anter radigihîne ku li Tirkiyeyê jina ku cara yekem bûye muxtar, diya wî ye.¹²⁸

Di warê desthilatdariya jinê de Minorsky jî agahiyên balkêş dide. Radigihîne ku wî di payiza 1914an de, li bajarê Helebçe Adîle Xanim, jina serokê eşîra Cafan a Osman Paşa dîtîye. Dibêje heta çend sal berê, vê jinê fiilî ev herêm îdare dikir, lew mêrê wê, li ser vê peywira ku tirkan li ser kaxetê dabûyê qet peyde nedibû.¹²⁹

Herweha li Silêmaniyê, di destpêka salên 1920an de jineke ji rêzê, bi navê Rabîa Xan, weke seroka firinciyan dihat naskirin û xwedî otorîte bûye. Vê jinê bandoreke mezin li dîplomate îngîlîz Cecil John Edmonds kiriye, lewma vî dîplomate bi taybetî qala otorîteya wê kiriye. Edmonds dibêje wê bixwe ji bo diyarkirina bihayê nên bi şaredariyê re hevdiştin dikir û di nav hemkarên xwe de dîsîplîneke ku mirov jê re dibû heyran, ava dikir.¹³⁰

Di nav civaka kurdên êzîdî de jî otorîteya jinê bi awayekî balkêş çê bûye û bi salan dom kiriye. Di sala 1913an de bi awayekî xerîb, Alî Begê serokê êzîdîyan tê kuştin û jina wî Meyan Xatûn dewsa wî digire. Li gorî hin paşgotiniyan, tiliya jina wî di vê kuştinê de hebûye. Meyan Xatûn ji sala 1913an heta ku di sala 1957an de miriye, serdestiya xwe berdewam kiriye. Li gel ku lawê wê Saîd Beg tê temenê desthilatdariyê jî, Meyan Xatûn dest ji desthilatdariyê bernedaye. Nivîskarê Osmanî, Sadîk Damluci Meyan Xatûn wiha dide naskirin:¹³¹

“Ev jin arîf, zekî ye û pêşîya xwe dibîne. Gelê wê ji wê ditirse û rêza wê digire. Otorîteya wê li ser wan wiha ye ku tu kes cesaret nake li hemberî

¹²⁷ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 140

¹²⁸ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 140

¹²⁹ Minorsky, vgz. Bazil Nikitin, *Kürtler*, r. 183

¹³⁰ Cecil John Edmonds, *Kürtler, Türkler ve Araplar*, r. 150

¹³¹ Cecil John Edmonds, *Kürtler, Türkler ve Araplar*, r. 142

wê rabe; herkes xwe li hemberî wê nefsbîçûk dibîne, dema ku ew ne hazir be bêhna wan teng dibe. Ew bi kubr e, bi xûrûr e û ji xwe razî ye, yên ku çav li wê dikevin, esalet û mezinahiya wê yekser dibînin... Ji mêrên di malbatê de hez nake û wan biçûk dibîne. Sînsî, hîlebaz û xayin e; kîna wê hewqasî dijwar e, dikare yên li hemberên xwe bikuje.

*Niha pêşkêşa ku dide û distîne, ya ku mukafatê dide û ceza dike, ya ku destûrê dide û qedexe dike, serdesta hemû tiştî ew bixwe ye. Dema ku mirov niha bide bala xwe ku ew gihastiye dawiya temenê xwe, ji bilî hişê wê, her tiştên din kal bûye, gelo wê piştî mirina wê kar çawa bimeşe, zahmet e mirov texmîn bike.*¹³²

Di dîroka kurdan de gelek jinan desthilatdarî kirine, lê di nav van jinan hemûyan de, divê mirov bi taybetî bahsa Adîle Xanim û Fata Reş bike. Lewre ev herdû jin bi gelek taybetmendiyên xwe ji yên din cuda ne.

Eşîra Cafan di sedsala 20an de li Kurdistana Başûr bi hin eşîrên din re weke federasyonekê ava kiribû û serokê wê Adîle Xanim, jina Osman Paşayê waliyê Şarezorê bû. Adîle Xanim berî ku mêrê wê bimire, otorîteyeke xurt xistiye destê xwe, piştî ku mêrê wê di sala 1909an de dimire, heta sala 1924an desthilatdariya xwe li bajarê Helebçe berdewam kiriye.¹³³

Adîle Xanim bi eslê xwe ji malbateke wezîrên Mîrektiya Erdelan, a cîranên eşîra Cafan bû. Erdelana ku paytextê wê Sinê bû, gelek salan navenda çand û wêjeya kurdan a sarayê bû, gelek ronakbîr û nivîskar bi alîkariya pêşkêşên Erdelanê hatibûn Sinê. Adîle Xanim ji Sinê zanaatkaran vedixwîne Helebçe, du qonaxên xweşik ava dikan. Bi tarza farisan gelek bexçe û bazaran ava dike, Helebçe ji toz û gemara wê vediguherîne, dike bajarekî xweşik. Bi vî awayî nav û dengê Helebçe li herderê belav dibe û ji bo bazirganan dibe navendeke balkêş.¹³⁴

Ely Banister Soane ku katibtiya wê kiriye, wiha bahsa wê dike:

¹³² Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 142

¹³³ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 132

¹³⁴ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 132

“Hêdî hêdî hêza siyasî kete destê wê. Osman Paşa gelek caran ji bo ku beşdarî çalakîyan bibe derdiket derveyî bajêr, hin caran ji bo karên îdarî diçû Silêmaniyê, Kerkûkê û Mûsilê. Bi vî awayî Adîle Xanim îdare werdigirt. Piştî demekê dîwaneke edaletê ku ew bixwe bû serokê wê û hefseke nû jî ava kir; bi vî awayî hêza xwe xurt kir. Dema ku Adil Xanim hukum dikir, heger ku Paşa li Helebçe bûya, dema xwe bi vexwarina nargîlê, çêkirina himamên nû û şopandina pêşveçûnên herêmî derbas dikir.”¹³⁵

Adîle xanim xwe ji desthilatdariya Osmaniyan bidûr xistiye û bi Îngîlîzan re kar kiriye. Lewma hemû mamûrên Helebçeyî emrê xwe ne ji qeymeqam, ji îdareya Îngîlîzan werdigirt. Edmonds Adîle Xanim weke qiralîçeya bêtac binav dike. Piştî ku Îngîlîzan hêdî hêdî îdare ji destê wê girtin, peywendiyên wê û Îngîlîzan jî xera bûye. Adîle Xanim di sala 1924an de miriye, lê heta îro jî bahsa nav û dengê wê dibe.

Jineke din ku biqasî Adîle Xanim di dîrokê de cî girtiye, Fata Reş e. Fata Reş di salên 1850î de li herêma Mereşê serokatiya eşîra Sinemillî kiriye. Di Şerê Kirimê de ku di 1853-1856an de di navbera Osmanî û Rûsan de derketiye, bi 300 siwarî çûye Stenbolê da ku alîkariya Osmaniyan bike.¹³⁶

Li gel ku ji her aliyên welêt pir leşker çûne Stenbolê, tu kesî biqasî Fata Reş û leşkerên wê bal nekişandiye. Lewma Fata Reş ji aliyê Fermandarê Sereke, Riza Paşa û Sultanê Osmanî Abdulmecît ve hatiye qebûlkirin. Di hevdiîna wan de axaftineke wiha derbas dibe:

Abdulmecît: “Yeka weke te ku qahremaniyên hewqasî mezin dike, çawa nizane bi tirkî bipeyive?”

Fata Reş: “Padîşahê min heger ku te bi kurdî bizanîba, wê hewce nekira ku te bi tirkî bizanîbûya.”

¹³⁵ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 134

¹³⁶ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 76

Ji ber ku îngîlîz û fransîz jî li gel osmaniyan beşdarî vî şerî bûbûn, ji welatên Ewrûpayê gelek leşker, rojnameger, nivîskar û ressam hatibûn Stenbolê. Bi serleşkeriya jineke gundî, bi dilê xwe hatina hewqas leşker a Stenbolê pir bala wan kişandiye.

Muşawirê bi navê Slade di seyahatnameyên xwe de bi pesin bahsa hatina Fata Reş kiriye; gelek rojnameger û ressam bi nûçe û gravurên cûrbecûr Fata Reş di rojname û kovarên xwe de ragihandine. Hin ji wan Fata Reş weke “prensês” û “amazon” binav kirine.

2.4. Jinên Kurd di Siyaset û Dîplomasiyê de

Di dîroka kurdan de li gel serdestiyê jinên kurd, di siyaset û dîplomasiyê de jî peywendiyên berbiçav danîne û bûne sedema encamên dîrokî. Yek ji van jinan jina Mîrê Cizîrê ye. Dema ku mîrê Cizîrê dimire, jina wî bi kurê xwe re dihere Stenbolê, li cem Padîşah di derbarê Mîrekiya xwe de biryarekê werdigire û vedigere. Dîroknasê Kurd Şerefxan vê jinê weke jineke “bi fazîlet, baqîl, tedbîrkar û biezîm” dide naskirin.¹³⁷ Jineke din ku wanî têkoşer e, jina Salih Beg mîrê Sekemanê ye. Ev jin jî weke jina mîrê Cizîrê dihere Stenbolê cem padîşah û rewşa mîrekiya xwe jê re vedibêje û vedigere.¹³⁸

Pêvajoya hilweşandina mîrekiyên kurdan ku di sedsala 15an de dest pê kiribû, di sedsala 19ande bi hilweşandina çend mîrekiyên dawiyê êdî bi dawî tê. Lê helbet ev pêvajoyê bi hêsanî bi dawî nayê. Ji destpêka vê pêvajoyê û heta dawiyê herdem kurdan li ber xwe daye. Balkêş e ku di pêvajoya hilweşandina van mîrekiyan de, hin lêkolîner di berxwedana kurdan de balê dikişînin ser rol û tevgera jinên kurd û radigihînin ku jinên kurd vê demê dîsa derdikevin qada şer û siyasetê.¹³⁹ Di vê demê de Bazil Nikitin ku di sala 1916an de li Şemzînanê konsolosê Rûs e, bi Meryem Xanima jina Şêx Mahmûdê Nehrî re hevdiînên leşkerî û siyasî pêk aniye.¹⁴⁰

Cara yekem di nav kurdan de bi şêweyekî modern komeleyeke jinan, bi navê Kürd Kadınları Teali Cemiyeti di 1919'an de, li Stenbola ku wê demê navenda siyaset û çandê bû, hatiye avakirin. Armanca vê komeleyê, bi reformên civakî, bi awayekî

¹³⁷ Şerefxan, *Şerefname-Kürt Tarihi, İstanbul*, 1971, Wergera ji Erebi M. Emin Bozarlan, r. 153

¹³⁸ Sharzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 77

¹³⁹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. XIV

¹⁴⁰ Mustafa Aslan, “*Kürt Kadınının Toplumsal Statüsü*”, *Uluslar arası Kürt Kadını Kongresi*, r. 117

hemdemî, pêşvexistina jinên kurd e. Lê temenê vê komeleyê dirêj nabe. Piştî serhildana Şêx Seîd, Komara Tirkiyeyê wê jî weke hemû tevger û saziyên kurdî yên din, ji holê rakiriye.¹⁴¹

Partiya Demokrat a Îranê di 1945an de, bi awayekî nivîskî berî avakirina Komara Mahabadê, di zagona xwe ya ku diyar dikin de, mafên girîng didin jinan. Helbet piştî ku Komara Mahabatê tê avakirin, heman tişt di zagona bingehîn de jî cî digire. Bi vê zagonê êdî ji bo jinan mafê siyasî, aborî û civakî, tên dayîn. Ev zagon, bi avakirina Komara Mahabatê bi awayekî berbiçav derbasî jiyane dibe. Di dema pîrozbahîya Komara Mahabatê ya 18ê Çileyê 1946an de, rojnameya *Kurdistanê* radigihîne ku ji şanzde kesên ku axaftin kirine, ji bilî du kesan, hemûyên din jin in. Herweha ji çar dibistanên ku beşdarî vê şahiyê bûne û stranên welatparêzî gotine, yek dibistana keçan e.¹⁴² Mamosteya jin, a bi navê Xecîcey Sadiqî di vê şahiyê de, di derbarê perwerdeya jinan û piştgiriya jin û mêran de axaftineke wiha dike.

*“Gelî xwişkên, niha divê em li birayên xwe yê hêja binêrin û destên xwe dirêjî wan bikin. Lew em dibînin welatê me li hêviyê ye ku keç jî tevbigerin û bixwînin, da ku em jî xwe bigihînin birayên xwe. Divê jin û mêr di cîhana îro de weke xwişk û bira bi hevdu re ji bo azadiyê têbikoşin.”*¹⁴³

Pişt re ji bo pêkanîna vê zagonê û bikaranîna van mafan, weke şaxeke Partî Demokrat, partiyek bi navê Yeketî Jinanî Demokratî Kurdistanê tê avakirin. Avakirina vê partiyê diyar dike ku Komara Mahabadê di derbarê pirsgerêka mafê jinê de hişyar e û ji bo çareseriyê xwedî proje ye. Bêgûman avakirina vê partiyê, jin jî dixistin pêvajoya avakirina netewî. Bi kiryarên xwe, vê partiyê bi awayekî eşkere mudaxaleyî peywendiyên neyênî yê kevneşopiyên jin û mêran kiriye.¹⁴⁴

Pişt re li Kurdistana Başûr, di salên 1950yî de, di komîteya navendî ya Partî Demokratî Kurdistanê de jinek hebû. Herweha bi hezaran pêşmergeyên jin jî hebûn. Van jinan hemûyan bixwe biryar dabûn û ji bo azadiya kurdan beşdarî şerê çekdarî bûbûn.

¹⁴¹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 37

¹⁴² Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 113

¹⁴³ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 113

¹⁴⁴ Rojnameya *Kurdistan* (1946) 16 (18 Sebata:4) vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 119

Bûyîna pêşmergetiyê, bi taybetî jiyana bi pêşmergeyên mêr re, bi tevahî li derveyî biryara malbatê, bi biryara şexsî pêk tê. Her çiqas mirov vê yekê weke sembola azadiya jina kurd binirxîne jî, mirov nikare bi tevahî jina kurd azad bibîne, lew civaka kurdan jî weke ya gelên cîhanê civakeke patriarkal e.¹⁴⁵

Di jiyana siyasî de di derbarê rola jinê de Prens Sureyya Bedirxan radigihîne ku ji ber bandora jinê ya li ser mêrê wê, weke beşên civakê yên din, di jiyana siyasî de jî rola jinê heye. Jina serokekî civakê beşdarî civînan dibe û ji mêrê xwe re şewirmendiyê dike. Heger ku mêrekî desthilatdariya eşîrê yan grûbekê ji bavê xwe wergirtibe û têra xwe ne jêhatî be, heger ku jina wî ji wî jêhatîtir û baqiltir be, jin pêşkêşiyê werdigire û desthilatdariyê dimeşîne.¹⁴⁶

Jinan bi vê helwestê, li gel mêrên xwe, bi sedsalan li hemberî zordestiya dagirkeran şer kirine, hin caran dema ku mêrê wan miriye, wan dewsa mêrê xwe dagirtine, bi vî awayî serokatiya leşkeran kirine û bi şeref li qada şer mirine.¹⁴⁷ heta hin jinên ku mêrên wan dijîn jî, ew bixwe kar û barê eşîrê dimeşînin. Li herêma Ranya jina bi navê Xanim Axa, yek ji van jinan e. Efsêrê Îngîlîz Cecîl John Edmonds vê jinê wiha dide naskirin:

“Hin caran jineke bi navê Xanim Axa, ku seroka sê gundên Şawirê bû û xwedî helwesteke fermandarî bû, dihat Derbendê. Ev jin ji mêrê xwe yê tiral û ehmeq ciwantir û jîrtir bû. Li wî gelîyê dûrî çavan, karê sererastkirina hêzên siyasî, bi temamî ketibû ser milên wê. Hin caran mêrê xwe, Surk jî bixwe re tanî. Ji bo ku tewş nepeyive û kar xera neke, bi piranî destûra peyvê nedida wî û nedihîşt bipeyive. Piştî çend mehan Surk di şerê navbera wan û eşîrekê de hat kuştin. Lê Xanim Axa ji bo ku şerefê eşîra xwe bi şûn de bistîne, doza xwîndariyê ajot û heyfa mêrê xwe hilanî.”¹⁴⁸

Edmonds bi navê Fatma Xan bahsa jineke din jî dike. Li gorî ku radigihîne; li herêma Rewandûzê jineke din bi navê Fatma Xan ku ji aliyê hemû karmendên wê derê

¹⁴⁵ Ferhad Şakelî, *Heypeyvîn li Zanîngeha Uppsalayê* 06.05.2003

¹⁴⁶ Sureya Bedirxan, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 248

¹⁴⁷ Sureya Bedirxan, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 246

¹⁴⁸ Cecîl John Edmonds, *Kürtler, Türkler ve Araplar*, r. 307

ve dihat naskirin, hebû. Fatma Xan, piştî mirina mêrê xwe, îdareya heşt gundan hilgirtibû. Hemû karên bi hikûmetê re wê bixwe dimeşand. Li gel ku di qanûnan de destûr dida hilbijartina mêran tenê jî, şênîyên van gundan di hilbijartina parlamentoyê de ew ji xwe re weke wekîl tayîn dikirin, da ku li ser navê wan dengê wan bide. Edmonds bi hişmetkarî bahsa rola jina kurd dike û radigihîne ku di derbarê hebûna potansiyela jinên kurd de, qet tu şikên wî yên biçûk jî tune ne.¹⁴⁹

Jineke din bi navê Meryem Xanim jî weke van jinan, serokatiya eşîra Êzdînan kiriye. Tê gotin ku vê jinê jî bi salan bi marîfet serokatiya vê eşîrê meşandiye. Herweha dema ku Şêx Mahmûdê Berzencî piştî serhildana xwe tê sirgûnkirin, dişa wî ya bi navê Haffize Xanim dewsa wî girtiye û mafê hemwelatîyên xwe heta dawiyê parastiyê.¹⁵⁰

Di nav kurdan de hin caran hebûna jinê, bi awayekî diyarker pirsgerêkên cidî çareser dike. Dema ku Serdarê îngîlîz Noel li dora Mûsilê bû, di hundurê du şaredariyên ku îngîlîzan xistibûn bin destê xwe de, li gel hemû hewldanên xwe nikarîbû tevlihevî bi dawî baniya, aramî pêk baniya. Li ser vê yekê her serokatiya şaredariyekê, jinekê tînin ser. Bi vî awayî şênîyên şaredariyê êdî nema pirsgerêkan derdixin, li hevdû rûdinên û mesele çareser dibe.¹⁵¹

2.5. Jinên Kurd di Malbatê de

Li Kurdistanê, di berdewamkirina hebûna malbatê de rola jinê pir girîng e. Îdareya malê, bi qabîliyeta jinê ve girêdayî ye, xwediyê malê yê rastî û yê alavên malê jin e, nobedarê hizûra malbatê jî ew e. Ew bixwe hesabê hatin û çûyîna aborî derdixe û malê bi rê ve dibe.¹⁵²

Di derbarê statuya malbatî de, Bazil Nikitin rewşa jinên Îranê û Tirkiyeyê bi yên kurdan re muqayese dike û malbata kurdan di derbarê ciyê ku jin îşgal dike de, li gorî yên Îranê û yên Turkiyê (li van herdu dewletan, berî Şerê Cîhanê yê yekem ku hêzên femînîstî bi ser ketin) bêtir nêzîkî malbatên xwe dibîne. Radigihîne ku kurd bi malbata xwe ve girêdayî ne û bi piranî jineke wan tenê heye. Nikitin di otorîteya jinê ya malê de

¹⁴⁹ Cecil John Edmonds, *Kürtler, Türkler ve Araplar*, r. 34

¹⁵⁰ Sureya Bedirxan, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 248

¹⁵¹ Sureya Bedirxan, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 248

¹⁵² Kamûran Bedirxan, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 240

bi taybetî qala otorîteya jina sereke, ango jina kevanî dike. Otorîteya herî mezin a kevanîye ye û kesên ku malbatê îdare dike kevanî ye. Dema ku mêrê wê ne li malê be, ew mêvanan pêşwazî dike û bi serbestî bi wan re sohbetê dike. Jina kurd weke misulmanên din serçavê xwe nanixwême.¹⁵³

Di malê de, ji bo kesên biyanî, mêvanperweriya jinên kurd jî têra xwe bala kesên biyanî kişandiyê. Nivîskarê bi navê Millingen bahsa vê yekê dike û dibêje li gundan gelek caran, dema ku mêrê wan ne li malê bû wan em pêşwazî dikirin, bi me re rûdiniştin û sohbet dikirin. Millingen di vê rewşê de jinên kurd, ên tirk û faris dide ber hev û pesnê jinên kurd dide. Dibêje ku di rewşên wanî de bi tu awayî fediya sexte, yan jî nefsbîçûkiya weke ya jinên tirk û faris rê nedane. Bi serbestî sohbet kirine, li malê çî tiştên ku têne xwarin û vexwarin bi kêfxweşî îkram kirine. Piştî ku mêrê wan dihate malê, dev ji sohbetê bi mêvan re bernedidan, heta ku mêr hespa xwe girê dida û dihat, jin bi mêvan re eleqeder dibû. Di vê helwestê de Millingen bi taybetî destnîşan dike ku helwesta jina kurd li hemberî kesên mutewazî tenê bi vî awayî ye.¹⁵⁴

Li ser têkiliyên jinên kurd bi xizmetkaran re, lêkolînera Îngîlîz, Lucy Garnett wiha agahiyên balkêş dide. Li gorî gotina Garnett xizmetkarên mêr, ji yên tirkî cuda, bi serbestî diherin odayên ku jin lê ne û mêvanên mêr ji aliyê temama kesên malbatê ve tîr pêşwazî dikirin. Garnett jî di vê xalê de jinên ermenî, yên osmanî û yên kurd dide ber hev û dibêje li gel vê tevgera hêsan, jinên kurd pir bi edeb û xûrûr in, ne weke jinên ermenî bizdonek, ne jî weke jinên osmanî bi bêedebî tevdişerin.¹⁵⁵

Di xala pêşwaziya kesên biyanî de, Kurdologê Brîtanî Godfrey Rolles Driver heman tespîtê dike. Li gorî Driver, di yekîtiya jiyanê de jin rola duyem nalîze, heta berovajî rola duyem, jin weke stûna malê tîr dîtin, lewma di rola yekem de ye. Jinên kurd ji bo xwe veşêrin qet nakevin tu hewldanan. Di derbarê jinên malmezî de, Driver dibêje, jin dikarin li malên xwe xizmetkarên mêr jî bidin xebitandin.¹⁵⁶

¹⁵³ Bazil Nikitin, *Kürtler*, r. 190

¹⁵⁴ Millingen. vgz. E. B. Soane, *Mezopotamya'ya ve Kürdistan'a Gizli Yolculuk*, r. 407

¹⁵⁵ Lucy Garnett, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 26

¹⁵⁶ G. R. Driver, vgz. Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 337

Di derbarê statuya jinên kurd a di malbatê de Driver balê dikşîne ser pergala civaka patriarkal û dibêje ji ber ku civaka kurdan di bingeha xwe de patriarkal e, serdestiya malbatê ji bav derbasî law dibe. Dema ku jin dizewice dihere mala mêrê xwe dikeve malbateke din. Li gel vê yekê jî, dîsa Driver balê dikşîne ku jina kurd di warê statuya civakî de, li gorî hemû jinên gelên cîran, di rewşeke baştir de ye.¹⁵⁷

Kurdologê fransî Thomas Bois di warê plansaziya aboriya malbatê de, rola jinê, rola herî girîng dibîne. Li gorî agahiyên wî, kar û barê malê jin bi rê ve dibe. Peryên malbatê li cem wê ye, mesrefên malê ew dike û di kirina mesrefê de azad e. Mêrê wê ji zanebûna wê ya kûr îstifade dike. Dema ku yekî biyanî tên malê, jin bi hêsanî dikare were nav civatê û bêyî ku tu kes jê aciz bibe dikare beşdarî axaftinan bibe. Bois bi taybetî balê dikşîne ser baweriya di navbera jin û mêran de û dibêje, di her warî de, baweriya mêrê kurd bi jina wî, bêdawî ye.¹⁵⁸

2.6. Jina Kurd di Civakê de

Mela Mahmûdê Bazidî di derbarê tevgera jinê ya di civakê de balê dikşîne ser rihetîya wê û radigihîne ku jinên kurdan di rabûn û rûniştina xwe ya civakî de rehet in. Li gorî agahiyên ku Bazidî dide, jinên kurdan xwe venaşêrin û di nav wan de yên xerab kêr in. Dema ku bi biyaniyan re biaxivin, bi wan re bipeyivin û bi listikan bilîzin, mêrên wan di derheqê wan de tiştên xerab nafikire. Bazidî vê mijarê bêtir karîkaturîze dike û dibêje “heger ku jinêd kurdan li malêd biyaniyan û eynî di nêva mêran da jî razê û rabin dîsanê mêrêd wan kumreşî naken û bedgûmaniyê derheq wan danê naken.”¹⁵⁹

M. C. Selimbegî jî di kovara *Jinê* de, di derbarê cil û bergên jinê û di derbarê dayîn û stendina wê de ya bi biyaniyan re agahiyên weke yên Bazidî dide. Selimbegî radigihîne ku di derbarê cil û bergê jinê de, gotinên weke ku “ev jin zêde vekiriye, ya din xwe baş nenixumandiye û hwd” di nav kurdan de nayên kirin. Herweha axaftina jinan a bi kesên biyanî re jî nabe mijara paşgotiniyan.¹⁶⁰

¹⁵⁷ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 337

¹⁵⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 31

¹⁵⁹ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* r. 75

¹⁶⁰ Kovara *Jin*, Cild III, hejmar 14 / r. 631

Di vê nivîsê de Selîmbegî têkiliyê civakê û medeniyetê jî dinirxîne û medeniyeta civakê bi asta pêşveçûna jinan dipêve. Sefkeftinên ku jin dikin, weke asta medeniyetê dibîne. Selîmbegî balê dikêşe ku jin nêviyê netewe ne û li gel neteweyên medenî, hemû maf û îmtiyaz, rêzdarî û girîngiyên ku weke yên mêran tên dîtin, gelek caran bi awayekî comerdî ji bo jinan jî tên dayîn. Selîmbegî netewên ku jinên wan baş negihane û wezîfeya dayikîyê nayê teqdîr kirin, weke neteweyên yetam binav dike. Lewra jin bingeha nifşên pêşerojê çê dikin.¹⁶¹

Mûsa Anter jî di xala xwenixumandina jinê û îslamê de radigihîne ku weke gelên musulman ên din, zor li jinên kurd nehatiye kirin, herweha di warê civakî de jî ji mêran nehatine qetandin.¹⁶²

Mehrdad R. Izady radigihîne ku li hin herêmên Kurdistanê, kurd ji zarokên kur bêtir qîmet didin zarokên keç. Izady vê yekê di çanda kurdan de weke nirxekî dîrokî dibîne û dibêje di çanda kurdan a hezar salan de, li hin herêmên Kurdistanê yên dûr hîna jî ev kevneşopî dijî. Bi rastî jî li her dû aliyên sînorê Tirkiye û Îranê, di nav sînorên Wanê û Koyê de, di nav eşîrên girtî yên weke Karasonniyan de, çê bûna zarokên keç, ji ya zarokên kur bêtir tê pîrozkirin.¹⁶³

Ji bilî kurdan, helbet kesên biyanî jî, di civakê de rewşa jinên kurdan nirxandine û çavdêriyên xwe nivîsîne.

Nikitin dibêje li gel ku kurd misulman in jî, mirov dibîne ku di malê de derî li ser jinên wan nehatine girtin û jin bênîqaş xwedî kesayet e. Nikitin balê dikişîne ser taybetmendiyeke kurdan a dîrokî ku heta îro jî heye. Dibêje heger ku dayik bi zîrebûn an jî xweşikbûna xwe hatibe naskirin, lawê wê, bi navê wê tê naskirin; weke mînak *Bapîrî Şaşan*, ango kurê Şaşan.¹⁶⁴

Bazil Nikitin rewşa jinê, weke karakterê qewmekî dibîne û li gorî wî, rewşa jinê karakterê wî netewî pir baş diyar dike. Di derbarê cil û bergan de Nikitin jî radigihîne

¹⁶¹ Kovara *Jin*, Cild III, hejmar 14 / r. 630

¹⁶² Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r.139

¹⁶³ Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabı Kürtler*, r. 340

¹⁶⁴ Bazil Nikitin, *Kürtler* r. 183

ku jina kurd xwe nanixwême û serçavê wê vekirî ye. Herweha di qelebalixiyê de bi hêsanî dikevin nav mêran. Di civînan de timî gotinên wan ên ku bibêjin hene.¹⁶⁵

Li hemberî servekirîbûn û tevgera rihet a jinên kurd, Serdarê Îngîlîz Noel şaşbûna xwe vedibêje. Dibêje bi mêran re nîqaş dikirin, beşdarî sohbetên me dibûn, fikrên xwe bi awayekî xwezayî û rihetiyeke ji xwe bawer tanîn ziman.¹⁶⁶

Lêkolînera Îngîlîz, Lucy Garnett radigihîne ku li gel ku kurd misulman in jî, dema ku jinên wan derdikevin derve, serçavên xwe nanixwêmin. Lêbelê li hin bajarên mezin ên weke Silêmaniyê, jinên malmezinan, wek jinên tirk ên Anadolê cilekî şîn li xwe dikin û serçavê xwe bi xêliyeke reş dinixwêmin. Lê ev yek ne mecbûrî ye, wanî dikin ji bo ku neyên naskirin û bi hêsanî bikaribin li bajêr bigerin.¹⁶⁷

Ji bilî jinên ku li bajaran dijîn, Garnett rewşa jinên koçer ên ku li derveyî bajaran dijîn jî vedibêje. Jinên koçer di derbarê dijminahiya eşîran a xwînî de, di plankirin û sazkirina eşîrê, ya sosyal û siyasî de, herweha di hemû meseleyan de têkildar in û di vî warî de rolên girîng dilîzin. Weke mêran dizanin kêfê bikin û nabetilin, kîjan gava lazim bibe dikarin li hespan siwarên û li gel mêrên xwe dikarin têkevin rewşên bi talûke.¹⁶⁸

Rojhilatnasê Rûs Minorski jî li gel rêbazên îslamê ku nixwimandina jinê ferz dikin, radigihîne ku li gorî gelên îslamî yên din, kurd di derbarê jinê de bêtir bi musamaha ne. Eksê jinên musulman ên din, serçavê jinên kurd nenuxwamtî ye. Li gel mêran rûdinên û car caran beşdarî nîqaşan jî dibin.¹⁶⁹ Di vî mijarê de Minorski kurdan di nav misulmanan de weke gelê herî lîberal dinirxîne.¹⁷⁰

Antropologê Danîmarkî Prof. Henny Harald Hansen ku li Kurdîstana Başûr li nav kurdan geriyaye û di derbarê helwesta jinên kurd ya li hemberî wî de, matmayîna xwe dinivîse. Hansen dibêje “Tiştên ku herî pir bi min balkêş hat, ji jinên kurd ên ku min dîtî, tuyan bi heyranî li min nedinêrî. Eksê vê yekê; dilê xwe bi cilên min ên

¹⁶⁵ Bazil Nikitin, *Kürtler*. r. 180

¹⁶⁶ E. W. Charles Noel, *Kurdistan 1919*, r. 13.

¹⁶⁷ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 26

¹⁶⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 26

¹⁶⁹ Minorski, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 31

¹⁷⁰ Bazil Nikitin *Kürtler*. r. 179

ewrûpî dişewitandin, ji bo ku ez bi tena serê xwe li cîhanê digeriyam, li ber min diketin.”¹⁷¹

2.7. Rêzgirtin û Destnedayîna Jinan

Seyah û lêkolînerên ku hatine Kurdistanê, li nav kurdan geriyane, li ser çanda kurdan çavdêrî û lêkolîn kirine, di derbarê statuya jinên kurd de, bi taybetî bal kişandine ser destnedayîna jinê. Kesên ku di derbarê jinê de nivîsîne, bê îstîsna hemûyan bahsa vê taybetmendiyê kirine. Çawa ev rêbaz di belgeyan de heye, bi heman awayî heta îro jî di civaka kurdan de dimeşe.

Di civaka kurdan a klasîk de, jin jî qategoriyeye biqasî melan û şêxan girîng in. Ev her sê qategorî çî ricayê bikin, tê qebûl kirin. Lew jin di nav kurdan de pîroz in, masûm in û pir biqîmet in. Lewma bi jinan re şer nabe û tu kes wan nakuje.¹⁷²

Di nexweşî û şerên navxwe de, jin bi hêsanî tevdigerin. Dema ku di şerên navxwe de mêr qet nikarin ji mala xwe derkevin, jin bi hêsanî li nav gund digerin û diherin malên hevdû. Bi taybetî di sekinandina şerên dijwar de rola jinê diyarker de ye. Dema ku jin tê û destmala serê xwe davêje nav wan, bêgûman her dû alî ji hevdû dibin û şer disekinînin.¹⁷³ Heger ku ji herdû beran yek ji wan jina xwe bişîne cem ê din û daxwaza sekinandina şer û çareseriyê bike, divê yê hemberê wî vê daxwazê teqez bipejirîne, hemû tiştî ji bîra bike û bi wan re li hevdû were, sirf ji bo ku jin hatiye cem wan.¹⁷⁴

Piştî ku herdû eşîr li hevdû tên, gelek caran ji hevdû dizewicin, dibin xizmên hevdû, bi vî awayî êdî nexweşî bi temamî ji nav wan radibe. Piştî vê yekê êdî nifşên nû nexweşiyên kevn, fikrên dijminahî ji bîra dikin. Weke mînak eşîra Berzaniyan gelek salan bi eşîreke cîran re dijminahî kirine, di salên 1980'yî de li hevdû hatine, ji herdû

¹⁷¹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 33

¹⁷² Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* r. 55

¹⁷³ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* r. 53

¹⁷⁴ Ahmet Kahraman, *Hevpeyvîn*, 10.02.2003

eşîran keç û xort bi hevdû re zewicîne. Bi vî awayî herdû dijminên berê, bi van zewacan êdî bûne meriv û xizmên hevdû.¹⁷⁵

Vî rola jinê bala temsîlkarê Şîrketa Hindîstana Rojhilat, James Claudius Rich kişandiye. Rich di çavdêriyên ku sala 1820an de li nav kurdan kiriye de, balê dikşîne ser vî rola jinê û radigihîne ku li herêma Senendajê şerên dijwar ku di navbera eşîrên kurdan de pêk hatine, jinan sekinandine.¹⁷⁶

Di kovara *Rojî Kurd* ku di sala 1913yan de dihat weşandin de, destnedayîn û rêzgirtina jinê, wiha tê vegotin:

“Di nav kurdan de rêza jinê pir tê girtin. Adetî jin bêteref û masûm tê dîtin. Herkes rêzgirtina li hemberî jinê weke wezîfeyekê dibîne. Dema eşîr bi rojan bi hevdû re şer dikin, hevdû dikujin, guleyan bi ser hevdû de dibarînin, dibe vize viza guleyan, jin di vê rewşa dijminahî de bi hêsanî digerin, pêwistiyên herdû aliyên, ên mecbûrî temîn dikin. Êrîşa li jinên hemberên xwe tu kes nîne bîra xwe... /... Dema ku hin kes destên xwe dirêjî jinekê bikin, temama gundiyan tevdigerin, ji bo mafê destnedayîna jinekê tenê, dixebitin. Ev hemû diyar dikin ku, li gel hemû cehaletiyên civaka kurdan, jin xwediyê xatir û qîmetekê ye.”¹⁷⁷

Ev rêbaza destnedayîna jinê heta îro jî di nav kurdan de dimeşe. Li ku derê be, di çi rewşê de be û bedelê wê çi dibe bila bibe, divê destnedayîn û kêmnexistina jinê were parastin. Weke mînak, parastina destnedayîna jinê, li herêma Dêrsime bûye sedema êrîşa dewletê û di qetlîama ku pêk hatiye de 70 hezar mirov hatine kuştin. Kurdan zanîbûn ku wê bi kuştina efserekî pîrsgirêkên mezin dest pê bikin, lê dîsa jî ji vê parastinê bi şûn de gav neavêtin. Heger ku bi şûn de gav avêtibûna, hestên şikiyayî wê ji bo wan ji vê mirinê girantir bihata. Sedem ev e ku wan mêrê wê jinê nedan destê dewletê û nirxên xwe parastin.¹⁷⁸

¹⁷⁵ Ferhad Şakelî, *Hevpeyvîn li Zanîngeha Uppsalayê* 06.05.2003

¹⁷⁶ Metin Atmaca, “Uluslararası Kürt Kadını Kongresi”, *19’uncu Yüzyıl Batı Seyahatnamelerinde Kürt Kadınının İmajı*. r. 259

¹⁷⁷ Kovara *Rojî Kurd*, Hejmar 4 / r. 105

¹⁷⁸ Ahmet Kahraman, *Hevpeyvîn*, 10.02.2003

2.7. Zewac û Revandina Keçan

Hin kurd zewaca bi gelên din re weke tehdîtekê dibînin û lewma xwe jê diparêzin. Helbet ev tirs ne bi kurdan tenê re, bi hemû etnîsîteyan re heye. Lê li gel neteweyên mezin, weke Îngîlîz, Fransîz, Alman û hwd tirsên wanî tune ne. Lew çanda wan eşkere û serdestê cîhanê ye, ev yek jî nahêle di nav gelên din de bihelin û asîmîle bibin. Weke mînak; dema ku îngîlîzek bi hin kesên ji Rojhilata Navîn re dizewice, çanda îngîlîz serdest e, ne ya Rojhilata Navîn. Heman tişt ji bo kurdan jî derbas dibe. Dema ku kurdek, çî jin çî jî mêr, bi tirkekî re dizewice, di zewaca wan de çanda tirkan dibe serdest. Di zewacê de ya bi swêdiyan re jî heman tirs heye. Dibe ku veya bibe sedem û zarokên kurdan bi gelên din re nezewicin, an dê û bav nexwazin zarokên wan bi kesên ne kurd re bizewicin. Lê Şakelî radigihîne ku weke prensîb kurd ne dijî gelên din in. Li gel van sedeman hemûyan dîsa jî mirov nikare bi nêrîneke tevahî bêje “kurd naxwazin bi gelên din re bizewicin.” Lew em dibînin li Swêdê gelek kurd bi gelên din û bi swêdiyan re zewicîne.¹⁷⁹

Bi taybetî li Kurdistanê, her çiqas kurd weke prensîb bi kurdan û bi kesên ji eşîra xwe re dizewicin jî, ji ber hebûna etnîsîteyên cuda li Kurdistanê, weke encam, Kurd gelek caran ji gelên cîran jî jinan tînin.¹⁸⁰

Li gorî nivîsên ku di sedsala 19yan de hatinê nivîsîn, mirov fêhm dika ku di jiyana kurdan de bêtir zewaca bi tenê jinekê re di nav kurdan de heye.¹⁸¹ Lê ji ber sedemên siyasî hin axa û serokên eşîran bi çend jinan re dizewicîn da ku zarokên wan pir çê bibin. Bi vî awayî desthilatdariya xwe bihêz dikirin. Lê îro ev rewş hatiye guhertin û zewaca bi gelek jinan re her ku dihere kêmkirî dibe. Li gorî bajaran, li gundan zewaca bi gelek jinan re bêtir e. Zewacên bi du jinan re, ji sedî dudu derbas nake.¹⁸²

Zewaca bi gelek jinan re û hevdûberdan berî îslamê di nav kurdan de tune bû. Bi hatina îslamê re ev yek hatiye Kurdistanê. Her çiqas li gorî hiqûqê îslamê, mêrek dikare di heman demê de bi çar jinan re bizewice jî, bi tevahî di nav kurdan de ev yek pêk nehatiye, ev rêbaz di teoriyê de maye. Herwiha hevdûberdan jî, ji zewaca bi gelek jinan

¹⁷⁹ Ferhad Şakelî, *Heypeyvîn li Zanîngeha Uppsalayê* 06.05.2003

¹⁸⁰ N. A Smirnov vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 30

¹⁸¹ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. bibîne û binivîse.

¹⁸² Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 32

re hindiktir e. Berî îslamê, di warê hevdûberdanê de, jin jî xwedî maf bû. Heger ku jinekê bigota ez ji mêrê xwe hez nakim, yekser dikarîbû ew berda. Lê li gel ku îslam hatiye pejirandin jî, ev rêbaz di nav kurdan de bi awayekî berbiçav hatiye parastin.¹⁸³

Zewacên kurdan, bi piranî bi riza herdû aliyan an jî li ser daxwaza wan pêk tên.¹⁸⁴ Ji ber azadiya jinên ku nenixwamtî bi serbestî dikevin nav mêran û digerin, zewaca ku pêk tê, encama evînekê ye û ne weke peymaneke ku di navbera du malbatan de çê bibe.¹⁸⁵ Di nav jin û mêran de, hezkirina ji dil heye, ku ev hezkirin di nav eşîrên kevnaretir de qet nayê dîtin. Herweha li tu deran mînakeke ji têkiliya herdû cinsan a eşkere û xweşbîniya wan a li hemberî hevdû, baştir tune ye. Têkiliyên bi vî awayî, ji gelên Rojhilat bêtir, dişibe gelên Ewrûpî.¹⁸⁶

Têkiliyên keç û xortan ên ku gelek caran dibe sedema zewaca wan, di pêvajoyeke xwezayî de pêk tê. Piştî temenekî, êdî keça ciwan di demên xwe yên vala de bi hevalên xwe re tahma ciwaniyê derdixe. Kêfên ku bi hevalên xwe re dike, bi taybetî kirina dîlanê ye û gotina kilaman e. Helbet di civînên wanî de xort jî hene. Di van civînên ku heftê carekê yan du heftan carekê dikin de, derfetên neqandina mêrê xwe yê pêşerojê dide qîzan.¹⁸⁷ Bi vî awayî gelek ciwan bi hevdû re dipeyivin, kilaman davên ber hev û flort dikin. Ên xort bi kilamên xwe evîna xwe ji keçan re eşkere dikin, keç jî bi kilaman bersiva wan didin. Bi vî awayî gelek evîndarî dest pê dikin û piraniya kesên evîndar bi hevdû re dizewicin. Sedem ev e ku di nav kurdan de zewac bi piranî bi evînî pêk tên.¹⁸⁸ Bi vî awayî xuyaye ku bi pirani di nav kurdan de zewac ne ku hin kesên din keç û xortan ji hevdû re dibînin, bi awayê ku keç û xort bixwe hevdû dicibînin û dibijêrin, zewac pêk tên.¹⁸⁹

Derfetên ku hevdûdîtinên xweş diafirîne, ne tenê kirina dîlanê û gotina kilaman e; keç û jinên kurdan bi gerên ku li bexçeyan de peya yan bi hespan dikin, tahma azadiyê derdixin, bi awayekî masûm û zarokî di nav gul û çiçekan de tahma jiyane

¹⁸³ Sureyya Bedirxan. vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 246

¹⁸⁴ E. B. Soane, *Mezopotamya'ya ve Kürdistan'a Gizli Yolculuk*, r. 407

¹⁸⁵ Wadie Jwaideh. vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 271

¹⁸⁶ E. B. Soane, *Mezopotamya'ya ve Kürdistan'a Gizli Yolculuk*, r. 407

¹⁸⁷ Kamûran Bedirxan vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 239

¹⁸⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 245

¹⁸⁹ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, rüpel 340

distînin û vê tahmê di rojên ciwanîyê de weke bîranînên şêrîn diparêzin.¹⁹⁰ Kamûran Bedirxan hevdîtînen keç û xortan, ên wan ên romantîk, wiha vedibêje:

“Civînen wiha, hevaltiyên gund, ruhê keçê ciwan bi hezkirinê dadigire, bi taybetî di vê demê de, şevên dirêj, di quncikê bexçe de, di bin rohniya stêrkan de hevdûdîtînen bi dizî dest pê dike. Ciwan di vê hewayê bi bêhna xweş ku dikşînin hundurê xwe de, dilê xwe ji hevdû re vedikin, gotinên hezkirinê ji hevdû re dibêjin, sozan didin hev, sêdaqeta xwe ji hevdû re dibêjin. Heger ku nêta wan cidî be, ji bo hevdûdîtînen bi tenê û bi şev, çav tên girtin. Ev hevdûdîtînen bi vî awayî bi piranî digihên encamên bextewar, lê kêman caran bi awayekî dramatîk jî bi dawî tên.”¹⁹¹

Lê divê neyê ji bîr kirin ku hin caran, ji ber hin sedeman malbatên keç û xortan destûra zewaca wan nadin. Di rewşên wanî de revandina keçê mûbah e. Ji bo ku xortek keçekê birevîne, divê berî her tiştî teqez revandin bi dilê wê keçê be û destûra wê were stendin. A duyem, divê keç ji mala bavê xwe were revandin. Di vêderê de, xaleke girîng ew e ku keç bixwe ji malê nareve lê ji bo ku were revandin derfet tên amadekirin. Di rewşên wanî de bi piranî yê ku plana revandinê amade dike, diya keçê bixwe ye.¹⁹²

Dema ku xort wê keçê direvîne, dibe mala axayekî, şêxekî yan maleke ku di civakê de xwedî xatir e. Helbet ev mal berê hatiye diyarkirin û bi piranî bê pirsgirêk digihên vê malê. Xwediyê malê û hin kesên di civakê de xwedî xatir, dikevin navbêna malbata xort û keçê, heger ku ew xort xizan be jî, ji kîsê xwe yan ji der û dora xwe hin diravan berhev dikin, diçin mala bavê keçê, rica dikin, mala bavê wê jî qebûl dike. Bi vî awayî mesele hal dibe, nexweşî jî holê radibe û aşîti ava dibe.¹⁹³ Ji sedî 98 – li ser vê yekê tu lêkolîn tune ne lê ev hejmar texmîn e – bûyerên wanî bê pirsgirêk tên çareser kirin. Keç û xort ji aliyê herdû malbatan ve tên qebûl kirin. Pişt re herdû malbat diherin cem hev û tên, êdî dibin meriv û xizmên hevdû.¹⁹⁴

¹⁹⁰ Kamûran Bedirxan. vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 239

¹⁹¹ Kamûran Bedirxan. vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 239

¹⁹² Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 246

¹⁹³ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. 54

¹⁹⁴ Malmîsanij, *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

Revandina keçan weke kevneşopiyeye çandî ji zû de di nav kurdan de heye, lewma keçrevandin di nav kurdan de ne eyb e.¹⁹⁵ Hemû çavkaniyên ku bahsa keçrevandinê dikin, bi taybetî balê dikşînin ser riza keçê. Ango heger ku revandin bi dil û riza keçê be, weke bûyereke çandî tê pejirandin, lewma jî eyb nayê dîtin.

Di derbarê revandinê de, Cecil John Edmonds îddîa dike ku keçên kurd pir ji romantîzmê hez dikin û dibêje lewma li hin herêmên Kurdistanê hevdûrevandina keç û xortan meşhûr e. Edmonds du eşîrên li Kurdistana Başûr, yek bi navê Bilbas û yek bi navê Ako weke mînak nîşan dide û dibêje jinên van herdû eşîran bi asteke ku îflah nabin bi romantîkbûna xwe nav dane; revandina keçan û bi evîndarê xwe re, di nav van herdû konfederasyonên eşîran de pir tê dîtin. Gelek keçên bi îhtiras, ji bilî revandinê, zewaca bi awayekî din xeyal nakin.¹⁹⁶

Li gel vê revandina bi dilê keçan, hin caran di nav kurdan de, keç û jinên zewicî, bê dilê wan, anga bi zorê jî tên revandin. Di rewşên wanî de, rêbazên pir hişk dikevin meseleyê.¹⁹⁷ Malbata wê jinê bi dijwarî tevdigere, kîn û dijminahî, herweha kuştina mêran dest pê dike û tolhildan bi salan dom dike. Bi piranî di nav eşîrên kurdan de derketina nakokî û dijminahiyan, ji ber bi zorê revandina keçan dest pê dike.¹⁹⁸

Li hemberî revandina keçan bi zorê, kurd ne bi awayekî kevneşopî, bi kîn, rik, kuştin û dijminahiya eşîran tenê bertekê didin, herweha dema ku kurd di warê siyasî de jî bûne xwedî desthilatdarî, bi awayekî nivîskî di zagonên xwe de, hewl dane ku vê yekê ji holê rakin. Li gorî zagona Komara Mahabadê; heger ku mêrek jineke zewicî, yan keçeke azib bi zorê birevîne, ew mêr bi kuştinê tê cezakirin. Lê heger ku mêrek keçekê bixwaze û ev xwestin bi riza wê keçê be, lê malbata wê keçê red bike û li ser vê redkirinê ew mêr û keç hevdû birevînin, tu ceza nayê dayîn.¹⁹⁹

Lêbelê heger ku jineke zewicî bi mêrekî din re têkeve têkiliyeye evîni yan zayendî, heman tolerans ji bo wê tune ye. Di rewşeke wanî de malbata jinê hem li

¹⁹⁵ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. 54

¹⁹⁶ Cecil John Edmonds, *Kürtler, Türkler ve Araplar*, r. 297

¹⁹⁷ Barbro Karabuda, *Öster om Eufrat – i kurdernas land*, wer. Salih Karaaslan r. 65

¹⁹⁸ Kovara *Rojî Kurd*, Hejmar 4 / r. 105

¹⁹⁹ Rojnameya *Kurdistan* (1946) 16 (18 Sebata:4) vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 119

hemberî wê jinê hem jî li hemberî mêrê ku bi wê re di têkiliyê de ye, dikeve helwesteke dijwar.²⁰⁰

2.8. Perwerdehiya Jinan

Dema ku mirov li civaka kurdan, a klasîk dinêre, mirov dibîne, heger ku bi qasî mêran nebe jî, gelek keçan jî li ber destên meleyan perwerde dîtine.²⁰¹ Bi taybetî, lêkolînên ku di derbarê jinên dema Eyûbiyan de hatine kirin, diyar dikin ku gelek jinên ronakbîr û alîme di civaka kurdan de gihaştine û bûne xwediyê statuyên girîng.²⁰²

Abdurrahîm Rahmiyê Hekarî pêşveçûna jinan û ya civakê bi hevdû ve girêdayî dibîne û vê girêdanê bi metaforeke wiha vedibêje: “Ji dema me hatiye pirsîn: ‘Di derbarê zanist û pêşveçûnê de tu deyndarê kê yî?’ Dema me bersiv daye gotiye: ‘Deyndarê jina me’”²⁰³

Dema ku di navbera salên 1918 û 1932an de li Kurdistana Başûr desthilatdariya îngîlîzan hebû, kurdan perwerdehiya keçan, daxwaza vekirina dibistanan pir ji wan kirine. Balkêş e ku di vê daxwazê de, di navbera perwerdeya zarokên keç û yên kur de tu ferqî nekirine. Li navçeyan, heta li bajarên biçûk ên weke gundan, şandina dibistanê ya keçên diwanzde, sêzde salî bi lawikan re, ji bo dê û bavên ronak tiştêkî ji rêzê bûye. Di wê demê de, di derbarê wekheviya jin û mêran de, derketina maqaleyan di çapemeniya kurdan de, timî dihate dîtin.²⁰⁴

Herweha ronakbîrên kurdan jî doza perwerdeya jinan kirine û ji bo vê yekê ketine tevgerên cidî. Yek ji van ronakbîran Abdûllah Cewdet e. Abdullah Cewdet di nivîsên xwe de hertim mafê jinan diparêze, di pêşveçûna civakan de bahsa girîngiya rola jinê û yê dayikan dike. Dibêje em di warê manewî de, ji bavê xwe bêtir berdewama diya xwe ne. Lewma wî û Îshak Sukutî bi hevdû re li Elezîzê dibistaneke ku keç û kur bi hevdû re bixwînin, vekirine.²⁰⁵

²⁰⁰ Malmîsanij , *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

²⁰¹ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradan*. r. 58

²⁰² Muhammed Yusuf Hayr, *Îslam Tarihinde Kürt Kadını*

²⁰³ Sharzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 57

²⁰⁴ Sharzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 23 (Edmonds'tan alınmış)

²⁰⁵ Abdûllah Cewdet, vgz. Sharzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 83

Ji bo pêşveçûn û perwerdehiya jinan, di 1919'yan de, li Stenbolê, komeleya *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti* tê avakirin. Ev komele perwerdeya jinan girîng dibîne û perwerdeya jinan weke pêşveçûna hemû kurdan dinirxîne. Dema ku mirov bahsa pêşveçûna kurdîtiyê dike, di vê pêşveçûnê de jin jî cî digire, mêr jî. Di warê perwerde û çandê de, divê di navbera jin û mêran de wekhevî hebe. Divê mirov bi zorê cudahiyeke nexwezayî nexer navbera jin û mêran.²⁰⁶

Di derbarê perwerdeya zarokên keçik, fêrbûna wan a jiyane û hunerên klasîk, ên kevneşopî de, jin rolekî girîng dilîze. Ji çê bûna zarokan û pê ve, fêrbûna gotina kilaman û siwarbûna hespan tê dest pê kirin. Fêrkirina karên destan, çêkirina qenewîçan, dirûn, hûnandina xaliyan û karên hwd. bi zarokan re hêza rîtim, reng, lihevkerin û neqîşandinê çê dike. Bêgûman ji vê perwerdeyê dayik berpirsiyar e.²⁰⁷

2.9. Jin di Dînên Kurdan de

Bê çawa di civaka kurdan de jinan di jiyana aborî, siyaset û leşkerî de weke mêran wezîfe girtine, bi heman awayî di dîn de jî wezîfe girtine. Ev wekhevî bêtir di dînên kurdan ên berî îslamê de hebûye. Di dînê zerdeştî ku kurdan diheband û di mazdekî de ku weke berdewamiya zerdeştî ye, rêbazên ku wekheviya jin û mêran diparastin hebûn.²⁰⁸

Piştî Zayinê di sedsala 3yan de dema ku dînê manî, zerdeştîyê reforme dike û bi awayekî sistematîk dibe dînê dewletê, bandorê li rewşa jinê dike. Di felsefeya manî de têkiliyên jin û mêran û statuya jinê li gorî dînên yekxwedayî cuda ye. Baweriya manî, ku şîrkatiya hilberîn û mulkiyetê diparêze, dîtina jinê ya weke mulkiyeteke, pergala cariyetiyê û zewaca bi gelek jinan re red dike.²⁰⁹

Di dînê kurdan ê herêmî, yezdanîtiyê de jî ciye jinê heye. Di jiyana maddî, ya ji her heft qonaxên Ruhê Gerdûnî, di nav şeş Avatarên Mezin de, ciyekî dide jinekê jî. Hin

²⁰⁶ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 201

²⁰⁷ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 238

²⁰⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. XIII

²⁰⁹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 8

berhemên pîroz ên yezdanîtiyê, ji aliyê Mama Nêrgiza Şehrazûrî, ku ew bixwe Avatareke Biçûk a Ruhê Gerdûnî bûye, hatiye nivîsîn.²¹⁰

Li gorî Nîmetullah Ceyhunabadi ku pêşkêşê dîne yaresanî bû, di dîne yaresanî de jî di destpêka sedsala 20an de, ji 1145 Sûfiyan, biqasî 500 kesî jin bûn.²¹¹

Di nav kurdên yahûdî de jî, statuya jinên kurd a bilind û azadiya wê ya îzafî bûye sedem ku di sedsala 17an de Hahama bi navê Asenath Barzanî derketiye holê.²¹²

Di êzîdîtiyê de ji sala 1913an heta 1957an, fiilen di vî mewqî de jineke bi navê Meyan Xatûn hebû. Tê gotin ku Meyan Xatûn di vî dema dawiyê de, di nav êzîdiyan de pêşkêşa herî bi hêz bû.²¹³

Di elewîtiyê de jî di gelek waran de jiyana jin û mêran bi hevdû re ye. Merasimên weke Cem û Semayan jin û mêr bi hevdû re dikin, li gel ku helbestvaniya jinan di îslamê de kêmtir dîtin, di civakên Elewî û Bektaşîyan de gelek helbestvanên jin hene, herweha hejmara wan bi tevgerên rojavayî bêtir dîbin.²¹⁴

Lêkolînerêkî bi navê S. R. Trowbidge di sala 1909an de maqaleyek li ser rewşa jinê di elewîtiyê de nivîsiye. Trowbidge wiha dibêje:

*“Di warê ruh û hezkirinê de di navbera jin û mêran de tu cudahî tune ye. Di vî warî de herdu cîns weke hev in. Di zeka û îdarekirinê de, kîjan baştir be, ew ê bike. Weke mînak, dema ku mêrekî lawaz bi jineke esîl û jêhatî re bizewice, îdare dikeve destê jinê; jin dikare cîhanê jî îdare bike.”*²¹⁵

Balkêş e ku di elewîtiyê, ahlî haq û êzîdîtiyê de zewaca bi gelek jinan re qedexe ye. Bêgûman ev yek, di zewacê de wekheviya jin û mêr derdixe holê.²¹⁶

²¹⁰ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 339

²¹¹ Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, r. 339

²¹² Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, rüpel 340

²¹³ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 141

²¹⁴ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 19

²¹⁵ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 22

²¹⁶ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 20

2.10. Jin di Wêjeyê de

Folklorîstên kurdan, bi tevahî, di navbera jin û folklorê de, peywendiyêke taybet qebûl dikin. Lew folklorê kurdan bi qasî ku ayidî mêran e, hewqasî ayidî jinan e jî. Gelek ji bêjerên Mem û Zîn, Zembîlfiroş û Destana Dimdimê, herweha bestekar, şiroveker û guhdarên gelek çîrok û helbestên gelêrî, jin in. Her çiqas hin cureyên bellî yên jina bin jî, bi tevahî di tiştên ku tên gotin û tên afirandin de cudahiya jin û mêran tune ye. Di vê xalê de di folklorê hin civakan de, ferqîya jin û mêran heye, lê ev yek di folklorê kurdan de tune ye.²¹⁷

Di civakê kurdan a klasîk de, gelek jinan bi awayekî kevneşopî stran digotin. Herweha gelek stranbêj weke hunermend, heta îro jî muzîkê berdewam dikin.²¹⁸ Temama zêmar û kilamên mewalî, berhemên jinan in. Bi taybetî kilamên evînî, ji aliyê jinan ve tên afirandin. Dema ku ji kurdekî were pirsîn ev kilam a kê ye, wê bêjin “bêgûman a jinekê ye, lê ez navê wê nizanîm.” Bersivdayîna bi vî awayî li vî welatî tişteki ewqasî ji rêzê ye, mirov qet lê şaş nabe.²¹⁹

Gotinên kilaman, di civakê de, bi taybetî di têkiliyên keç û xortan de rolekî girîng dilîze. Keç û xort ji hev du re bi gotina kilaman, flort dikin, evîna xwe ji hevdû re diyar dikin û ev yek dibe sedema destpêka evînên kûr.²²⁰

Di folklorê Kurdî de, lêkolîner ji bilî evînê, bi taybetî balê dikşînin ser erotîzma ku bi awayekî eşkere di kilamên kurdî de tê vegotin. Di van stranan de, îşareteke tîpîk ew e ku keç aliyên xwe yên fîzîkî yên balkêş ji evîndarê xwe re vedibêje. Gelek caran weke xala herî balkêş, pêsîrên xwe, gerdana xwe, pişt re cil û bergên xwe, makyaja xwe û di bedena xwe de derên cûr be cûr vedibêje.²²¹

Ji erotîzmê bêtir, gelek caran keç bi fantazyên zayendî tên vegotin. Bi awayekî eşkere jin bedena xwe didin naskirin, laşê xwe weke malê evîndarê xwe dibînin û

²¹⁷ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 250

²¹⁸ Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 250 (veya di kûrt edebiyatî de heye derxe.)

²¹⁹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 242

²²⁰ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 245

²²¹ Christine Allison. vgz .Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, r. 259

evîndarê xwe ji bo bedena xwe vedixwînin.²²² Lêkolînera îngîlîz Christine Allison vê vexwendinê wiha vedibêje:

“Di van stranan de pêşîran bi gelek şiklan dişubînin xwarinê, pêlîstok, ji bo ku evîndarê wê sebra xwe pê bîne, dema xwe pê derbas bike, di bedena xwe de weke derên taybetî evîndarê xwe vedixwîne. Jin, heger ku negihên evîndarê xwe, dibe weke ku pêşîrên wan tune bin kilamên xwe vedibêjin, ango bi awayê ku pêşîrên wan ji bo zewqa evîndarê wan tenê hene, vedibêje.”²²³

Helbet taybetmendiyên xortan jî di kilaman de tîn vegotin lê bi qasî yê keçan bi kûrahî nayê vegotin.²²⁴

Ji bilî stranên evîni, gelek stranên şeran jî ji aliyê jinan ve tîn îcrakirin.²²⁵ Jin û keçên yekî qahreman ku hatiye kuştin, gelek kilamên ku ji bo şerefa wî çê kirine, heta îro jî tîn gotin.²²⁶

Çi di folklorê de, çi jî di wêjeya nivîskî de, di dîroka kurdan de, gelek jinên kurd kilam û helbest afirandine. Dema ku di wêjeyê de bahsa jinê dibe, bêgûman yekser Mestûre Xanima Kurdistanî tê bîra mirovan. Ji bo ku mirov Mestûre Xanimê bêtir nas bike, hêja ye mirov bi taybetî bahsa wê bike.

Fata Reş û Adîle Xanim di desthilatdariyê de çawa nav û deng dane, Mestûre Xanima Kurdistanî jî di wêjeyê nav û deng daye. Navê wê yê rastî Mah Şeref Xanim e. Lê ji ber ku di helbestên xwe de nasnavê Mestûre Xanima Kurdistanî bikar aniye, bêtir weke Mestûre Xanima Kurdistanî, yan jî Mestûre Xanim tê naskirin. Mestûre Xanim li Îranê, di sala 1805’an de li bajarê Senendecê (Sinê) çê bûye. Li Rojhilata Navîn ku hejmara helbestvanên jin kêr in, Mestûre Xanim bi xebatên di wêjeya kurdî û farisî de,

²²² Shahrzad Mojab, *Devletsîz Ulusun Kadınları*, r. 259

²²³ Shahrzad Mojab, *Devletsîz Ulusun Kadınları*, r. 259

²²⁴ Shahrzad Mojab, *Devletsîz Ulusun Kadınları*, r. 259

²²⁵ Thomas Bois. vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsîz Ulusun Kadınları*, r. 249

²²⁶ Alexander Jaba. vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsîz Ulusun Kadınları*, r. 249

ciyekî girîng digire. Ji ber ku xebatên wê li ser dîrokê jî hene, hem weke helbestvan, hem jî weke dîroknas tê naskirin.²²⁷

Mîrê Erdelaniyan Xusrew Xan 1832'an de bi Mestûre Xanimê re dizewice. Xusrew Xan bixwe ji wêjeyê hez dikir û helbest dinivîsîn. Herdû helbestvanan hewqasî ji hevdu hez dikirin, kîjan aşiq bû, kîjan maşûq, mirov nizanîbû. Lê zewaca wan pir dom nekiriye, piştî deh salan Xusrew Xan weke gelek kesan, ji ber nexweşiya weba dimire.²²⁸

Zarokên Xusrew Xan û Mestûre Xanimê çê nebûne, lewma di navbera Mestûre Xanim û zarokên Xusrew Xan ên ji jina wî ya berê de nakokî dest pê dikin. Piştî ku Mestûre Xanim bar dike dihere bajarê Helebçe bi salekê, di 1844an de dimire.²²⁹

Tê gotin ku Mestûre Xanim bi kurdî berhemeke ku ji bîst hezar beytan pêk tê, nivîsiye. Lê ev berhem heta niha nehatiye kişifkirin û neketiye destê me. Mestûre Xanim bi farisî jî dîwanek nivîsiye. Herweha bi Farisî, bi navê Tarîx-î Erdelan, dîroka Xanedaniya Erdelanê nivîsiye. Dîsa bi Farisî Akaid û Ta'lîmat-i Îslamî, ku li ser mijarên dînî disekine nivîsiye, lê ev berhem û yeke din bi navê Mecma'u'l-Ubeda nivîsiye, negihaye me.²³⁰

2.11. Statuya Jinan di Gotinên Pêşyan de²³¹

Di Gotinên Pêşyan ên Kurdan de, jin ciyekî girîng digire. Di hin gotinan de tê vegotin ku jin di civakê de rola diyarker dilîze. Lewma mirov dikare statuya jina kurd, bi hêsanî bi alîkariya gotinên pêşyan, kêr zêde diyar bike. Çend gotinên pêşyan wiha dibêjin:

Jin jiyane: Ev gotin diyar dike ku jiyane bi jinê dest pê dike û bi wê berdewam dike.

²²⁷ Abdurahman Adak, *Hakkari Kadın Kongresi*, r. 131

²²⁸ Abdurahman Adak, *Hakkari Kadın Kongresi*, r. 131

²²⁹ Abdurahman Adak, *Hakkari Kadın Kongresi*, r. 132

²³⁰ Abdurahman Adak, *Hakkari Kadın Kongresi*, r. 132

²³¹ Ali Karadeniz, "Jin Jiyane!" *Atasözü İddia mı Gerçek mi? Uluslar arası Kürt Kadını Kongresi*. R. 191

Jin biçe xwînan, xwîn xweş dibin: Dema ku jin di dijminahiyên navbera eşîran de mudaxil bibe, dijminahî bi aşîtî bidawî tê. Lew di civaka kurdan de rêza jinê tê girtin. Li gorî kevneşopiyên qedîm, heger ku jinek desmala serê xwe veke û bavêje erdê, herdu alî mecbûr in şer bisekinînin.

Şêr şêr e, çî jin çî mêr e: Nêr an jî mêbûna şêr ferq nake, şêr hertim şêr e. Di kilamekê de çîroka mêrekî bi navê Mistefa Beg û jineke bi navê Adûlê Xanim tê vegotin. Li herêma Mistefa Beg xela avê heye. Çem, gol û bîrên wan zuha bûne. Heywanên wan ji ber tunebûna avê telef bûne. Av li herêma Şerîf Begê Mewaliya heye, divê ji wê derê avê bînin. Lê Mistefa Beg ceger nake ji bîrên Şerîf Beg avê bîne. Li ser nîqaş û xireciran, deng dihere Edûlê keça Mistefa Beg û ji bo ku ew bixwe here ji herêma Şerîf Beg avê bîne, destûrê ji bavê xwe dixwaze. Lê bavê wê dibêje wê bibêjin ji tirsan jinên xwe dişînin, lewma destûrê nade Edûlê. Li ser vê yekê Edûlê Xanim gotina xwe ya meşhûr dike, dibêje “şêr şêr e, çî jin e çî mêr e”.

Jin dîwarê der e, mêr dîwarê hundur e: Ev gotin, jinê weke neynika malbatê ku ji bo cîhana derve diyar dike, vedibêje.

Rewşa malê kevanî ye: Ev gotin jî weke ya jor nîşan dide ku di civakê de reng û statuya malbatê jin diyar dike.

Ên ku mêra radikin jî jin in, ên ku wan dadikin jî: Ev gotin diyar dike ku girêdana mêr û satuya wî ya civakî bi jinê ve girêdayî ye. Heger ku jin baş be, mêrê xwe radike, bilind dike, heger ku xerab be, mêrê xwe kêm dixê.

Jin stûna malan e: Ê ku malê dike mal û li ser nigan dihêle, jin e.

Jin keleha mêran e: Tê wateya, yê ku mêran ji hemû êş, azar, keder û pirsgirêkan weke kelehekê disitirîn e, jin e.

Jin sitara mêran e: Ev gotin jî weke ya jor, wateya ku jin mêran diparêzin dide.

Jin bixwaze mêrê xwe dike ezîz jî, dike rezîl jî: Jin dema piştgiriya mêrê xwe bike, weke mînak di pêşwazîkirina mêvan, dost, heval û xizman de rolekî baş bilîze,

hem ew bixwe şerefê distîne û hem jî şerefê dide mêrê xwe. Lewma wê ji mêrê wê were hezkirin û bibe ezîz. Lê heger ku eksê vanan bike, wê di civakê de mêrê xwe rezîl bike.

Mal bi jinan ava dibe: Lew jin di ziman, çand û kevneşopiyên de xwedî rolekî girîng e. A ku van nirxan neqlî zarokan dike jin e. Di avakirina hizûra malê de jin rola diyarker dilîze. Mala ku jin tê de tune be, mirov nikare bahsa hebûn û neqilkirina van nirxan bike.

BEŞ III

KUŞTINA NAMÛSÎ LI NAV KURDAN

3.1. Têgeha Namûsê li Nav Kurdan

Celadet Alî Bedirxan di ferhenga Kurdî-Kurdî de, têgeha *namûsê* wiha rave dike: “Namûs: rûmet û şerefa ku li pê navê pak digehê mirov.”²³² Her çiqas di vê ravekirinê de bahsa jinê neyê kirin jî, ji ber ku di çanda kurdan de jin pîroz tê dîtin, ji bo malbatê û mêran di afirandina taybetmendiyên baş de rolekî girîng dilîze, di bingeha “navê pak” de jin jî heye. Lewma her çiqas jin neyê destnîşankirin jî, di vê ravekirinê de jin heye.

Lê di Ferhenga Kamêran a Kurdî-Kurdî de, di ravekirina *namûsê* de bahsa jinê tê kirin. Dibêje: “Namûs: Tiştê herî pîroz li cem mirovî, wek welat, ax, jin, zaro û hwd. şeref.”²³³ Di vê ravekirinê de, hemû tiştên pîroz weke namûs tê nirxandin, di nav van tiştan de, eşkere bahsa jinê jî tê kirin.

Têgeha *namûsê* bi koka xwe *nomos* e û *nomos* ji zimanê girêkiya kevnare, tê. *Nomos* tê wateya zagon, yekîtiya zagonan û rêbazan. Ev gotin di xebatên felsefî yên grêkên kevnare de heye, piştî di ser zimanê erebî re derbasî kurdî bûye.²³⁴

Malmîsanij radigihîne ku îro, di nav kurdan de, du wateyên têgeha namûsê hene; berî her tiştî dema ku bahsa namûsê dibe, jin tê bîra mirov. Ev yek di derbarê sînorê jinê û kesên ku divê bi wê re nekevin têkiliyeke zayendî de ye, ango mebest kesên derveyî zewacê ye. Bi Erebi ji vêya re dibêjin *namahrem*, bi kurdî tê wateya “bi jinê re tunebûna têkiliyan.” Ji bilî jinê, helbet namûs tê wateya taybetmendiyên baş, ên weke durustî, bawerî, alîkarî, prensîbên baş û hwd. jî.²³⁵

Dikare bê gotin ku ji ber du sedeman, namûs di çanda kurdan de bûye fenomen. Yek jê ji ber fonksiyona wê ya civakî û ya din hebûna wê ya di dîn de. Herweha vêya di çandên din de, bi taybetî çandên Cîhana Sêyem de jî heye. Îro di nav kurdan de berî her

²³² Celadet Alî Bedirxan, *ferheng*. r. 209

²³³ Ferhenga Kamêran, *Kurdî-Kurdî*

²³⁴ Malmîsanij, *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

²³⁵ Malmîsanij, *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

tiştî jin namûsê sembolîze dike. Lê divê neyê ji bîra kirin ku di navbera jina zewicî û ya nezewicî, ango keçan de cudahiyên mezin hene. Li gorî jina zewicî, li hemberî keçê tolerans bêtir e. Di derbarê têkiliyên keç û xortan gotineke wiha heye; “têkiliyên keç û xortan ji dema Mûhemed û heta nûha, hertim hebûye, lewma jî asayî ye.”²³⁶

Ji ber ku piraniya kurdan musulman in, hêja ye mirov di dînê îslamê de jî li têgeha *namûsê* binêre. Li gorî Îslam Ansiklopedisi, di Kur’anê de gotina *namûsê* derbas nabe. Lê weke ku Malmîsanij jî destnîşan dike, gotina *namûs* bi koka xwe ji gotina grêkî *nomos* ketiye zimanê erebî û tê wateya qanûnê. Lê di hin çavkaniyên erebî de tê ragihandin ku *namûs* bi eslê xwe ji navê *nems* tê. *Nems* tê wateya “hevpariya razan; derên ku hîle, xefik û delevere lê tèn veşartin.” Ji hevpariya razên bixêr *namûs* tê gotin û ji hevpariya razên xerab re jî *casus* tê gotin.²³⁷

3.2. Kuştina Namûsî li Gel Kurdan

Têgeha ku swêdî jê re dibêjin “hedersmord”, zimanzanên kurd radigihînin ku di zimanê kurdî de tune ye. Herweha naveroka wê ya ku keça malbatê ji ber sedemên têkiliyên wê yên bi xortan re ji aliyê malbatê ve tê kuştin jî di çanda kurdan de tune ye.²³⁸ Herweha ev yek di çavkaniyên ku di derbarê çanda kurdan de hatine nivîsîn de jî ev yek tune ye. Di kurdî de têgehên weke *şeref*, *namûs* û *avrû* hene. Dibe vana hemû bi hevdû re jî werin bikaranîn, herweha bi tena serê xwe jî. A sisiyan, *avrû* jî di hundurê têgeha *namûsê* de ye. Mirov dikare ji vêya re bêje *xûrûr*, *xatir* û taybetmendiya baş. Lê kuştinên ji bo van nirxan jî naveroka “hedersmord” a swêdî nadin.²³⁹

Lêbelê çî îro di civaka kurdan de, çî jî di belgeyan de ku di derbarê *namûsê* de bahsa çanda kurdan a klasîk dikin, ji bo parastina *namûsê*, bahsa du cûreyên kuştinê tê kirin.

1 - Dema ku li Kurdistanê bahsa kuştina *namûsî* yan kuştina ji bo *namûsê* tê kirin, berî her tiştî kuştina *mêrekî* ku dest avêtibe yan jî tecawizî jinekê kiribe tê bîra

²³⁶ Malmîsanij , Bi telefonê hevpeyvîn, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

²³⁷ Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, Cild 32, r. 382, 2006, İstanbul.

²³⁸ Malmîsanij , Reşo Zîlan û Ferhad Şakelî, *Hevpeyvîn*.

²³⁹ Ferhad Şakelî, *Hevpeyvîn* li Zanîngeha Uppsalayê 06.05.2003

mirov.²⁴⁰ Di nav kurdan de li hemberî helwestên wanî, rêbazên pir hişk hene.²⁴¹ Malbata jinên ku pêrgî rewşên wanî tên, bi dijwarî tevdigere, kîn û dijminahî, herweha kuştina mêran dest pê dike û tolhildan bi salan dom dike.²⁴² Di bûyerên wanî de, jin nayên kuştin, ên ku tên kuştin, mêr in.²⁴³ Bi piranî di nav eşîrên kurdan de sedema nakokî û dijminahiyan, bûyerên wanî ne.²⁴⁴

Kuştinên ku ji bo namûsê pêk tên, bi piranî kuştinên wanî ne. Di bingeha kuştinên wanî de, armanc parastina namûs û şerefa jinê ye, lew namûs û şerefa jinê rolekî diyarker dilîze. Heger ku şeref û namûsa jinekê di meselê de be, rêbaz pir hişk in.²⁴⁵ Efsere îngîlîz William Ruppert Hay bûyereke bi vê rêbazê têkildar ku ew bixwe bûye şahid, wiha radigihîne:

“Di sala 1919an de li navçeya Ranyayê, bûyereke ku mêrek ji jinekê bêtir êşê dikşîne, pêk hat. Axayê eşîra Ako, Mamend Axa, bi xwişka Siwar Axayê Pîran re zewicî. Şik hebûn ku pismamê Mamend Axa, yê bi navê Silêman Axa ji vê jinê hez dikir. Ji ber vê yekê pişt re Mamend Axa û lawê Şêx Axa, bi Silêman Axa re dikevin rêya Bitwênê û diherin. Dema ku Silêman Axa li pêşiya Mamend Axa dimeşe, Mamend Axa bi çeka xwe bera wî dide, dikuje û laşê wî dike weke seradê.”²⁴⁶

Bûyerên bi vî awayî çawa di nav eşîrên kurdan de bûye sedema kuştina gelek mêran, heman bûyer di navbera kurdan û dewletê de jî bûye sedema destpêka komkujiyan. Weke mînak qetlîama Dêrsimê bi berteka li hemberî destavêtina jineke kurd dest pê kiriye.

Di Adara 1937an de mufrezeyeke leşker diherin gundê Ûhûndû ku ji çend malan pêk tê. Leşker betilî û birçî ne. Mihemed Elî ku pêşkêşekî gund e, vê mufrezeya leşker ku bi serdariya efserekî ciwan e, vedixwîne malê. Du birayên Mihemed Elî û jina wî

²⁴⁰ Reşo Zîlan, *Hevpeyvîn*, li Zanîngeha Uppsalayê 15.05.2003

²⁴¹ Barbro Karabuda, *Öster om Eufrat – i kurdernas land*, wer. Salih Karaaslan r. 65

²⁴² Kovara *Rojî Kurd*, Hejmar 4 / r. 105

²⁴³ Reşo Zîlan, *Hevpeyvîn*, li Zanîngeha Uppsalayê 15.05.2003

²⁴⁴ Kovara *Rojî Kurd*, Hejmar 4 / r. 105

²⁴⁵ William Rupert Hay, *Kürdistan'da İki Yıl, 1918-1920*, r. 75

²⁴⁶ William Rupert Hay, *Kürdistan'da İki Yıl, 1918-1920*, r. 75

Fatma xanima ciwan û bedew, li gorî çanda kurdan ji bo mêvanan dest bi çêkirina xwarinê dikin.²⁴⁷

Efserê ku li odê rûniştî ye, radibe ser xwe, nahêle xwediyê malê bi wî re derkeve û bi tena serê xwe derdikeve derve. Piştî bîstekê jina Mihemed Elî bi qîrîn û dengê bilind alîkariyê dixwaze. Dema ku Mihemed Elî derdikeve derve, dibîne ku wî efserî jina wî avêtiye erdê û hewl dide ku tecawizî wê bike. Wê gavê Mihemed Elî bi tivinga destê xwe, wî efserî dikuje. Pişt re gundî li wan leşkeran dicivin hinan dikujin, çend heb jî direvin xwe xelas dikin.²⁴⁸

Pişt re dewlet daxwaza teslîmkirina Mihemed Elî û birayên wî dike. Lê Seyîd Riza weke serokê Dêrsimê ji rayedarên dewletê re dibêje ev mesele, meseleya namûsê ye, di çanda me de, em kesên ku namûsa xwe parastine, teslîmî yên hember nakin. Li ser vê yekê dewlet bi hêzên giran êrîşî Dêrsimê dike û komkujiya ku bahsa kuştina 70 hezar kurdî dibe, pêk tîne.²⁴⁹

Di civaka kurdan de, mêrên ku ji ber sedemên wanî bi destên jinan bixwe hatine kuştin jî hene. Ronakbîrê îngîlîz Claudius James Rich radigihîne ku keçeke ji eşîra Bulbassî, tirkekî ku êrîşî wê kiriye û xwestiye tecawizî wê bike, bi singûyê kuştiye.²⁵⁰ Bûyereke din ku dişibe vê bûyerê, wiha pêk hatiye:

“Jineke kurd bi xizmetkarekî xwe re ji mala bavê xwe vedigere tê malê. Mala bavê wê biqasî qonaxa rojekê dûrî mala wê ye. Lê xizmetkarê wê, ji bo ku şev têkeve ser wan, wê jinê di rêyeke xerab re ku eşqiya lê hene dibe. Dema ku dibe şev diherin li xanekê dimînin. Jinê nêta xizmetkarê xwe fêm kiriye. Bi şev xizmetkarê wê tê da ku niyeta xwe yî kirêt pêk bîne. Ew jin kêra di destê xwe de li wî dixê û wî dikuje. Serê sibê dema ku mêrê wê tê, bûyerê ji mêrê xwe re dibêje. Mêrê wê, wê dibe û diherin malê.”²⁵¹

²⁴⁷ Ahmet Kahraman, *Kürt İsyamları*, r.275

²⁴⁸ Ahmet Kahraman, *Kürt İsyamları*, r. 267

²⁴⁹ Ahmet Kahraman, *Kürt İsyamları*, r. 389

²⁵⁰ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 132

²⁵¹ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 132

Helbet di bûyerên wanî de, hin caran di derbarê sûcê mêrên wanî de, biryara jinê jî rolekî girîng dilîze. Rojekê yekî biyanî dihere malekê, mêrê malê ne li malê ye, jin bi tenê li malê ye. Jin li gorî adetên kurdan mazûbantiyê dike, xwarinê ji mêvanê ku li hewşê li bin darê rûniştiye re dibe. Piştî ku mêvan xwarina xwe dixwe, dikeve hewldanê ku dest bavê wê jinê. Jina ciwan û bihêz wî digire û bi darê ve girê dide. Dema ku mêrê wê tê, jin sedema girêdana wî mêrî ji mêrê xwe re dibêje û girêdana wî ya temama rojê weke kişandina cezayê qebûl dike û ji mêrê xwe daxwaza efûya wî dike. Mêrê wê pêşniyaza wê qebûl dike, wî efû dikin û serbest berdidin.²⁵²

2 - Cûreyekî din ê kuştina namûsî yan kuştina ji bo namûsê; dema ku jineke zewicî bi mêrekî re têkeve têkiliyeke evînî yan zayendî, pêk tê. Di bûyerên wanî de, hem ew jin û hem jî mêrê ku bi wê re ketiye têkiliyê, ji aliyê mêrê jinê ve tên kuştin.²⁵³ Ev jin û mêr di kîjan statuyê de be bila bibe, teqez herdu jî tên kuştin.²⁵⁴ Lê di nav kurdan de jinên zewicî ku bi hin mêrên din re dikevin têkiliyê, pir kêman in. Lewma kuştinên jinên bi vî awayî jî pir kêman in.²⁵⁵

Kêmbûna têkiliyên jinan ên bi vî awayî, di arşîvên ku lêkolînerên Sowyetê di derbarê jinên kurd de nivîsîne de tên destnîşankirin. Tê gotin ku jina kurd bi sêdaqat û namûsa xwe balê dikşîne, herweha di mijarên exlaqî de, di ser mêran re ne. Di vî xalê de, li gel jinên ku bi evînî zewicîne, bi taybetî bahsa sêdaqeta jinên ku bê evînî zewicîne tê kirin.²⁵⁶

Lêkolînera îngîlîz, Lucy Garnett bahsa çend bûyerên ku jin û mêr herdu tên kuştin, dike. Dibêje: “Kurdekî ku li Bexdayê serleşker e, li jina xwe dikeve şikê ku hevlekî wê heye. Lewma rojekê bi dizî tê malê, dibîne ku dostikê jina wî di cem wê de ye. Ev leşker çeka xwe dikîşîne û herduyan bi ser hevdû de dikuje.”²⁵⁷ Bûyereke din jî

²⁵² Kovara *Jîn*, Cild III r. 632

²⁵³ Mela Mahmûdê Bazidî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* r. 75

²⁵⁴ William Rupert Hay, *Kürdistan'da İki Yıl, 1918-1920*, r. 75

²⁵⁵ E. W. Charles Noel, *Kurdistan 1919*, r. 26

²⁵⁶ N. A. Smirnov vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 222

²⁵⁷ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 131

wiha pêk hatiye. Xortikekî panzde salî, ku bavê wî ji ber dijminahiya xwîniyê demekê ne li malê ye, jinbava xwe û dostikê wê bi ser hevdû de dikuje.²⁵⁸

3.3. Di Nav Kurdan de “Fûhûş”

Têgeha ku bi tirkî *fûhûş* û bi swêdî *prostitution* jê re tê gotin, weke têgeh di tu çavkaniyan de yên ku di derbarê jinên kurd û têkiliyên wan ên zayendî de hatine nivîsîn, nayê dîtin. Ji ber ku di nav kurdan de *fûhûş* weke karekî peyde nebûye, di kurdî de jî *fûhûş* weke têgeh tune ye.²⁵⁹ Herweha ji ber tunebûna vî karî, di kurdî de têgeha *fahîşe*, ango navê jinên ku vî karî dikin jî tune ye.²⁶⁰

Lêbelê di nav kurdan de, li herêmên rojhilat, ên nêzîkî farisan, bi awayekî sergirtî gotinên farisî, li herêmên rojava yên nêzîkî tirkan bi gotinên tirkî, li herêmên bakur ên nêzîkî rûsan, bi gotinên rûsî û li herêmên başûr ên nêzîkî ereban jî bi gotinên erebî tê îfadekirin.²⁶¹

Di nav kurdan de têgeha “fûhûş” û “orospû” li bajaran tenê tê fêmkirin. Di nav kurdên de yên ku li gundan dijî, zinê, ji ber sedemên kevneşopî û mantiqî weke eybeke pir xerab tê dîtin û bi kuştinê tê cezakirin.²⁶² Çi ji ber sêdaqeta jinên kurd bi mêrê wan re, çi jî ji ber rêbazên hişk, mirov dikare bibêje di nav kurdan de zinê tune ye.²⁶³

Di rapora Şoreşa Sowyetê de jî, di derbarê fûhûşê de tê ragihandin ku civaka kurdan di asteke wiha de ye ku mirov dikare bibêje di nav kurdan de jinên ku fûhûşê dikin hema hema tune ne.²⁶⁴ Sedemên tunebûna fûhûşê ew e ku kurd di temenekî biçûk de dizewicin, ev yek jî dibe sedem ku di nav kurdan de fahîşetî pêk nayê.²⁶⁵

²⁵⁸ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 131

²⁵⁹ Claudius James Rich vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 33

²⁶⁰ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 131

²⁶¹ E. W. Charles Noel, *Kurdistan 1919*, r. 26

²⁶² E. B. Soane, *Mezopotamya'ya ve Kürdistan'a Gizli Yolculuk*, rûpel 407

²⁶³ Thomas Bois vgz. Mehmet Bayrak, *Gelmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 313

²⁶⁴ Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 222

²⁶⁵ Mehmet Bayrak, *Gelmişten Günümüze Kürt Kadını*, r. 311

BEŞ IV

NIRXANDIN

Di navbera têgeha namûsê ku swêdî weke îtîbar, rûmet, hurmet, rêzgirtin, rutbe û asta civakî, ya herî girîng weke durustiya şexsî²⁶⁶ dibînin û li cem kurdan ku weke rûmet û şerefa ku li pê navê pak digehê mirov²⁶⁷, tiştê herî pîroz li cem mirov, wek welat, ax, jin, hwd.²⁶⁸ tê qebûlkirin, cudahiyên girîng hene.

Cudahiya yekem, bi tevahî di çanda biyanîyên Rojhilata Navîn de, bi taybetî di çanda kurdan de, di bingeha nîrxên namûsê de, berpirsiyariya şexs aa li hemberî civakê heye. Di vê tîkiliyê de civak rolekî diyarker dilîze, tevgerên namûsê bêtir li gorî nêrîna derûdorê pêk tên. Lew civak, berî şexs tê, jiyan ne li gorî rêbazên şexsî, lê li gorî rêbazên kollektîfî dimeşe. Lê di çandên Ewrûpa, bi taybetî di çanda swêdiyan de, şexs ji peywendiyên xwe û civakê bêtir, bi ûjdan û rêbazên xwe yê şexsî tîkildar e. Ne ku li hemberî civakê, lê li hemberî rêbazên şexsê xwe berpirsiyar e. Lewma ji civakê bêtir, pîvan û rêbazên şexsî di meseleyên namûsê de rolê dilîze. Lew şexs berî civakê tê û jiyan ji rêbazên civakê bêtir, li gorî rêbazên tekakesî dimeşe.

Cudahiya duyem, ji bo kurdan di nav nîrxên namûsê de hebûna jinan, ji bo swêdiyan tunebûna jinan e. Swêdî, jinan bi tu awayî bi namûsê re tîkildar nabînin. Li gorî ku kurd namûsê weke parastina nîrxên herî pîroz dibînin û jinan jî di nav van nîrxên herî pîroz de dihesibînin, mirov dikare bigihêje fikra ku jin li gel kurdan pîroz tên dîtin.

Ne tenê bi gotin, mirov vê yekê di jiyanê de jî dibîne. Destnedayîna jinan ku gelek alim, lêkolîner û seyahên biyanî bi baldarî bahs kirine, vê yekê diçespîne. Ji ber vê taybetmendiyê, di şerên navbera eşîran de, jinan bêyî ku tu kes zerarê bidê, bi hêsanî lazimiyên kesên ku şer dikin, temîn kiriye. Herweha çûn û hatina wê ya bajêr bi hêsanî, li bajêr kirîn û firotina tiştan û hwd. hemû encamên destnedayîna wê ne. Ew kesên ku vê destnedayîne îhlal bikin û bi awayekî heqaretê lê bikin weke “kesên bênamûs” tên

²⁶⁶ <http://g3.spraakdata.gu.se/saob/> (12 Gulan 2013)

²⁶⁷ Celadet Alî Bedirxan, *ferheng*. r. 209

²⁶⁸ Ferhenga Kamêran, *Kurdî-Kurdî*

binavkirin û ev îhlal dibe sedema pirsgirêk û şerên giran. Heta îro jî ev nirx din av kurdan de bi awayekî berbiçav dimeşe.

Di dîroka kurdan de gelek şerên giran ji ber destnedayîna jinan dest dest pê kirine. Weke mînak, Nûrî Dêrsimî radigihîne ku li Dêrsimê, parastina jinekê li hemberî efserekî dewletê, bûye destpêka pêvajoya komkujiya Dêrsimê.²⁶⁹

Li gel ku îhlalkirina destnedayîna jinê dibe sedema bertekên mezin, jin bixwe di sekinandina şerên giran de jî dikarin rolên girîng bilîzin û pirsgirêkên giran çareser bikin. Dema ku jinek têkeve navbera eşîrên ku gelek mirov ji hevdû kuştine û destmala serê xwe veke û bavêje erdê, li gorî çanda kurdan, divê ew şer bisekine. Herweha heger ku berek jinekê bişîne cem bera din û daxwaza sekinandina şer bike, divê ew ber şer bisekinîne û li hevdû werin.

Ne tenê dema ku jin bi awayekî eşkere tevdigere, herweha hebûna jine bixwe jî, gelek caran di çareserîya pirsgirêkên civakî de rolê dilîze. Weke mînak dema ku Noelê îngîlîz li Mûsilê jinan dike şaredarên du şaredariyên ku bi hevdû re di nakokiyên de ne, yekser tevliheviyên wan şaredariyan çareser dibin û gel li hevdû rûdinê. Helbet di vê xalê de, faktora ku rol dilîze ne jiyana jinê ya zayendî ye, weke mirov statuya wê ya civakî ye.

Lê weke ku em di vê lêkolînê de jî dibînin, swêdî di çanda biyaniyan de, bi taybetî di çanda kurdan de namûsê bi zayendiya jinan tenê ve girê didin. Heta di nav jinan de, bi jiyana zayendî ya keça malbatê tenê ve girê didin. Lêbelê li gorî tiştên ku bi sedsalan berê di derbarê vê xalê de hatine nivîsîn û hevpeyvînên ku rewşa îro diyar dikin, li gel ku jin bi zayendiya xwe di namûsê de cî digire jî, kuştina keça azîb di vî dîmenê de nayê dîtin.

Herweha çî di belgeyên kevn de, çî jî di agahiyên niha de, dema ku bahsa kuştina namûsî tê kirin, bêtir bahsa kuştina mêrên ku dest davên jinekê, qîzekê yan jî dikevin hewldana tecawîza wan, tê kirin. Herweha heger ku jineke zewicî jî bi mêrekî re têkeve têkiliyeke evînî yan zayendî, ew jin û ew mêr jî tînin kuştin. Lê kuştinên jinên bi

²⁶⁹ Nuri Dersimi, *Kurdistan Tarihinde Dersim*. r. 82

vî awayî kê m in, lewre tê ragihandin ku di nav kurdan de, jinên zewicî bi tevahî bi kesên din re nakevin têkiliyên nemeşrû.

Li gel ku swêdî têkiliyên evînî yên keça azib weke sedema kuştina wê dibînin, em dibînin di civaka kurdan a klasîk de jî, evîndarî û têkiliyên keç û xortan, rewşeke asayî ye. Helbet têkiliyên keç û xortên kurd, ji ber sîstema civaka klasîk, biqasî keç û xortên swêdî ne azad e, lê belê kuştina keçan ji ber têkiliyên wan ên evînî nehatiye dîtin. Tunebûna kuştina keçan ji ber sedemên evînî, ji berhemên ku gelek sal berê hatine nivîsîn, tê fêmkirin. Kamûran Bedirxan ku dibêje keç û xort di kêf û şahiyên de, li bexçeyan di bin rohnîya heyvê de hevdû dibînin, soz û peymanan didin hev, Mela Mahmûdê Bazidî ku dibêje di nav kurdan keçrevandin ne eyb e, vê rewşê eşkere dike.

Heger ku jinên kurdan bi qasî mêran ne azad bin jî, ji aliyê kesên biyanî ve tê ragihandin ku jinên kurd, ji jinên gelên cîran azadtir in. Di malbatê de xwediyê gotinê ne, di biryarên malbatî de cî digirin, bi hêsanî mêvanan pêşwazî dikin, heta gelek jinan desthilatdariya civakê kiriye û gelek ji wan li gel mêran beşdarî şeran bûne. Bi taybetî, kesên biyanî yên ku li ser jinên kurdan nivîsîne, bahsa rêzgirtin û destnedayîna wan kirine.

Li gel ku jin di çanda kurdan de xwediyê vê statuyê ne, swêdî wan di meseleyên namûsê tenê de dibînin û zayendiya wê weke objeyekî xeter ku dibe sedema kuştina wê, dinirxînin. A herî seyr ew ku di nav jinan de jî keçên azib weke sembola vê zayendiyê dinirxînin.

Di vê dema ku asta şaristaniyê de ku hewqasî pêş ve ketiye, têkiliyên civakî hewqasî bêtir bûne, bêgûman têkiliyên keç û xortan jî bêtir bûne. Bi taybetî li welatekî weke Swêdê ku azadiya şexsan hewqasî pir e û têkiliyên civakî hêsan e, îdîaya ku Astrid Scyltter dike û dibêje dibe ku peyva keç û xortan bi hevdû re bibe sedema kuştina keçan, dûrî rastiyê ye. Lew li hewşa Zanîngeha Stockholmê, ku Astrid Scyltter bixwe lê kar dike, keç û xortên xwendekar ên kurdan bi hêsanî bi hevdû re dipeyivin, hevaltîyê dikin û têkiliyên evînî jî dijîn.

4.1. “Hedersmord” Paradigmayek e

Fikrên ku di derbarê “hedersmord”ê de tên gotin û nîqaşên ku tên kirin, teoriya zanistê emerîkî Thomas Kuhn ku jê re dibêje *paradigma*, tîne bîra mirov. Li gorî Kuhn, hin caran di mijarê de berî ku teorî were avakirin, fikra teorîsyen heye û teoriya wî hazir e. Dema ku ji bo çespendina vê teoriyê li delîlan digere, bêyî ku di ferqiyê de be, delîlên ku li teoriya wî tên ber hev dike û teoriya xwe ji van delîlan ava dike. Kuhn vê yekê weke *paradigma* bi nav dike. Lê delîlên ku li teoriya wî nayên, an ên li dijî teoriya wî jî hin caran derdikevin holê. Dibe ku teorîsyen van delîlan nabîne, yan jî bi zanebûn xwe ji wan bi dûr bixe, çavên xwe ji wan re bigire. Kuhn delîlên bi vî awayî jî weke *anomalî* bi nav dike.²⁷⁰

Çi ji aliyê kesên ji rêzê ve, çî jî ji aliyê ronakbîr û akademîsyenan ve, têgeha “hedersmord”ê bi helwesteke rexnegirî, nehatiye nixandî. Argûmanên ku ji aliyê derûdorên ronakbîr û akademîsyen bixwe ve tên gotin, bi qasî ku tê dîtin, ne li ser rastî yan çewtiya “hedersmord”ê ye. Ango ew jî vê têgehê bînîqaş dipejirînin û heger ku rexneyeke wan hebe, bêtir li ser şert û mercên ku li gorî wan dibin sedemê “hedersmord”ê, disekin.

Herweha nêrîna parlamentoya Swêdê jî ji vê nêrînê ne cuda ye. Mirov vê yekê ji dayîna mafê axaftinê ji bo Fadîmeyê li parlamentoyê, fêhm dike. Îro li Swêdê zêdeyî sed hezar kurd hene. Dema ku kurd di qatliamên dîrokî re jî derbas bûn, kurd li swêdê hebûn. Kurdan li gorî qanûn û rêbazên wan komele ava kirine û bi awayekî demokratîk kar û xebatên xwe dikin. Kurd di hewldanê de ne ku bi rêyên meşrû dengê xwe bi cîhanê ragihînin. Lê balkêş e ku parlamentoya Swêdê, mafê axaftina ku da Fadîmeyê ku ji aliyê bav û birayê xwe ve dihat tehdît kirin, nedaye kurdên ku di qatliaman re derbas dibin. Dîsa hewqasî balkêş e ku di derbarê îddîayên wê de rexne yan fikrên cuda nehatine gotin.

Li welatekî, saziya herî meşrû parlamento ye. Ji ber ku endamên vê saziyê bi rêya hilbijartinan tên hilbijartin û gel destûra ku ew temsîla vî gelî bikin, dide wan. Parlamento di avakirina fikir û çanda gelekî de rola diyarker dilîze, herweha li ser

²⁷⁰ Torsten Thurén, *Vetenskapsteori för nybörjare*, r.74

qedera gelekî biryaran dide, qanûn û fermanan derdixe. Lewma mirov dikare fikra parlamentoya Swêdê weke fikra gelê swêdî jî binirxîne.

Loma “hedersmord”a ku ronakbîr, akademîsyen, herweha parlamento jî dipejirîne, mirov dikare weke paradigmayekê binirxîne.

Lêbelê li gorî nêrînên pisporên ku me bi wan re hevpeyvîn kirine û tiştên ku bi sedsalan berê di derbarê çanda kurdan de hatine nivîsîn, kuştina keça azib ji bo têkiliyên wê yên evînî di nav kurdan de pêk nayê. Mele Mahmûdê Bazidî berî niha bi sed û pêncî salî gotiye di nav kurdan de keç revandin ne eyb e, John Edmonds û gelekên din bahsa romantîzma revandina ku li hin herêmên Kurdistanê bûye adet, dike, Kamûran Bedirxan li nav bexçeyan, li kêf û şahiyên bahsa hevdiştinên keç û xortan dike û bi gelek awayên din ku di çanda kurdan de têkiliyên evînî di nav keç û xortan de rewşeke asayî ye, tê vegotin. Herweha tê gotin ku di revandinê de jî diya keçê bixwe alîkariya revandinê dike lew dizane ku mesele bê pirsgirêk tê çareserkin.

Swêdî çawa bahsa kuştina mêrê ku dest davêje jinekê nakin, bahsa jina zewicî ku bi mêrekî re têkeve têkiliyê û ew jin û mêr werin kuştin jî nakin. Ji ber ku ev rêbaz, li paradîgma ku wan afirandiye nayê, lewma mirov dikare vê yekê weke anomaliyekê binirxîne.

Bûyerên ku dibin sedema kuştina mêran, ne tenê di civaka klasîk de, heta îro jî pêk tên. Bûyereke bi vî rengî di 1993an de li navçeyê Mêrdînê pêk hat.²⁷¹ Ji bo ku xortek tecawizî jinekê dike, yan jî dest davêje wê, bavê wî xortî wî dikuje. Di nav gel de motivê vê kuştinê diyar e. Wî xortî bi wê helwestê hem ew jin, hem malbata wê û hem jî malbata xwe gemarî kiriye. Piştî ku mesele hat bihîstin û pê ve, heger ku bavê wî ew nekuşt, wê di nav herdû malbatan de pirsgirêkên cidî derketa, îhtîmaleke mezin, wê dijminahiyê dest pê bikira û bibûya sedema kuştina gelek mirovên din. Lê piştî ku bavê wî, wî dikuje, êdî mesele tê çareserkin û ji ber vê bûyerê tu nexweşiyên din pêk nayên. Di vê bûyerê de tiştê balkêş ew e ku tu kesî, ew zerara ku swêdî îddîa dikin, nedaye wê jinê.

²⁷¹ Ji ber hesasiyeta mijarê navê wê navçeyê nanivîsim.

Faktora ku bûye sedema destpêka pêvajoya Qetlîama Dersimê û bi hezaran kurd hatine kuştin jî, parastina jinê bû. Bêgûman di bingeha helwesta ku mirov di jiyana xwe dibuhure lê di destnedayîn û parastina jinê nabuhure, nirxekî çandî ye.

Swêdiyên ku hewqasî qîmet didin Fadîme û gotinên wê, li gel ku zêdeyî sed hezar kurd li welatê wan dijîn, entegrasyona pêneran bi civaka xwe re weke karekî sereke dibînin û bi gelek awayan ji bo vê yekê dixebitin, ne mumkun e ku hayê wan ji vê statuya jinê ya di çanda kurdan de tune be. Lê ji ber ku ev xal weke anomaliyekê li fikrên wan nayê, dibe sedema hilweşîna teoriya wan, mirov dikare bigihê fikra ku hayê wan ji vê yekê heye lê ji ber ku dijî teoriya wan e, guhê xwe nadinê.

Helbet ne ku nêrîna wan di mijara “hedersmord”ê tenê de paradigmatîk e, bi tevahî nêrîna wan a li jinên kurdan û statuya wê paradigmatîk e. Dema ku bahsa çanda kurdan dikin, bahsa rêzgirtin û destnedayîna jinan nakin. Bi tu awayî, bahsa rola jina kurd dema bi vekirina serê xwe di navbera eşîran de şerên dijwar disekinîne, nakin. A herî balkêş ew e ku helwestên keçekê ji bo azadiyê, weke sedema kuştina namûsî dibînin. Lê di vê xalê de jî, çî li Kurdistanê çî jî li Swêdê hejmara keçekên kurd ên ku li zanîngehan dixwînin, ên ku di partiyên siyasî, komele, sazî û aktîvîteyên cuda de cî digirin anomaliyên ku li paradigma wan nayên bixwe ne.

4.1.1. Rewşa Fadîme Paradigmatîk e

Rewşa Fadîme Şahîndal ku bû sedema destpêkirina nîqaşa “hedersmord”ê, bixwe jî paradigmatîk e. Lew li gorî agahiyên ku çend caran bi awayekî îstîsnayî di hin rojname û televîzyonan de derketine, herweha li gorî agahiyên li derveyî çapemeniyê, rewşa Fadîme Şahîndal ne weke çapemeniyê bû ku dihate gotin.

Piştî kuştina Fadîme bi deh rojan xwişkê wê ya mezin cara yekem derket televîzyona TV4ê, bi awayekî zindî hevpeyvînek pê re hat kirin. Vê xwişkê tiştên ku heta niha di çapemeniya Swêdê de nehatine bahskirin got û ji ber ku çapemeniyê di vê mijarê de fikrên wan nepirsîye, çapemenî şermezar kir. Wiha got:

“Medya, hemû sazî û herkes li aliyê Fadîme bûn. Fadîme ji bo xwe mafdar derxe her tişt digot. Lê di derbarê van îddîayan de tu kesî li fikra me nepirsî. Ez bixwe di heman malbatê de, bi heman çandê mezin bûme, lê ew malbat û çanda

*ku Fadîme bahs dikir ez nas nakim. Fadîme dibêje malbatê nedihîşt em, ango zarokên keç bixwînin, lê ev ne rast e. Dê û bavên me ji bo xwendinê di navbera keç û kuran de tu cudahî nedikir, çî ji destê wan dihat ji me re dikirin. Ji ber ku derfetên wan bi xwe, yê xwendinê tunebû dixwestin em bixwînin.*²⁷²

Li gel ku dergîstiyê Fadîme weke xortekî swêdî dihat didan nasandin, ew xort xwerû ne swêdî bû. Bavê wî ji Îranê û faris bû, diya wî jî swêdî bû. Di destpêkê de bavê Fadîme zewaca wan qebûl nekiriye, lê pişt re li ser daxwaz û israran qebûl kiriye, heta ji bo daweta wan li Uppsala salonek jî kirê kiriye. Lê di derbarê tarîxa dawetê de, di navbera Fadîme û bavê wê de nîqaş derdikeve, her ku dihere ev nîqaş dijwar dibe. Di heman demê de xwişkeke Fadîme ku bi çar salan jê biçûktir e dest bi bikaranîna narkotîkan dike, ji malê direve, pişt re nexweş dikeve û dikeve nexweşxaneyê. Malbat Fadîme ji ber vê yekê berpirsiyar digire.²⁷³ Xwişka Fadîme ya jê mezintir, piştî kuştina Fadîmeyê bi sê rojan, teyîd kir ku ev xwişka wan bi mêrekî swêdî re bêzewac dijî.²⁷⁴

Lê balkêş e, li gel ku ev xwişk bêzewac bi yekî swêdî re jî dijî, weke Fadîme pîrsgirêkên wê yê cidî bi malbatê re rûnedane. Dîsa hewqasî balkeş e ku jiyana vê keçê bi mêrê swêdî re bi tu awayî di medya û van nîqaşan de nehatiye bahskirin. Carekê tenê dema ku piştî kuştina Fadîme îfadeya wê li dadgehê hat girtin, rojnameya Expressen ev yek weke nûçe ragihand. Li gel ku bersiv neda pirsên rojnamevanan jî, medya îfadeya wê bi awayekî prowakatîf ragihand. Rojnameya Expressen wanî dibêje:

*“Xwişka Fadîme ya biçûk serî ji tehdîtan re dananî û bi helwesteke di cihanê de herî têgihîştî, li hemberî çavên hemû Uppsalayîyan, bi cesareteke qahremanî ku xwişka xwe Fadîme tanî bîra mirov, şahidî kir. Di nav hemû xizmên Fadîme de, ya ku cesaret kir şahidîyê li hemberî Rahmi Şahindal bike, xwişka Fadîme ya biçûk tenê bû.”*²⁷⁵

Keça xaltîka Fadîmeyê, di derbarê derûdora Fadîme de agahiyên hîn balkêştir dide. Ji bilî mirina dergîstiyê Fadîme ku di qezeya trafîkê de mir, bahsa mirina çend

²⁷² Dan Josefsson, TV4, *Media Magasinet*, 14 adar, 2002

²⁷³ Keça xaltîka Fadîme, *sohbeteke şexsî*. 25.03.2002

²⁷⁴ Rojnameya *Aftonbladet* 13.03.2002

²⁷⁵ Rojnameya *Expressen* 13.03.2002

hevalên wê yên din ku nêzîkî wê ne, dike. Yek jê ji ber ku narkotîk zêde bikar aniye miriye, yekî din ji ber ku zêde gaz kişandiye, yekî din xwe daliqandiye û yê çaran ji ber ku bi serxweşî erebe ajotiye, qeza kiriye û miriye.²⁷⁶

Ji bilî mirina dergîstiyê wê ku di qezeya trafikê de miriye, ne di çapemeniyê de ne jî di nîqaşan de, bi tu awayî bahsa mirina van hevalên wê nehatiye kirin. Helbet mirov nikare mirina van kesan teqez bi temama mijarê ve girê bide. Lê li hemberî kesayetiya Fadîme ku çapemeniyê bi awayekî bêqisûr radigihand, ev agahî hin fikir dide mirovan.

Di çapemenî û van nîqaşan de Fadîme weke keçeke kurd dihat nîşandan. Her çiqas Fadîme bi eslê xwe kurd be jî, bi kurdî nizanîbû, bi malbata xwe re bi tirkî dipeyivî. Fadîme di pênc saliya xwe de çûye Swêdê, li wê derê mezin bûye, li dibistanên swêdî xwendiyê, hevalên wê swêdî bûne û têkiliya wê bi çanda kurdan re çê nebûye. Herweha di kar û barê sazî, partî û komeleyên kurdan de jî peyde nebûye. Gelo mirov keçeke bi vî awayî çawa dikare weke keçeke kurd û temsîlkara çanda kurdan qebûl bike û di ser îddîa û şêwaza jiyana wê re çanda kurdan binirxîne?

Dema ku cara yekem Fadîme di çapemeniyê de xuya bû û bahsa pirsgerêkên xwe dikir, xwendekarên kurd li temama zanîngehên Kurdistanê û Tirkiyeyê dest bi kampanyaya daxwaza zimanê kurdî ya li dibistanan kiribûn. Li Swêdê piraniya xwendekarên kurd jî li hevdû pirsîn û ji bo ku piştgiriya xwendekarên welêt bikin, Komeleya Xwendekarên Kurd ava kirin. Navenda vê komeleyê li zanîngeha Mitthögskolan, li bajarê Sundsvälê bû ku Fadîme jî li wê zanîngehê dixwend. Li wê zanîngehê biqasî bîst xwendekarên kurd hebûn û hemû jî endamê vê komeleyê bûn û di kar û xebatên wê de çalak bûn. Herweha ji bo piştgirî, kar û xebatê pêşniyaz birine ji Fadîme re jî, lê Fadîme pêşniyaza wan red kiriye, herweha di warê civakî de jî bi tu kesan ji wan re têkilî dananiye. Bi awayekî ku êdî silabê jî li wan neke, ji wan bidûr ketiye.²⁷⁷

²⁷⁶ Keça xaltîka Fadîme, *sohbeteke şexsî*. 25.03.2002

²⁷⁷ Kadir Tosun, *Serokê Komeleya Akademîsyenên Kurd*. 28.05.2003

Çi li Uppsala, bajarê ku Fadîme lê mezin bûbû, çi jî li bajarên sereke yên Swêdê têkiliyên vê komeleyê bi komele û saziyên çandî û siyasî re hebûn. Di van komele û saziyan de ku bi taybetî ji bo keç û xortên kurd li ser ziman û pirsgirêkên çandî û civakî xebat dihatin kirin, piştî ku Fadîme bi nav û deng bû, têkiliyên Fadîme bi van saziyan re çê nebûye. Herweha tê ragihandin ku şahî û pîrozbahiyên kurdan ên weke newrozê ku bi deh hezaran kurd beşdar dibin, Fadîme beşdar nedibû.²⁷⁸

Di derbarê dîne Fadîme de jî nêrînên swêdiyan bi pirsgirêk in. Her çiqas ew weke misulman dihat nasandin jî, malbata wê ne misulman e, elewî ye. Herweha têkiliya Fadîme bixwe bi tu dînan re tune bû. Tê zanîn ku îbadetên elewîtiyê bi awayekî berbiçav ji yên misulmantiyê cuda ne. Nêrînên ku elewîtiyê weke dînekî serbixwe dibînin li aliyekî, kesên elewî bi rêbazên misulmantiyê nîrxandinên li ser xwe qebûl nakin.²⁷⁹

Lê gelo çima bavê Fadîme ew kuşt?

Apê Fadîme bersiva vê pirsê dide û di derbarê rola medya de wiha dibêje:

“Medyayê bixwe Fadîme kuşt. Li gel ku medya ew weke keçeke bihêz, bibiryar, jîr û têkoşer nîşandida, di eslê xwe de Fadîme ne wisa bû. Fadîme keçeke nezan, qels saf bû ku li gorî daxwaza medyayê tevdiageriya. Medyayê ew weke malzemeyekî bi kar tanî û mixabin ew jî ne di ferqîya vêya de bû, lewma ev yek bû sebaba mirina wê. Medya li gorî fikrên xwe yên hazir û bi hêza xwe ew bi kar anî, vê yekê jî bavê wê provake kir, lewma bavê wê ev bertek da. Dema bavê wê dît ku keça wî li hemberî kamerayan û di rojnameyan de bahsa evîn û jiyana xwe ya zayendî dike, bavê wê xwe kêmdît û hîn bêtir hêrs bû. Di heman demê de tu kesî fikra wî nepirsî. Wî xwe li hemberî medyayê û keça xwe neçar dît lewma bi vî awayî tevgeriya.”²⁸⁰

Dema ku mirov vê dîmenê û dîmena ku di çapemeniya Swêdê de hatiye nîşandan, dide ber hev, mirov dibîne ku ew dîmenê ku di çapemeniyê de hatiye

²⁷⁸ Kadir Tosun, serokê Komeleya Akademîsyenên Kurd. 28.05.2003

²⁷⁹ Reşo Zîlan, *Hevpeyvîn* li Zanîngeha Uppsalayê 15.05.2003

²⁸⁰ Rojnameya *Aftonbladet* 23.01.2002

nîşandayîn dîmenekî manîpulatîf e, lewma jî paradîgma ye. Jiyana xwişka Fadîme bi yekî swêdî re, mirinên balkêş ên hevalên wê, nêrîna malbata wê li perwerdeya keçan û hwd. weke anomaliyan in ku li vê paradîgmayê nayên. Heger ku bahsa vana hemûyan were kirin, bi taybetî dema ku jiyana xwişka wê ya bi mêrê swêdî re were bahskirin, eşkere ye ku wê ew paradîgmaya wan bi temamî hilweşe. Lew heger ku “hedersmord” helwesteke çandî be, bi fikra ku rêbazên çandî ji bo hemû endamên malbatê weke hev pêk tînin, divê “hedersmord” berî Fadîme ji bo xwişka Fadîme pêk hatibûya.

4.1.2. Bûyereke Zindî²⁸¹

Bûyereke ku bi karakterê xwe dişibe bûyera Fadîmeyê, berî bûyera Fadîme bi çend salan li Kurdistanê pêk hat, lê keça ku dijî daxwaza bavê xwe tevgeriya nehat kuştin. Ev bûyer, fikra Îsmail Beşikçi û pişporên din ku dibêjin dewlet bixwe di nav kurdan de fikir û bûyerên bi vî awayî teşwîk dike da ku bi hêsanî bikaribe kurdan kontrol bike, diçespîne.²⁸²

Kurdekî bi navê X ku pênc salên dibistana seretayî tenê xwendiyê û tu bingeha wî ya siyasî tune ye, bi piştgiriya dewletê, di salên 1990î de dibe şaredarê navçeya Y. X bixwe ji malbateke feodal e ku bi hemû taybetmendiyan patriarkal e. Temenê wî li dora 50 salî ye û du jinên wî hene. Temenê jina wî ya mezin biqasî temenê wî ye, jina wî ya biçûk jî 21 salî ye.

Malbata X weke mezinê eşîrê tê pejirandin. Di warê çandî, perwerdeyî, nêrînen siyasî û asta şaristaniyê de, mirov dikare civaka ku ew lê mezin bûye, bike du beş. Beşê ku li gel X cî digire, bi piranî kesên nexwendî ne û têkiliyan wan bi dewletê re baş in. Beşê din, bi piranî kesên xwendî û ronakbîr in, di kar û barên, netewî, siyasî û mafê mirovan de çalak in. Gelek ji van kesan ji ber fikir û xebatên xwe yên siyasî bi salan di hepsan de girtî mane û gelek ji wan hatine sirgûnkirin.

Li gorî îdîayên gelê navçeyê, di hîlbijartinên şaredariyê de X ji dewletê alîkarî wergirtiye, bi şeweyên tarî li navçeya xwe bûye şaredar. Di çar salên peywira xwe de, ji

²⁸¹ Ji ber hesasiyeta mijarê, min nav nedane.

²⁸² Îsmail Beşikçi, *Hevpeyvîn*, bi nameyekê 20.03.2003

berê pir bêtir dewlemend bûye, li Tirkiyeyê li bajarên cûrbecûr vîlla, erese û xanî kirine. Lê ji navçeya xwe re tu xizmet nekiriye.

Keça X a 24 salî û xortekî ku X qebûl nake ji hevdû hezkirin û hevdû revandin. Piştî du mehan polîsan ew keç li bajarekî Rojavayê Tirkiyeyê girt û anîn teslîmî X kir. Pişt re X ew keç bi yekî din re ku ew dixwaze, zewicand. Ev zewac heta îro jî dom dike.

Heger ku weke ku swêdî nîşan didin “hedersmord” di çanda kurdan de hebûya, têkiliyên keçê yên evînî bibûya sedema kuştinê, teqez X ê keça xwe bikušta. Lê li gel ku mirovekî hewqasî feodal, dûr û dijî jiyana modern û dûrî fikrên wekhevî û mafê mirovan e jî, dîsa keça xwe nekuşt. Di vê meseleyê de divê mirov ji bîra neke; heger ku wî keça xwe bikušta jî, mûhtemelen wî yê tu ceza jî negirta, lew ê ku bikaribe hêzên dewletê hewqasî têxe xizmeta xwe û piştî du mehan keça xwe ji bajarekî dûrdest vegeerîne, maqûl e ji xwe re çareyekê bibîne û tu ceza jî negire.

Gelê bajarê Y, stendina vê keçê ji dergîstiyê wê, weke neheqî dinirxînin û X jî weke mirovekî zulmkar dibînin. Gelek kes dibêjin “X bi vê helwestê di nav gel de qîmet û şerefa xwe bi temamî wenda kir.”

Xuya ye heger ku wî reva keça xwe qebûl kiribûya û li gorî rêbazên civakê daweya keça xwe û dergîstiyê wê çêkiribûya, wê gel ji niha bêtir qîmet bida wî. Ji wergirtina nirxên weke şeref û namûsê bêtir, xuya ye Ehmed bi vê helwestê xwestiye li hemberî gel hêza xwe nîşan bide.

Di vê bûyerê de sê xalên girîng derdikevin holê.

A yekem; di kuştina namûsî de keça malbatê nayê kuştin. A duyem; gel li hemberî vê helwestê bertekeke tund nîşan dide. Gel, X şermezar dike. Ev yek eşkere dike ku li hemberî keçan helwestên wanî ne asayî ne. A sêyem; weke pisporên ku min hevpeyvîn bi wan re kirine destnîşan dikin; dewlet bûyerên bi vî awayî teşwîk dike. Heger ku teşwîkirina bûyerên bi vî awayî nerast bûua, polîsan tucarî piştî du mehan ew keç nedigirt û netanî radestî bavê wê nedikir. A herî balkêş, li gorî qanûnan, ji xwe keçeke ku 18 salên xwe dagirtibe, reşît e û ew bixwe dikare biryara zewaca xwe bide.

Lê, heger ku jineke X û mêrekî din hevdû revandibûna, bêgûman wê helwesta wî ne bi vî awayî bûya. Kuştina wê jinê û ya mêrê ku hevdû revandine, wê nebûya surprîzek, herweha wê gel jî ew hewqasî bi tundî tawanbar nekira.

Bûyerên wanî, yên ku keç nayên kuştin, di nav kurdan de pir in. Çi li Kurdistanê, çi jî li Swêdê kîjan pispor be dikare di nav kurdan de gelek mînakên wanî bidest bixin. Dema ku mirov mînakên wanî dide ber teoriya swêdiyan, careke din derdikeve holê ku bûyera Fadîme paradigmayek e.

4.2. Dîmen û Bûyera Fadîme Hîperrealîteyek e

Şêweya ragihandina bûyera Fadîme ji aliyê medya ve, teoriya sosyologê fransîz Jean Baudrillard ku di derbarê hin bûyeran de ku medya radigihîne, dibêje *hyperreality*,²⁸³ tîne bîra mirov. Li gorî Baudrillard, gelek caran medya bi derfetên teknolojîk, perçeyên cuda berhev dike, dide berhev û rastiyeke ku di jiyane de tune ye, diafirîne. Ev yek sîmilasyon e, ango teqlîd an şibandina rastiye ye. Medya bi helwesteke manîpulatif perçeyên ku li fikrên wan nayên an jî dijî fikrên wan in, meqes dikin û yên ku li fikrên wan tên didin berhev, hinan diguherin, şirove dikin, li gorî dilê xwe rengekî didinê û di rojname û ekranên televîzyonan de diweşînin. Bi vî awayî, rastiyeke ku di jiyane de tune ye, lê di ekranên televîzyon û rojnameyan tenê de heye, diafirînin. Êdî ev dîmenê dûrî rastiye, ji aliyê civakê ve tê pejirandin û di nav gel de bi cî dibe. Herweha fikra gel êdî li ser vê yekê tê avakirin.²⁸⁴

Dema ku mirov dîmenê ku ji aliyê medya ve hatiye afirandin, dide ber dîmenê şênber ku di jiyane de eşkere heye, mirov digihê encama ku bûyera Fadîme bixwe hîperrealîteyek e. Bahsnekirina xwişka wê ya bi mêrê swêdî re, di derbarê îddîayên wê de nepirsîna fikra malbata wê, herweha ranegihandina ji ber sedemên cûrbecûr mirina hevalên wê yên nêzîk û hwd. cudahiya di navbera hîperrealîte û rastiya şênber de, eşkere dike.

Çi bi ragihandina nûçeyên hîperrealîteyê û çi jî bi weşana program û nivîsên ku paradîgmaya “hedersmord”ê diparêzin, di nav gelê Swêdê de, di bicîbûna

²⁸³ *hyper*: aşirî, zêde, zêdeyî adetê, *reality*: rastî.

²⁸⁴ Jean Baudrillard, *Simgesel Değiş Tokuş ve Ölüm*, Weş. Boğaziçi Yayınları, İstanbul, Aralık 2011, r. 130.

“hedersmord”ê de medyayê roleke girîng lîstiyê. Herçiqas di nav kurdan de ev têgeh û kuştina keçan ji ber têkiliyên wan ên evînî tune be jî, îro dema ku mirov ji swêdiyekî ji rêzê bipirse, bêje “hedersmord” çî ye, bêgûman wê bêjin “dema ku dilê keçekê têkeve yekî ku malbat qebûl neke, ew keç tê kuştin. Ji vêya re “hedersmord” tê gotin.”

Li gel ku ji bilî Fadîme, keçên biyanî yên weke tirk, ereb, yahûdî, asûrî-suryanî û hwd. jî ji aliyê malbatên xwe ve hatine kuştin,²⁸⁵ tuyan ji wan biqasî Fadîme di medya de cî negirt û di nîqaşên “hedersmord”ê de hewqasî li ser nesekinîn. Li gorî îstatîstîkan, li Swêdê salê çel jin tîn kuştin.²⁸⁶ Lê biqasî ku çapemenî, hikûmet, akademîsyen, ronakbîr, sazî û hwd. kuştina Fadîme girîng dîtin, kuştina tu jinan hewqasî girîng nedîtin û hewqasî guftûgo li ser nekirine.

Di mezinbûn û balkêşiya vê bûyerê de bêgûman medyayê roleke girîng lîstiyê. Her çiqas bi awayekî îstîsnayî hin rojname û televîzyonan agahiyên dijî dîmenê ku heye radigihandin jî, bi tevahî, medya bi awayekî provokatîf, li gorî hîperrealîteya xwe weşan dikir. Bûyer ji aliyê Fadîme de, bi helwesteke yekalî radigihandin. Li aliyê din bi tu awayî cî nedidan fikra malbata wê û fikra pisporên çanda kurdan. Li gorî Rêbazên Etîkî, yên çapemeniyê, ev weşan sûc e. Lew di xala 13an de dibêje di mijarên ku çend aliyên wê hene de, mafê gotinê bidin hemû aliyên û fikrên wan weke hev ragihînin.²⁸⁷

Lêbelê ji destpêka bûyera Fadîme û heta piştî kuştina wê, medya di derbarê îddîayên Fadîme de fikrên malbata wê û di derbarê çanda kurdan de fikrên pisporan nepirsîn. Tenê piştî kuştina wê bi sê rojan rojnameya *Aftonbladet* li salona dadgehê ji du xwişkên wê çend pirs kirine, piştî kuştina wê bi çar rojan rojnameya *Expressen* çûye Elbîstanê, gundê Fadîme da ku di derbarê bûyerê de fikrên xizmên wê ragihîne û televîzyona TV4 bi programekê hevpeyvînek bi xwişka wê ya mezin re kiriye. Dîsa di program û herdu nûçeyan de jî, eşkere ye ku ji bo hîperrealîteya ku afirandine, dixebitin, ji bo wê malzemeyan berhev dikin.

Di nûçeya rojnameya *Expressen* de, xuya ye ku rojnamegerên wan, bi armanca ku gundiyan biryara kuştina Fadîme dane teyîd bikin, çûne Elbîstanê. Li gel ku gundî

²⁸⁵ Rojnameya *Aftonbladet* 23.01.2002

²⁸⁶ Terri Eriksson, *Aftonbladet* 29.01.2002

²⁸⁷ <http://www.po.se/regler/presstiska-regler>

eşkere radigihînin ku tu têkiliya wan bi vê bûyerê tune ye, bi tu awayî tê de rol nelistine, heta piştî ku bûyer pêk hatiye pê ve hayê wan jê çê bûye, rojnameger bi pirsên provakatîf û şiroveyên sùbjektîf, hewl didin vê biryarê bi gundiyan bidin teyîdkirin.

Roja yekem, berî ku biçik gund, hîna li Elbîstanê ne, manşetêke wiha di rûpela yekem de radigihînin: “Expressen li bakurê Tirkiyeyê, li gundê Fadîmeyê ye. Fadîme wiha cezayê kuştinê wergirt!”²⁸⁸ Pişt re di nûçeyê de, li sûka Elbîstanê hindikbûna jinan bi “hedersmord”ê ve girê dide û dibêje mûhtemelen jin ji ber kuştinê dernakevin sùkê. Herweha, bêyî ku tu çavkaniyan nîşan bide, îddîa dike ku li vê herêmê salê bi kêmanî 20 keç ji ber sedemên parastina namûsê tên kuştin. Di heman nûçeyê de rojnameger berî ku herin gund, îddîa dikin ku li gund biqasî 200 xizmên Fadîme civiyane û biryara kuştina wê dane.²⁸⁹ Jixwe şaşiya eşkere, ku bêyî tu lêkolînan tê dîtin ew e ku Elbistan ne li jora Tirkiyeyê ye.

Dema ku roja din diçin gund, bi xizmên Fadîme re hevpeyvînan dikin, li gel hemû pirs û şiroveyên provakatîf, tu kes kuştina Fadîme rast nabîne, vê bûyerê jî weke “hedersmord”ê nabînin, heta şermezar dikin. Ji bo vê kuştinê nerazîbûna xwe nîşan didin, vê kuştinê red dikin, heta şermezar dikin. Balkêş e ku di vê bûyerê de, Fadîme bixwe sùcdar dibînin. Dibêjin “Fadîme di derbarê malbata xwe de pir derew dikir, lewma êdî tu kes bi wê nema bawer dibû.”²⁹⁰ Herweha radigihînin ku “hedersmord”a ku rojnameger bahs dike, li wî gundî qet pêk nehatiye. Radigihînin ku gelek xizmên wan li dewletên Ewrûpayê hene, bi alman, îngîlîz û norweciyan re zewicî ne, herweha zewaca bi kesên biyanî re tişteki asayî ye. Lê balkeş e ku *Expressen* ev nûçe weke roja yekem, ne bi manşetêke mezin, lê bi nivîseke biçûk di qozîyêke rûpela yekem de daye. Lew gotinên xizmên Fadîme bêdilê wan in, li hîperrealîteya wan nehatiye, lewma ev nûçe weke yê din nedane.

Dîsa di heman nûçeyê de tê radigihandin ku nivîskarê kurd Kurdo Baksî dibêje kurdên wê herêmê, li dû civaka Tirkiyeyê ya modern mane, lewma kevneşopiyên bi vî awayî di nav wan de berdewam dikin. Lê Kurdo Baksi vê gotinê red dike û radigihîne

²⁸⁸ Rojnameya *Expressen* 25.01.2002

²⁸⁹ Rojnameya *Expressen* 25.01.2002

²⁹⁰ Rojnameya *Expressen* 26.01.2002

ku ew Tirkiyeyê weke dewleteke modern nabîne û tu daxuyaniyên bi vî awayî nedayê rojnameya Expressen.²⁹¹

Expressen di heman nûçeyê de tinazên xwe bi erdnîgariya Elbîstanê û bi gundiyan dike. Wiha dibêje: “Rahmi Şahindal kevneşopiyên xwe ji vî gundê gemarî, bixwe re anî Swêdê.” Li gorî rêbazên çapemeniyê, gotineke bi vî awayî sûc e lew çapemenî bi tu awayî nikare nixrên hin grûban an hin gelan kêmbixe, nikare dijîtiya wan bike yan jî wan kêmbixe.²⁹² Bi vî awayî, *Expressen* armanca xwe ya çûna Elbîstanê careke din eşkere dike.

Li Zaningehe Gävle Doçenda Medya, Margareta Rönberg jî radigihîne ku weşana *Expressen* a bi vî awayî dijî rêbazên çapemeniyê ye.²⁹³ Li ser vê yekê, ji ber ku kurdan kêmbixe û tinazên xwe bi coxrafya Kurdistanê dike min bixwe bi daxwaznameyekê li vê rojnameyê gilf kir. Bêgûman min zanîbû ku wê ev gilf kirin were redkirin, lew di derbarê vê weşanê de, bi tevahî di navbera hikûmet, parlamento, ronakbîr, medya, dadgeh û raya giştî de konsensûsek heye.

Weke ku min texmîn dikir, biryar ji dadgehê hat. Di biryarê de dozger digot “ev nûçe perçeyek ji nîqaşên entegrasyona biyaniyan e. Di derbarê dijberiyên kulturê de alîkariya çareseriyê dike.”²⁹⁴

Di vê bersivê de eşkere tê gotin ku nîqaşên ku di derbarê “hedersmord”ê de tên kirin, alîkariya entegrasyona biyaniyan û çareseriyê pirsgirêkên çandî dike. Bêgûman di navbera biyaniyên swêdê û gelê swêdî de pirsgirêkên entegrasyonê û yê çandî hene. Lê bi weşana agahiyên şaş û manîpulatif, ne ev pirsgirêk, ne jî tu pirsgirêkên din tên çareser kirin.

Heger ku bi dayîna agahiyên şaş û manîpulatif, bi gûr kirina pirsgirêkan, bi dijîtiya hin grûbên mirovan, medya dikare pirsgirêkên civakî çareser bike, divê medya hemû pirsgirêkên civakî yê li Swêdê bi vê helwestê ragihîne. Weke mînak, li Swêdê her sal 20 jinên ku tên kuştin, pirsgirêka enestê; keçên swêdî ji sedî 8 heta 12yan yê

²⁹¹ Hevdîtineke şexsî bi Kurdo Baksi re li Stockholmê. 19.5.2002

²⁹² <http://www.po.se/regler/presstiska-regler>

²⁹³ Doç. Dr. Margareta Rönberg, li *zaningehe bajarê Gävle, sohbetêke şexsî*, 28. 03.2003

²⁹⁴ Biryara dadgeha bajarê Gävle, 11.04.2002

ku bav an birayên wan, bi wan re dikevin têkiliyên zayendî, bi serê xwe pirsgirêkên civakî yên girîng in.²⁹⁵ Bêgûman qîmetê van jinên ku tên kuştin û van keçên ku pêrgî têkiliyên ensestê dibin, ji qîmetê Fadîme ne kêmtir in. Lê li Swêdê ev herdû pirsgirêk, di medyayê de, bi awayekî berbiçav nehatine ragihandin, biqasî bûyera Fadîme deng venedane û hewqasî nehatine nîqaşkirin. Ev jî diyar dike ku bi vê helwestê pirsgirêkên civakî nayên çareser kirin û armanca medya ne çareserkirina vê pirsgirêkê ye.

4.3. Sedemên vê Helwesta Şaş

Dema ku mirov li hemû faktorên eşkere û veşartî dinere yên ku di vê bûyerê de rol listine, mirov dikare bibêje ku armanca mezinkirina bûyera Fadîme, ne parastina mafê jinan e. Lew eşkere ye ku medya û derûdorên têkildar, çavên xwe ji hin faktorên girîng re girtine û bi hevdû re dîmenekî şaş afirandine. Biqasî ku xuyaye, sedemên vê helwesta şaş, faktorên weke siyasî-îdeolojîk, cudaxwaziya biyaniyan, nezaniya çanda biyaniyan û zenofobiya (xenofobia) - Etnosentrizm e. Ji ber zelalkirin û têgihîştina mijarê, divê mirov yek bi yek van faktoran zelal bike.

4.3.1. Cudaxwaziya Biyaniyan

Li Stockholmê, bêyî ku mirov têkeve helwesteke taybet an lêkolîneke zanistî bike, di jiyana rojane de, bi gelek awayan, cudaxwaziya ku li hemberî biyaniyan tê kirin, bi hêsanî tê dîtin.

Li Stockholmê taxa Tensta, Rinkeby û ya Fitja weke sê taxên biyaniyan tên dîtin. Li van her sê taxan ji gelek welatên cîhanê mirov dijîn. Li gorî gotina wezîra entegrasyonê Mona Sahlin, li Rinkeby 120 etnîsîte dijîn lê li taxa Södermalm ku li jêra Stockholmê ye, Swêdî tenê dijîn.²⁹⁶ Heger ku yekî biyanî li Stockholmê li taxa Rinkeby, Tensta yan Fitja bixwaze xaniyekî kirê bike, di çend mehan de bidest dikeve, lê heger ku li Södermalm bixwaze kirê bike, divê sî salî di dorê de bisekine.²⁹⁷ Dema ku swêdiyek ji taxa Södermalm ji şîrketêke taksîyên Stockholmê taksîyekê dixwaze, bi taybetî dibêjin “şifêrên biyanî neşînin”, lewma biyaniyên ku li Stockholmê şifêrtiya

²⁹⁵ Åsa Brittasdotter Britta Stövling, *Incest, Dotterrätt mot patriarkatet*. Wahlström&Widstrand Stockholm 1982

²⁹⁶ Radyoya *utbildningsradio* 27.10.2003 saet. 17.00.

²⁹⁷ Serdar Gazi, Kurdekî ku li xaniyekî kirê digeriya, 15.07.2002

taksiyan dikin, tucarî rêwîyan nabin û nînin van taxên ku swêdî tenê lê dijîn.²⁹⁸ Di salên 1990î de, heger ku hindik bûn jî, kesên Swêdî li taxa Tensta, Rinkeby û Fitja xuya dibûn, lê piştî salên 2000an, bi taybetî van salên dawiyê, êdî kesên swêdî li van taxan nema xuya dibin. Heger ku yek heban kesên zerî xuya bibin jî, dema ku mirov nêzîkî wan dibe û li wan guhdarî dike, mirov ji swêdiya wan fêhm dike ku ne swêdî ne.

Li gorî gotinên kesên ku niha li Swêdê dijîn, mamosteyên dibistanên taxên swêdiyan, weke ku zarokên Swêdî bibin welatekî din, zarokan didin dora xwe û dibin li Rinkeby, Tensta û Fitja digerrînin da ku biyaniyan û taxên wan ji nêzîk ve bibînin. Tê bahskirin ku êdî van salên vê dawiyê zarokên biyaniyên ku li dibistanên Rinkeby, Tensta û Fitja dixwînin, bi swêdiyeke şikestî dipeyivin.

Helbet ev demografiya ku ji kesên biyanî tenê pêk tê, ne bi awayekî tesadufî derketiye holê. Mirov dikare vê rewşê weke îşareteke cudaxwaziya swêdiyan binirxîne. Li gel ku taxa Rinkeby, Tensta û Fitja sê taxên Stockholmê ne, ji ber tunebûna swêdiyan, bêgûman mirov nikare li wan taxan bahsa çanda swêdiyan bike. Kurd, turk, ereb, faris, belûcî, somalî, yûgoslawî, latîn emerîkî û hwd. ji wî 120 etnîsîteyî mirov kîjanî bigire, mûhtemelen wê hejmara wan ji ya swêdiyan bêtir be. Ev rewş, fikra Masoud Kamali ya ku dibêje li herêmên wanî çandên melez tên afirandin,²⁹⁹ pişt rast dike. Herweha mumkun e ku li van herêman hin çand û helwest li derveyî çanda swêdî, heta dijî çanda swêdî derkevin holê. Weke mînak, li tu derên Swêdê di kirîn û firotinê de kirina bazara bihayê tiştan tune ye lê li van her sê taxan, dema ku mirov cilekî bikire, divê mirov bazarê bike. Dîsa li her derên Swêdê dema ku mirov tiştêkî dikire, bêyî ku mirov bibêje, fişa wî tiştî didin mirov, lê li van taxan, heger ku mirov bixwaze jî fiş nayê dayîn, dema ku mirov israr bike, dibe ku şer jî di navbera mirovan de derkeve.

Li van her sê taxan rêjeya sûcan jî li gorî taxên din bilindtir e. Kirîn û firotina maddeyên narkotîkî, fûhûş, kirîn û firotina eşyayên diziyê, ji taxên din pir hêsantir tê kirin. Şer û pîrsgirêkên ciwanan li van herêman ji herêmên din bêtir in. Mirov li navenda Rinkeby bîstekê bisekine, hatina hin kesan û pîrsa narkotîkê ji mirov, qet ne surprîz e.

²⁹⁸ Kemal, li Stockholmê şifêrê taksiyê. 20.13.2003

²⁹⁹ Kovara *Socionomen* 2. 2002 r. 13

4.3.2. Zenofobiya (xenofobia) û Etnocentrizm

Bêgûman di afirandina taxên wanî de helwesta gel û saziyên swêdî, rolekî diyarker dilîze. Herêmên wanî ku xwerû biyanî lê dijîn, mesafeya di navbera çanda biyanî û swêdiyan, hîn firehtir dike. Dema ku mesafeyeke wanî hebe, bêgûman di navbera herdû civakan de dayîn û stendin çê nabe, heger ku çê bibe jî, wê qels be. Bi vî awayî, li gel ku herdû civak li heman welatî dijîn, ji dêvila têkiliyên cîrantî û dostayî, helwestên dijîtiyê di navbera wan de derdikevin holê. Helbet di rewşên wanî de hestên “me” û “wan” li cem herdû aliyan çê dibe û her ku dihere di navbera herdû aliyan de mesafe fireh dibe.

Di civakeke wanî tekakesî de, ku jixwe têkiliyên civakî kêr in, bi firehbûna vê mesafeyê, diyaloga navbera herdû civakan qels dibe, yan jî namîne. Hevdûnaskirin yan jî diyaloga herdû aliyan, di ser medya re ku bi saya teknolojiyê bipêş ketiye, tê kirin. Dema ku medya jî bi weşana xwe ya şaş û yekalî, heta dijî biyaniyan, vê rolê bilîze, entegrasyon li dera han, hestên nerênî diwartir dibin. Wê gavê weke encamên weke tirs li hemberê grûbeke mirovan, li hemberî çandekê, ku jê re dibêjin zenofobiya (xenofobia) û dijîtiya li hemberî biyaniyan, derdikeve holê. Îro li Swêdê rewşeke bi vî awayî heye.

Zenofobiya, piranî bi hestên “em swêdiyên asayî” û “ew biyaniyên seyr” xwe dide rû. Weke ku Josefîn Brink dibêje, swêdî sucên weke zulm, lêxistin, tecawiz û kuştina jinan ku di civaka swêdiyan bixwe de heye, êdî nema dixwazin di nav xwe de bibînin, lewma sucên wanî heta dikarin dûrî xwe, dûrî malbatên xwe dibin. Van sûcan dibin dixin kreşan, dixin bexçeyên dawî yê tarî û dixin çandên biyanî. Ev helwest ji hestên ku dibêje “em swêdiyên asayî, çandekê me ya asayî heye û ew kesên seyr, çandekê wan a xerîb û seyr heye” tê.³⁰⁰

Dema ku di navbera du çandan de mesafeyeke wanî dûr, tarî û bi tirs hebe, bûyerên çandî bixwe jî ji aliyê çanda serdest ve, bi helwesteke etnosentrîk (etnocentrism) tîr nixandî. Ango nixên xwe di navenda jiyanê de, weke pîvana mûtlaq dibînin û hemû nixên derveyî xwe mahkûm dikin. Weke mînak, dema ku du

³⁰⁰ Kovara *ETC* 1 2002 r. 31

kesên ji Rojhilata Navên li derve pêrgî hevdû tîn, li hevdû disekinîn, li hal û demên hevdû, li malbatên hevdû dipirsîn, bi swêdiyan xerîb tê, vê yekê fêhm nakin û lewma şaş dibînin.

Dema ku ne bi helwesteke etnosentrîk, lê bi helwesteke objektîf mirov li vê mijarê binere, ev rewş tê fêmkirin. Ev yek di civakên kollektîf de, rêbazeke civakî ye. Di çandên kollektîf de, ji ber ku mirov perçeyek ji civakê ye, divê mirov li temama malbatê bipirse û di axaftina xwe de êşkere diyar bike ku mirov perçeyekî ji civaka kesê hemberî xwe ye.

Lê di çanda swêdî de, ku di bingeha wê de rêbazên tekakesî heye, helwesteke wanî tê wateya mudaxaleya jiyana taybetî. Lewma divê mirov pirsên bi vî awayî neke. Dema ku biyaniyekî ji Rojhilata Navîn, ji swêdiyekî dipirse dibêje “tu çawa yî, dê û bavê te çawa ne”, ne tenê swêdî vê yekê weke mudaxaleya jiyana taybetî dibînin, herweha swêdî bi hestên parastina jiyana xwe ya taybet, ji yê biyanî bidûr dikeve. Helbet ev yek şertên nenaskirina çanda biyanî û bingeha hestên dijîtiya wan diafirîne. Dema ku swêdî bersiv didin, dibêjin “bra” ango “baş” û tiştêkî din nabêjin, heman mesafe û hest li gel biyaniyan jî çê dibe. Lew li gorî wî jî ev bersiv kêmtir e, şaş e û nexweş e.

Lew di civakên kollektîf de, pirsgerêkên ku pêk tînin, her çiqasî yê şexsan bin jî, kesên derûdora wî kesî jî bi wê pirsgerêkê re têkildar in û mafê wan heye ku mudaxil bibin. Ji bo swêdiyan ku di civaka tekakesî de gihastîne û pirsgerêk şexs tenê eleqeder dike, di bûyera Fadîme de fêmkirina hin tiştan zahmet e. Bavê Fadîme di civaka kollektîf de gihastîye. Ew bav, ne pirsgerêka Fadîme tenê, hemû pirsgerêkên malbatê weke pirsgerêkên xwe dibîne, xwe bi pirsgerêkên xizmên xwe re têkildar dibîne. Lewma dema ku Fadîme derdiket televîzyon û rojnameyan, bi awayekî êşkere bahsa jiyana xwe ya zayendî ya di navbera xwe û dergîstiyê xwe de dijiya, bahsa bakîretiya xwe, di şeva zewacê ya yekem de bahsa xwîna li çarşefê dikir, bavê wê tehamûl nedikir. Bavê ku di çanda kollektîf de mezin bûye û hîna jî xwediyê heman hestan e, xwe kêmtir û ev yek weke heqaretekê li xwe qebûl dikir. Lewma wan hestên ku wî di civaka kollektîf de wergirtine, bi awayekî xwezayî bertek dane û li hemberî Fadîme tevgeriyaye. Di heman demê de, ji bo swêdiyan bahskirina têkiliyên zayendî û hemû tiştên bi vê xalê ve

girêdayî, şexs tenê eleqeder dike. Weke mînak, keçeke swêdî ku di filîmekî porno de dilîze, di televîzyoneke gel de bahsa hemû detayên filîm û çîroka destpêkirina wî karî jî bike, hestên ku di bûyera Fadîme de bi bavê Fadîme re çê dibûn, bi bavê wê keçe re çê nabe. Herweha swêdiyên ku wê keçe nas bikin, malbata wê ji ber vê yekê berpirsiyar nagirin, şexsê wê tenê berpirsiyar digirin. A herî girîng, biqasî ku biyanî wê keçe xerab dibînin, swêdî wê hewqasî xerab nabînin, lew wê bixwe ew jiyana tercîh kiriye, lewma ji bo wan bêtir asayî tê dîtin.

Di jiyana rojane ya asayî de jî di civakên tekakesî de, mirov dikare bi hêsanî li ser pirsên zayendî biaxive. Li Swêdê li dibistan û klînîkên ciwanan di derbarê zayendiyê de agahî ji bo keç û xortan tên dayîn. Lê li civakên kollektîfî zayendî mahremiyet tê qebûlkirin û bi awayekî eşkere axaftina li ser zayendiyê tabû ye. Çi li dibistanan çi jî li saziyên têkildar, axaftina li ser zayendiyê pir zahmet e. Lewma dema ku Fadîme derdikeve hemberî kamerayan û bêfedî, bi kûrahî bahsa têkliya xwe ya zayendî ku ji bo bavê wê tabû ye dike, bandoreke neyînî li bavê wê dike. Wê gavê, ew kodên çandî ku bavê wê di temama jiyana xwe de ji civaka xwe ya kolektîf wergirtiye, bi awayekî xwezayî, bavê wê xistiye tevgêrê û weke encam, ev kuştin derketiye holê.

4.3.3. Nezaniya Çanda Biyaniyan

Li welatekî ku kesên nişteçî û biyanî hewqasî dûrî hevdû bin, li gel zenofobiya û helwestên etnosentrîk, bêgûman wê di pirsgirêkên civakî de, nezaniya çanda biyaniyan jî weke encam derkeve holê û wê ev yek weke faktorekê di pirsgirêkên civakî de rol bilîze.

Lewma sedemek ji sedemên ku bûyera Fadîme hewqasî mezin bû, nezaniya çanda biyaniyan e.³⁰¹ Piraniya kesên ku beşdarî vê nîqaşê dibin, di mijarê de biqasî ku bi awayekî objektîf binirxînin, ne agahdar in. Ji bo ku mirov dîmenekî rastî di derbarê namûsê de, di derbarê kuştinan de yên ku ji bo namûsê pêk tên bi dest bixe û ev yek di çanda kurdan de çawa pêk tê, bibîne, diviyabû biçûna Kurdistanê û lêkolînên zanistî, çandî û sosyolojîk bikirana. Di afirandina vê dîmenê şaş de, rola hin kurdên ku li Swêdê

³⁰¹ Malmîsanij, *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

dijîn jî heye. Hin kesan dane dû nav û deng, bêyî ku di mijarê de xwedî agahî bin, li gorî dilê medya diaxivin, îddîayan dikin da ku derkevin çapemeniyê û populer bibin.³⁰²

Dema ku nîqaşa “hedersmord”ê berdewam dikir, di jiyana rojane de jî mirov gelek caran pêrgî gotinên ku swêdî çanda biyaniyan nas nakin, dihat. Gotina “ez fêm nakim çawa malbat dikare xwe tev li zewaca keça xwe bike” gotinek ji van gotinan e. Vê nezaniyê di sohbetên ji rêzê de, hin caran ew dixistin rewşên xerab û ew mahcûb dikirin. Weke mînak dema ku pîrsa “heger ku xwişkeke Fadîme bêzewac bi yekî swêdî re bijî û neyê kuştin, çawa mirov dikare bawer bike ji bo ku Fadîme bi xortekî swêdî re bû, hat kuştin?” dihat kirin bersivên dûrî aqilan û dûrî xwezaya bûyerê didan. Li hemberî vê pîrsê, xwendekareke swêdî bersiveke wiha da: “Belkî ji ber ku Fadîme ji xwişka xwe bihêztir û têkoşertir bû bavê wê ew kuşt.”³⁰³

Ne tenê kesên ji rêzê, kesên akademîsyen û ronakbîr jî bersivên dûrî aqilan didan. Dîsa bi vê xalê ve girêdayî, li zanîngeha Gävle, mamosteyekê li hemberî gotin û pîrsa “di heman malbatê de çand ji bo du keçan, bi awayekî cûda pêk nayê, ev rastiyeke e çandê ye. Çanda malbatê ji bo hemû zarokan bi awayekî dimeşe, çima ji bo Fadîme û xwişka wê cuda pêk were?”, got: “Belkî rastiya xwişka wê tiştêkî din bû û ya Fadîme jî weke ku me dît bû.”³⁰⁴

Gotina Astrid Schlytter ku dibêje “helwesta keçan a azadiyê dibe ku bibe sedema kuştina wan”³⁰⁵ dide fêmkirin ku nêrîna gelek kesên zanist jî, bi heman awayî ye. Ev nêrîn bixwe bi pirsgirêk e. Lew li gorî swêdiyan, ji bo gelên Rojhilata Navîn di navenda namûsê de zayendiya jinê, bi taybetî zayendiya keça azib heye. Lewma nirxandinên xwe li ser vê bingeheke dikin û li gorî wan, dema ku zayendiya vê keçê dikeve şikê, ew keçê tê kuştin. Helbet mirov dikare jiyana zayendiyê di hundurê azadiya şexsî de binirxîne. Lê belê weke têgeh, gelo ew azadiya ku Astrid Schlytter îddîa dike û dibêje hewldana wê dikare bibe sedema kuştina keçê, kîjan azadî ye? Azadî têgeheke berfireh e, li gel jiyana zayendî, jiyana ramanî, civakî, çandî, aborî, perwerdehiyê û hwd. gelek tiştên din jî hene. Dema ku azadî weke têgeh bi zayendiya keça azib tenê

³⁰² Malmîsanij, *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

³⁰³ Li kafeterya Zanîngeha Gävle, *sohbet bi xwendekareke swêdî ya medya re*. Gulan, 2002.

³⁰⁴ Li Zanîngeha Gävle, *di darsa Medya-Komunikasyonê de nîqaşa bi mamoste re*. Nîsan 2002

³⁰⁵ Kovara *Socionomen* 3 2002. r. 9

were sînorkirin, bêgûman encamên şaş derdikevin holê. Ev şaşî bixwe, weke di nerîna gelek ronakbîran de, di nêrîna Schlytter de jî heye. Helbet rola şaşiyên zanistên wanî, di afirandina fikrên gel de, roleke girîng dilîze.

Bêyî kirina tu lêkolînên zanistî, bi çavdêriyeke hêsan, mirov dikare bibîne ku îddîaya Astrid Schlytter şaş e. Lew gelek caran li Swêdê tê gotin ku keçên biyanî ji xortan bêtir li zanîngehan dixwînin. Weke mînak pir caran xortên kurd, ji ber ku biqasî keçan naxwînin, tên rexnekirin. Piraya van keçan li bajarên din, dûrî malbatên xwe, bi awayekî azad xwendina xwe dikin. Di şertên civaka Swêdê de, derfetên ku malbat jiyana van keçan kontrol bike, kêr e, heta mirov dikare bibêje ev yek ne pêkan e. Şêwaza vê jiyane bixwe, îddîaya Astrid Schlytter ku dibêje dibe ku bi xortan re peyva keçan bibe sedema kuştina wan³⁰⁶ nerast derdixe.

Heman nezanî li gel saziyan jî heye. Destnîşankirina Lijneya Zimanê Swêdî ku dibêje “em fêrî nakin çawa hin kes di malbatê de namûsê hewqasî girîng dibînin”³⁰⁷ vê nezaniyê eşkere dike. Heger ku di derbarê mijareke hewqasî girîng de, nixandineke bi vî awayî ji aliyê Saziya Lijneya Zimanê Swêdî ve were dayîn, kêr zêde ciddiyeta nêrîna swêdiyan li vê mijarê diyar dibe. Gotina “em fêrî nakin” bixwe diyar dike ku di bîngeha têgeha “hedersmord”ê û nîqaşên de ku li dora wê tînin kirin, helwesteke zanistî tune ye. Lew di meseleyên girîng de, bêyî kirina lêkolînan, di zanistê de ciyê gotina “em fêrî nakin” tune ye. Lewre nêrînan zanistî bi pêvajoyeke lêkolînî, sedem û encam tînin bidestxistin. Lewma çîh ji gotina “em fêrî nakin” re namîne. Vê daxuyaniya ku li ser malpera saziyê ya înternetê hatiye dayîn û herkes bi hêsanî dikare xwe bigihîne, di heman demê de, asta ciddiyeta Swêdê ya li hemberî biyanî û çanda biyaniyan jî diyar dike. Diviyabû vê saziyê di derbarê çanda biyaniyên ku îro li Swêdê ji deh kesan du kes in, agahiyên ciddî bida.

Li gel ku malbata Fadîme, diya wê, bira, xwişk û gelek xizmên wê li bajarê Uppsala dijîn, Expressen neçûye cem wan, lê çûye cem xizmên wê, yê li Elbîstanê. Xuya ye Expressen dizane yê ku li Uppsala dijîn di vê bûyerê de rol negirtine û ne weke wan e ku nîşan didin. Lew rojnameyeke ku hewqasî bi vê mijarê re têkildar be, ne

³⁰⁶ Kovara *Socionomen* 3 2002. r. 9

³⁰⁷ <http://www.spraknamnden.se/> (Malpera fermî, ya Enstîtuya Ziman û Bîra Gel)

pêkan e hayê wê ji xwişka Fadîme, ya ku bi yekî swêdî re dijî, çê nebûbe. Lê tê fêmkirin ku bi rastî jî Expressen bawer kiriye ku ew kevneşopiya ku ew hebûna wê dipejirînin, li Elbîstanê, li gundê xizmên Fadîme heye. Bi hêviya ku xizmên Fadîme, kuştina Fadîme weke “hedersmord”ê teyîd bikin, çûne gund. Lê dema ku dîtin tu kesî teyîd nekir, nûçe bi awayekî biçûk ku bala xwendevanan nekşîne, ragihandin.

Ev çûn bixwe di derbarê çanda biyaniyan de nezaniya vê rojnameyê teyîd dike. Heger ku zanîbûna ew gundî dê kuştina Fadîme qebûl nekin, dê neçûya wî gundî. Lew dema ku roja yekem bi sernivîsa mezin “wiha biryara kuştina Fadîme hat dayîn”³⁰⁸ ragihandin, hêvî dikirin ku wê gundî sibê vê yekê teyîd bikin. Herweha weke mizgîniyekê ev nûçe gihandin xwendevanan û bêgûman wê xwendevan roja piştî bixwazin bersiva xizmên wê ku vê kuştinê teyîd dike, bixwînin. Heger ku gundiyan teyîd bikirana, wê ev kar weke serkeftineke mezin a rojnamegeriyê bihata nirxandin. Ji ber ku ji hemû rojnameyên Swêdê, ew rojname tenê çû wî gundî, lewma wê ev nûçe hîn bêtir deng bidaya. Lê vê nezaniya wan ew xistin tengasiyê, îddîayên wan derew derxist, lewma ew çûn weke fiyasko bi dawî bû. Helbet vê çûn û nûçeyê, di derbarê çanda biyaniyan de, nezaniya wan eşkere kir.

4.3.4. Faktorên Siyasî-Îdeolojîk

İsmail Beşikçi, bûyerên bi vî awayî, bi îdeolojiya fermî ya hêzên serdest ve girê dide. Radigihîne ku medyaya Tirkiyeyê jî gelek bûyeran weke bûyera Fadîme û helwesta medya Swêdê nîşan dide. Di bingeha afirandina bûyerên wanî de, armancên siyasî, yên hêzên serdest hene. Lewma divê bûyerên wanî bi tena serê xwe neyên nirxandin.³⁰⁹

Beşikçi di zimanê tirkî de bahsa têgeha “töre cinayetleri” ku tê wateya “hedersmord”a swêdî, dike. Ev gotin bi çanda kurdan ve tê girêdan û ji bo kuştina jinên kurd tê bikaranîn. Dewleta Tirkiyeyê ji bo parastin û pêşvexistina kevneşopiyên wanî, kurdan teşwîk dike. Ji bo ku vê yekê di nav kurdan de bi cî bike, statuyê bide helwestên wanî, dewlet têgeh û gotinên mîna “meclisa malbatê”, “reisê eşîrê”, “şêx”, “meclisa malbatê civiya û biryar da...” û hwd. pir bi kar tîne. Beşikçi sedemên vêya bibîr dixê û

³⁰⁸ Rojnameya *Expressen*, 25.01.2002

³⁰⁹ İsmail Beşikçi, *Hevpeyvîn*, bi nameyekê 20.03.2003

dibêje helbet ji ber ku kevneşopiyên wanî nahêle yekîtiya kurdan li dora têkoşîna neteweyî çê bibe, vê yekê dikin. Bi hebûna çandeke wanî di nav kurdan de, ji bo dewleta Tirkiyeyê kontrolkirina kurdan hêsan dibe. Li gel ku ev yek bi gelek awayan pêk tê, divê mirov bi taybetî li rola medya binere, ji ber ku medya di karên wanî de xwedî mîsyon e, lewma jî rolekî girîng dilîze.³¹⁰

Profesor û îdeologê filîstînî Edward Said di vê xalê de, rola medya wiha radigihîne. Peyamên ku organên medya dide, nûçe û agahiyên ku tîrêziyên wan, di filtreyê nêrînê wan ên siyasî re derbas dibin, bi tevahî bi koden îdeolojiya wan tîrêzî bûn û pişt re ji bo gel tê ragihandin. Şirove, nîqaş, heta reklamên ku tîrêziyên jî di heman prosesê re derbas dibin. Lewma medya bi taybetî di pîrsgirêkên civakî de, di afirandina fikir û nêrînê gel de, roleke girîng dilîze. Helbet ev rêbaz ji bo hemû medya cihanê derbas dibe.³¹¹

Di vê xalê de, di derbarê vê rola medya swêdî de, Ferhad Şakelî dibêje dema ku medya kuştina jineke ji welatên Îslamî radigihîne, armanc ne alîkariya jinan e, armanc, li hemberî Îslamê şerê îdeolojîk e. Di guftogoyên kuştinê de, çav û guhên xwe ji kuştina kurdên din ên masûm re ku bi şiklên hovane tîrêzî bûn, digire, kuştina jinan tenê nîqaş dibe. Şakelî kuştina Fadîme weke mînakeke ji van mînanan dinirxîne. Bi helwesteke sansasyonel ev bûyer ragihandin, Fadîme weke keçeke kurd û misulman nîşandan û li hemberî cîhana Îslamî bikar anîn. Lê di eslê xwe de, Fadîme ne misulman e, ne jî kurd e. Her çiqas Fadîme di warê etnîkî de bi koka xwe kurd be jî, ew malbat bi çanda tirkan dijî. Li malê bi kurdî napeyivin, bi tirkî dipeyivin. Fadîme bixwe bi kurdî nizanîbû. Di warê olî de jî ew elewî ne. Tu tîkiliyên vê malbatê bi îslamê re tune ne, jinên wan, li gorî rêbazên îslamê, serî û bejna xwe nanixwêmin. Nirxên îslamî di wê malbatê de tune ne.³¹²

Balkêş e ku di derbarê nakokiyên keçên biyanî û malbatên wan de, helwesta medya li hemberî hemû keçên biyanî ne weke hev e. Etnîsîteya keçan, di vê xalê de roleke diyarker dilîze. Dema ku keç kurd be, medya bi awayekî tevdigere û dema ku keç

³¹⁰ İsmail Beşikçi, *Hevpeyvîn*, bi nameyekê 20.03.2003

³¹¹ Edward Said, vgz. David Morley and Kevin Robins, *Spaces of Identity*, r. 221

³¹² Ferhad Şakelî, *Hevpeyvîn* li Zanîngeha Uppsalayê 06.05.2003

ji gelekî din be, li gel ku ji heman herêmê be û çanda wan bişibe hevdu jî bi awayekî din tevdigere.

Keçeke bi eslê xwe filistînî, 18 salî û xiristiyan di sala 1994an de, ji ber ku nexwestiye bi xortê ku bavê wê dixwest re bizewice, ji aliyê bavê xwe ve hat kuştin.³¹³ Vê kuştinê biqasî kuştina Fadîme deng veneda, medya biqasî ya Fadîme li ser nesekinî, herweha ne çanda filîstîniyan ne jî çanda xiristiyanan hat rexnekirin.

Berî çîroka Fadîme dest pê bike bi salekê, ango di 1997an de, keçeke tirk ji aliyê birayê xwe ve hat kuştin. Dihate gotin ji ber ku weke keçên swêdî dijiya, birayê wê ew kuştiye.³¹⁴ Piştî vê kuştinê bi salekê, dema ku çîroka Fadîme dest pê kir, li Tirkiyeyê wezîra berpirsiyara Jin û Malbatan, Işlay Saygın ji bo bi hêsanî bakîretiya keçan were kontrolkirin, pêşniyazek da parlamentoyê. Saygın dixwest weke qanûn were qebûlkirin ku dê û bav û midûrên dibistanan bikaribin hîn hêsantir bakîretiya xwendekarên keç kontrol bikin. Jixwe di sala 1995an de bi guhertina xaleke qanûnê, bi îddîaya “bêîffetiye” xwendekarên keçik dikarîbûn ji dibistanan bihatana avêtin. Lew derfet dabûn midûrên dibistanan ku bikaribin bakîretiya wan jî bidin kontrolkirin.³¹⁵ Wê demê ji bo testa bakîretiyê keçên 18 salî ji yûrdên keçan bi zorê dihatin birin.³¹⁶ Rojnamegerêk ji vê wezîrê dipirse, dibêje “heger ku keçeke bakîre jî bi zorê bibin testa bakîretiyê, dibe ku ew keç xwe bikuje. Tu vêya çawa dibînî?” Wezîr bersiv dide û dibêje “Ev ne girîng e, çar, pênc heb ne girîng in. Ji bo ku wan ji vê yekê vegêrine divê mirov hin rêbazan dîne û wan terbiye bike. Bila bi xortan re nekevin têkiliyên wanî. Çandeke me heye, divê em vê çandê biparêzin.”³¹⁷

Ev gotinên Işlay Saygın di vê mijarê de, îdeolojiya dewleta Tirkiyeyê ya fermî li ber çavan radixe. Ev wezîr gotinên İsmail Beşikçi, Reşo Zîlan, Ferhat Şakelî û Malmîsanîj ku dibêjin dewlet ji bo namûsê kuştina keçan teşvîk dike, diçespîne. Lewre Saygın vê helwestê weke nirxekî çandî dibîne û ji bo parastina wê, kuştina keçan jî

³¹³ Rojnameya *Aftonbladet* 23.01.2002

³¹⁴ Rojnameya *Aftonbladet* 23.01.2002

³¹⁵ *Hürriyet*, 06.01.1999

³¹⁶ Ayşe Arman, *Hürriyet* 31.12.1998

³¹⁷ *Yeniüzyıl* 29.12.1997

diparêze û meşrû dibîne. Ango dewleta Tirkîye, “töre cinayeti”ya ku swêdî jê re dibêjin “hedersmord” diparêze û teşwîk dike.

Dema ku ev daxuyanî û qanûn li Tirkîyeyê bi hefteyan di medya de hatin guftûgokirin, gelek aktîvîstên mafên mirovan, saziyên jinan, kesên demokrat û pêşverû ev yek rexne û şermezar kir. Lê balkêş e ku li Swêdê, bi tu awayî bahsa vê yekê nehat kirin. Ji dêvila ku vê yekê nîqaş bikin û rexne bikin, di ser bûyera Fadîme re, li hemberî biyaniyan ketin helwesteke nerênî.

Weke mînak; piştî kuştina Fadîme, kanaleke televîzyonê çû taxa Fitja ku biyanî pir lê dijîn, hin xortên ne kurd, weke kurd nîşan da û bi wan da gotin ku Fadîme li gorî nîrxên çanda kurdan hatiye kuştin, lewma Fadîme kuştin heq kiriye. Pişt re rojnamegerê Swêdî Dan Josefsson bi programeke televîzyonê diyar kir ku ew xort ne kurd in, wê kanalê ew ji herêmeke din birine Fitja û bi wan re hevpeyvîn kiriye. Herweha diyar kir, ji ber ku medya gotinan sansur dikin, diguherin û şaş diweşînin, biyaniyên Fitja biryar girtine ku bi tu awayî hevpeyvînan nedin çapemeniyê.³¹⁸

Heger ku armanca medya ragihandineke objektîf bûya, wê ji dêvila Fitja biçûya zanîngeha Uppsalayê, ji pisporên weke Reşo Zilan, Ferhad Şakelî, Malmîsanij û hwd. ên ku di çanda kurdî de pispor in, bipirsîna. Bêgûman çûna navenda Fitja û kirina pirsan ji çend xortikên ne kurd, careke din nederustiya medya eşkere dike.

Weke Malmîsanij, Ferhad Şakelî û Îsmail Beşikçi jî destnîşan dikin, nêrînên siyasî di vê helwestê de rol dilîzin. Heger ku bi kuştina keça tirk çanda tirkan û bi kuştina keça filistinî çanda ereban bihata rexnekirin û şermezarkirin, mirov teqez nizane wê berteka Tirkîyeyê û 24 dewletên ereban çawa bûya, lê mirov dikare texmîn bike ku wê swêdiyan nikarîbûna hewqasî bi hêsanî çanda van gelan rexne bikirana.

Helbet sedema vê helwestê ne bi siyaseta Swêdê ya hundurîn tenê ve girêdayî ye, dibe ku sedemên wê xwe digihîne heta Emerîka û têkoşîna ku li hemberî musulmanên radîkal destpêkiriye. Lê çima kurd? Ji ber ku dewleta kurdan tune ye, kurd nikarin xwe biparêzin û hevalên wan jî tune ne, rexnekirin û şermezarkirina kurdên

³¹⁸ Programa Dan Josefsson, *Media Magasinet*, 14 adar, 2002

misulman û bêdewlet, ji bo wan ji rexnekirina van gelan hêsantir e. Tirk, ereb û farisan jî kuştinên wanî kirine lê tuyan ji wan bi qasî kuştina Fadîme bal nekişandiye. Heger ku Fadîme tirk bûya, wê heman tişt nehata kirin, lew wê dewleta Tirkiyeyê bi îmkanên dewletî li hember tevbigeriya û nehiştaya bigihê vê astê.³¹⁹

Li swêdê nêrîna li ser biyaniyan hertim wanî nebûye. Kesên ku gelek salan li wan deran jiyane, radigihînin ku di salên 1970yî de nêrîneke pozîtîf li ser biyaniyan hebûye. Heman nêrîn di salên 1980î de jî berdewam dike. Nêrînên neyînî li dera han, ji ber ku piraniya biyaniyan ji ber kar û xebatên xwe yê siyasî ji welatên xwe reviyabûn, nêrîneke erênî li ser wan hebû, di warê civakî, kar û hwd de derfetên pozîtîf ji bo wan dihat dayîn.³²⁰ Lê di salên 1990î de rewş hat guhertin û êdî nêrînên neyînî li ser biyaniyan çê bûn. Piştî salên 2000an ev nêrîn êdî weke helwest, di warê civakî, kar û hwd de bi awayekî eşkere derket holê.

Di dema êrîşên ku di 11ê Îlona 2001ê li dijî Emerîka hatin kirin, ev yek li Swêdê gihaşt asta herî bilind. Gelek kes van êrîşan ji bo polîtîkeya Emerîka ya navnetewî weke destpêkeke nû dinirxînin û lewma di şerê li hemberî îslama radîkal de, divê hemû hevalbendên Emerîka dostaya xwe nîşan bidin. Di vê mijarê de Hans Blixê swêdî ku di Netewên Yekbûyî de şefê pîsporê selehan bû, bixwe dibêje “USA dixwaze hêza xwe rê cîhana Îslamî bide.”³²¹

Profesorê filîstînî Edward Said, polîtîkaya Emerîka ya piştî dema kolonyalîzma klasîk, bi taybetî ya dema niha, weke dîskolonîkirinê (*reimperialisering*) bi nav dike. Di vê pêvajoyê de, rola medya girîng e. Kanala MTV ku li temama cîhanê weşana muzîkê dike, hîtabî ciwanan dike. Kanalên weke CNN, SKY NEWS û hwd. li temama cîhanê weşana nûçeyan dike, dîsa ji heman fikrê re xizmetê dike.³²² Herweha medya Swêdê jî li Swêdê bi heman armancê weşanê dike.

³¹⁹ Malmîsanij , *Bi telefonê hevpeyvîn*, 27.01.2003, saet: 20.15/Swêd

³²⁰ Seyidxan Anter, *sohbeteke şexsî* de. Sebat 2004

³²¹ Rojnameya *Aftonbladet* 09.03.2004

³²² Edward Said, vgz. David Morley and Kevin Robins, *Spaces of Identity*, r. 223

Weke mînak; rojnameya *Expressen* bûyerên 11ê îlonê yên dijî Emerîka di rûpela xwe ya yekem de, bi sernivîseke mezin ku digot “Îro Em Hemû Emerîkî ne”³²³ radigihand. Herweha bi tevahî rojnameyên Swêdê, kê m zêde weke vê manşetê ev bûyer radigihandin. Lê tu rojnameyên Swêdê di qatîfama Helebçe de negotine “Îro em hemû Kurd in.” Balkeş e ku rojnameya *Aftonbladet* di dawîya sala 1988an de, atletê Kanadî Ben Johnson ku di olîmpîyatan de dopîng bi kar anîbû, li cîhanê weke bûyera herî mezin nîşan dabû û bahsa komkujiya Helebçe nekiribû.³²⁴

Bingeheke dîrokî, ya nêzîkahiya Swêdê û Emerîka heye. Ji dawîya sedsala 1860î heta Şerê Cîhanê yê Duyem biqasî milyonek û sêsed hezar swêdî ji ber xizaniyê bar kirine, çûne Emerîka. Tê gotin ku îro li Emerîka biqasî heşt milyon kesên bi eslê xwe swêdî, hene.³²⁵ Di têkiliyên siyasî de jî, her çiqasî Swêdê xwe weke dewleteke serbixwe nîşan dabe jî, êdî niha eşkere dibe ku di dema Şerê Cemidî de, Swêdê bi dizî bi Emerîka re peyman çê kiriye, di derbarê Sowyetê de gelek agahî dane Emerîka. Li gorî vê peymanê heger ku di navbera Sowyet û Emerîka de şerek derketibûya, wê Swêdê alîkariya Emerîka bikira û cî bide hêzên NATOyê.³²⁶ Bi heman armancê li gel ku Swêd beşdarî şerê Cîhanê yê Duyem nebûye jî, alîkariya Marshall ku Emerîka dida hevalbenden xwe yên ku di şer de zerar dîtibûn, wergirtiye.³²⁷

Bêyî kumirov tu lêkolînên zanistî bike, di jiyana rojane de, di nav gelê ji rêzê de jî heyraniya li hemberî Emerîka xuya dibe. Ji bo swêdiyekî yan swêdiyekê çûna Emerîka xeyaleke mezin e. Ziman, musîk, filîm, moda û hwd. di bandora Emerîka de ye. Gelek swêdî bi aksanê emerîkî bi îngîlîzî dipeyivin. Li ciyên kêfê, weke bar û dîskotekan, jinên swêdî ji mêrên Rojhilata Navîn direvin, lê mêrên emerîkî yan jî yên ku bi aksanê emerîkî dipeyivin, ji destê hevdû direvînin.

Bûyereke ku di salên 2000an de pêk hat, vê nêzîkahiye baş diyar dike. Mêhdî Teyibê bi eslê xwe faris, 45 salî, ku çend salan li Emerîkayê jiyabû, hatibû Swêdê, navê xwe kiribû James Kimball û bi aksanê emerîkî dipeyivî. Piştî ku eşkere bû Kimball bi

³²³ Rojnameya *Expressen* 12.09.2001

³²⁴ Rojnameya *Aftonbladet*, 1988 *årskrönika*

³²⁵ http://sv.wikipedia.org/wiki/Emigrationen_fr%C3%A5n_Sverige_till_Nordamerika

³²⁶ http://sv.wikipedia.org/wiki/Sveriges_utrikes-_och_s%C3%A4kerhetspolitik_under_kalla_kriget

³²⁷ <http://www.historia2.se/historia123/?p=745>

vîrusa AIDSê ye, di mehekê de biqasî 130 jinên swêdî ji bo ku bi wî re ketibûn têkiliya zayendî, ji bo testa AIDS'ê serî li nexweşxaneyan dan. Temenê piraniya van jinan di navbera 18 û 25'an de bû. Piştî re li temama cîhanê Înterpol li Kimball geriya û piştî çend salan li Îranê hat girtin û hat îdamkirin.³²⁸

Meseleya biryara girtina xwediye malpera Wikileaksê Julian Assange, ku raporên Emerîka yê bi dizî eşkere kirin jî weke vê bûyerê nêzîkahiya Swêdiyan ji bo Emerîka diyar dike. Piştî ku Assange raporên Emerîka eşkere kir, Swêdê bi îddîaya ku Assange di çend hefteyên ku li Swêdê maye de, dest avêtiye çend jinên swêdî, biryara girtina wî da. Li ser vê yekê Assange li Îngîltêre hat girtin, piştî ku bi kefaletî hat berdan, li balyozxaneyê Ekwadorê îltîca kir û ji 7ê Tebaxa 2012an vir de ji wê balyozxaneyê derneketiye. Îddîaya ku Assange dest avêtiye jinên swêdî durrî aqilan e. Heger ku tiştêkî wiha hebûya, dema ku li Swêdê bû, wê van jinan li wî gilî bikira û ew bigirtana. Piştî derketiye derveyî Swêdê, demeke dirêj derbas bûye û belgeyên Emerîka eşkere kiriye, jinên swêdî li wî gilî kirine. Xuya ye Emerîka ji bo girtina vî kesî, li bahaneyekê geriyaye û ji bilî vê bahaneyê, tu bahaneyên din bi destê wan neketiye.

³²⁸ Rojnameya *Aftonbladet*, 19.01.2007

4.4. Encam

Hemû agahiyên ku di derbarê çanda kurdan de ji sed salî û wê de hatine nivîsîn, herweha agahiyên ku pisporên mijarê di derbarê rewşa îro de jî didin, têgeha ku swêdî jê re dibêjin *hedersmord*, di zimanê kurdî de tune ye. Herweha kuştineke bi vî awayî di çanda kurdan de jî tune ye. Lê gotinên weke “kuştina ji bo namûsê”, “kuştina li ser namûsê” di nav kurdan de tê gotin. Li gorî van gotinan, mêrên ku dest avêtine jinekê yan jî ketine hewldana tecawiza wê ne yên ku tên kuştin.

Îddîaya swêdiyan ku dibêjin dibe ku axaftina keçeke kurd bi xortekî re, bibe sedema kuştina wê, dûrî rastiyê ye. Li gorî belge û pisporên çanda kurdan, di nav kurdan de keçrevandin adetek e. Helbet divê ev revandin bi dilê keçê be. Heger ku keçek azib an jineke zewicî bi zorê were revandin, rêbazên hişk hene. Şerên ku dibe sedema kuştina gelek mêran, di nav kurdan de dest pê dike.

Gelek seyah, lêkolîner û mîsyonerên ku hatine Kurdistanê û di derbarê çanda kurdan de nivîsîne, di çanda kurdan de bi taybetî bahsa “destnedayîna jinan” dikin. Li gorî vê rêbazê, bi tu awayî tu kes nikare dest bide jinê. Heta dema ku bi rojan, bi hefteyan eşîr li hemberî hevdû dikevin şer, gelek mêran ji hevdû dikujin, jin bi hêsanî di nav kesên hemberî xwe re derbas dibin, xwarin, av heta muhîmatê jî ji xizmên xwe re dibin. Û tu kes dest nade jinên wanî. Faktoreke din heye ku biqasî vêya girîng e. Dema ku du alî hewqasî bi hevdû re şer dikin û şer pir giran dibe, heger ku jinek têkeve navbera wan, destmala serê xwe veke û bavê nav wan, divê ew şer were sekinandin. Dîsa heger ku aliyekî şer, ji bo sekinandina şer, jinên xwe bişînin cem kesên hemberê xwe, divê ew kes bê şert û şirûd vê daxwazê bipejirîne û şer bisekinîne. Lewra di çanda kurdan de, jin pîroz tên dîtin, pirsgirêkên ku jin dikevinê, divê werin çareserkin.

Her çiqas ev rewş bi temamî nayê wateya ku jina kurd azad e jî, kesên biyanî destnîşan kirine ku jinên kurdan, li gorî jinên gelên cîranên xwe, bi awayekî berbiçav, azadtir e. Di malbatê de xwedî gotin e, birêvebirina malê û perwerdehiya zarokan ew dike. Bi hêsanî diherin bajêr, kirîn û firotinê dikin, li nav gund bi hêsanî digerin û xwe weke jinên misulman ên din, nanixwêmin. Dema ku mêrê wan ne li malê be, ew bixwe mêvanan pêşwazî dike, weke ku mêrê wê li malê be, mazûbantiyê dike.

Gelek jinên kurd serdestiya civakê jî kirine, ketine şeran, siyaset kirine û hevdîtinên dîplomatîk pêk anîne. Îro jî çî li Swêdê, çî jî li Kurdistanê, gelek jinên kurd di pozîsyonên bilind de siyasetê dikin, li zanîngehan karên akademîk dikin, weke ronakbîr bi karên nivîsê re mijûl dibin, gelek keç li zanîngehan xwendinên bilind dikin.

Helbet ji ber ku civaka kurdan jî weke hemû civakên cîhanê civakeke patrîarkal e, jinên kurd bi temamî ne azad in. Lêbelê ev lêkolîn eşkere dike ku rewşa jinên kurdan, ne weke ku swêdî nîşan didin, hewqasî xerab in. Swêdî bi helwestên subjektîf vê mijarê dinirxînin, herweha têgeha “hedersmord”ê li gorî berjewendiyên xwe, lê dûrî rastiye afirandine.

Çî kesên ji rêzê, çî ronakbîr, çî jî saziyên bi mijarê re têkildar, bi helwesteke subjektîf têgeha “hedersmord”ê û statuya jinê di çanda kurdan de dinirxînin. Li gorî swêdiyan, ên ku di *jedersmordê* de tèn kuştin keça malbatê ya azib e. Balkêş e ku kuştina mêrên ku dest davên jinekê, yan dikevin hewldana tecawizê û a jinên zewicî ku bi hin mêrên din re dikevin têkiliyê, li derveyî vê têgehê dihêlin.

Li gorî teoriya zanistê emerîkî Thomas Kuhn, helwesta swêdiyên ronakbîr û saziyên têkildar, paradîgmayek e. Lew di çanda kurdan de, ji ber têkiliyên evînî, kuştina keçeke azib tune ye. Lê kuştina mêrên ku dest davêje jinekê yan dikeve hewldana tecawizê, herweha jinên zewicî ku bi mêrekî din re dikeve têkiliyê, li paradîgmaya wan nayê. Lewma vêya li derveyî vê têgehê digirin. Ev yek jî weke anomaliyekê derdikeve holê.

Di afirandina vê têgehê de, rola herî girîng medyayê lîstiyê. Jean Baudrillard helwestên medyayê yên wanî weke helwesteke sîmulasonu û hyperrealîte binav dike. Dema ku mirov bûyera Fadîme vedikolê, derdikeve holê ku ev bûyer jî hîperrealîteyek e û rastiyeke sîmulasyonî ye. Lew rastiya ku di jiyane de heye û ya ku di medyayê de hatiye afirandin, dûrî hevdû ne. Medya di vê mijarê de, prensîba çapemeniyê ku dibêje “dema ku di bûyerekê de du alî hebin, divê herdû alî werin guhdarî kirin û werin ragihandin” îhlal kiriye. Lew, malbat di derbarê vê bûyerê û di derbarê îddîayên Fadîmeyê de çî difikirin, medya nepirsiye û ranegihandiye, cî daye Fadîme tenê, gotin û îddîayên wê, weke rastî ragihandiye.

Medya, Fadîme Şahîndal weke keçeke misulman û kurd nîşan dide. Lê di eslê xwe de Fadîme elewî ye û li gorî nirxên tirkan mezin bûye, bi kurdî jî nizane. Îddîa dike ku ji ber ku xwestiye bi xortekî swêdî re bizewice, bavê wê ew kuştîye. Lê dema ku Fadîme hat kuştin, xwişka wê ya biçûk, bi mêrekî swêdî re, bêzewac dijiya. Heger ku sedemê vê kuştinê nirxên çandî bûya, divê ew keç jî bihata kuştin, an Fadîme nehata kuştin.

Sedema kuştina Fadîme ne nirxên çanda kurdî bû, di bingehê de nakokiyên navbera wê û malbata wê hebû. Lê çend faktorên girîng di vê bûyerê de rolên diyarker lîstin. Faktorên siyasî-îdeolojîk yek ji van faktorên e. Dema ku Emerîka piştî êrîşên 11ê îlonê li hembera “terora radîkalên îslamî” ket tevgerê, Swêdê jî li gel Emerîka ciyê xwe girt. Bi taybet medya bûyera Fadîme bi awayekî manîpulatîv dijî biyaniyên misulman bikar anî.

Helwestên siyasî yên bi vî awayî, helbet cudaxwaziya biyaniyan jî bixwe re tîne. Li çend taxên Stockholmê tunebûna kesên swêdî, hebûna cudaxwaziya biyaniyan teyîd dike.

Faktorên siyasî-îdeolojîk û cudaxwaziya biyaniyan herdu civakan ji hevdû bi dûr dixê û weke encam herdu civak hevdû nasnakin. Medya valahiya navbera herdu civakan dadigire û agahiyên şaş dide. Lewma “hedersmord” a ku di çanda kurdan de tune ye, swêdî weke ku heye, dipejirînin.

Dema ku du civak hevdû nasnekin, tirs a ji gelên din ku jê re zenofobiya (xenofobia) tê gotin, derdikeve holê. Ev tirs herdu civakan bêtir ji hevdû bidûr dixê û hestên etnosentrîk (etnocentrizm) ku nirxên xwe weke pîvan digirin û nirxên gelên din şaş dibînin, derdixê holê. Di bûyera Fadîme de zenofobiya û etnocentrîzmê jî rol lîstiye.

ÇAVKANÎ

Pirtûk

Adak, Abdurrahman: “Erdelanlı Bir Kadın Saray Şairi: Mestûre Mahşeref Hanım (1804-1847)” *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi 1-5 Ekim 2009 Hakkâri*, wer. Zanîngeha Hakkârî, amd. Vahît Tane û Kemal Varol, 2011, r. 91-100.

Al Baldawi, Riyadh. Migration och familjestrukturer. I Ahmedî, N (Red), Ungdom, kulturmöten, identitet (pp.106-138) Stockholm: Liger, 2003 (veya sererast bike. Jag har tagit frân Ranya Sarkis uppsats)

Allison, Christine: “Folklor ve Fantezi: Kürt Sözlü Geleneğinde Kadınların Sunumu” amd. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları, Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. Fahriye Adsay û nd., wer. Avesta, Stenbol 2005, r. 245-264.

Anter, Mûsa. vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları, Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. Fahriye Adsay û nd, wer. Avesta, 2005.

Aslan, Mustafa, “Kürt Kadınının Toplumsal Statüsü”, *Uluslararası Kürt Kadını Kongresi, 1-5 Ekim 2009 Hakkâri*, wer. Zanîngeha Hakkârî, amd. Vahît Tane û Kemal Varol, 2011, r. 117.

Baudrillard, Jean, *Simgesel Değiş Tokuş ve Ölüm*, Weş. Boğaziçi Yayınları, İstanbul, Aralık 2011. r. 130.

Bayrak, Mehmet, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, Özge Yayınları, Ankara, 2002.

Bazidî, Mela Mahmûdê, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Ziya Avcî, Weş. Lîs, Diyarbakır, Tîrmeh 2010.

Bedirxan, Celadet Alî, *ferheng kurdî-kurdî*, weş. Avesta, İstanbul, 2009

Bedirxan Kamûran, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, Özge Yayınları, Ankara, 2002.

Bedirxan, Sureya, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, Özge Yayınları, Ankara, 2002

Bois, Thomas. vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. Fahriye Adsay û nd. Avesta. 2005

Bourdieu, Pierre, *Den manliga dominansen*. Weş.Daidalos AB, Uddevalla, 1999.

Brunessen, Martin Van: “Adîle Hanımdan Leyla Zanaya: Kürt Tarihinde Siyasi Liderler Olarak Kadınlar”, amd. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları, Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. Fahriye Adsay û nd. Avesta. 2005.

Brunessen, Martin Van, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, Özge Yayınları, Ankara, 2002.

Çelebî, Evliya, vg. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, Wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı. Weş. Avesta, İstanbul, 2005.

Dersimi, Nuri *Kurdistan Tarihinde Dersim*. Weş. Doz, İstanbul, 2004.

Driver, G. R., vgz. Mehrdad R. Izady, *Kürtler, Bir El Kitabı*, wer. . Cemal Atilla, weş. Doz, Stenbol, 2011.

Edmonds, John Cecil, *Kürtler, Türkler ve Araplar (Kurds, Turks and Arabs)*, Wer. Serdar Şengül, Serap Rûken Şengül, Weş. Avesta, İstanbul, 2003.

Fiske, John, *Television Culture*, Weş. Routledge, 1997 New York. r. 11

Gemi, Ahmet: “Kürt Kadınının Kaderle İmtihani” *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi 1-5 Ekim 2009 Hakkâri*, wer. Zanîngeha Hakkârî, amd. Vahît Tane û Kemal Varol, 2011. r. 24.

Hamilton, Archibald Milne, *Kürdistan'dan Geçen Yol*, Wer. Zeki Yaş, Weş. Avesta, İstanbul, 2009.

Hay, Rupert William, *Kürdistan'da İki Yıl, 1918-1920*, İstanbul, Avesta Yayınları, 2005.

Hayr, Muhammed Yusuf, *İslam Tarihinde Kürt Kadını*, wer. Mehmet Demirdağ û Ali Rıza Seven, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2004.

Izady, Mehrard R: *Kürtler, Bir El Kitabı*, wer. Cemal Atilla, weş. Doz, Stenbol, 2011.

Jaba, Alexander. vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, Wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı. Weş. Avesta, İstanbul, 2005.

Kahraman, Ahmet, *Kürt İsyenları*, Weş. Mezopotamya, Köln, 2001.

Kamêran, Ferhenga, *Kurdî-Kurdî*, weş. Spîrêz. Duhok. 2006.

Karabuda, Barbro, , *Öster om Eufrat –i Kurdernas Land*, Tiden-Barnängen tryckerier AB, Stockholm, 1960.

Kurdistan, Rojnameya (1946) 16 (18 Sebat:4) vgz. Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları* Wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı. Weş. Avesta, İstanbul, 2005.

Lucy, Garnett, “ The Womens of Turkey and Their Folklore”, vgz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara 2002.

Minorsky, Vgz. Bazil Nikitin, *Kürtler, Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*, Wer. Hüseyin Demirhan, Cemal Süreyya, Weş. Deng, İstanbul, Mayıs 1991.

Morley, David and Robins, Kevin, *Space of Identity*, Routledge, New York, 2002.

Mojab, Shahrzad, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, Wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı. Weş. Avesta, İstanbul, 2005.

Nikitin, Bazil, *Kürtler, Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*, Wer. Hüseyin Demirhan, Cemal Süreyya, Weş. Deng, İstanbul, Mayıs 1991.

Noel, Edward Williem Charles, *Kurdistan 1919*, Wer. Bülent Birer, Weş. Avesta 2010 İstanbul.

Norstedts Svenska Ordbok, Språkdata, Sture Allen och Norstedts Förlag, 1997.

Said, Edward W. *Orientalism*, Ordfront, Stockholm, 2004.

Sjögren, Annick, *Här går gränsen: om integritet och kulturella mönster i Sverige och Medelhavsområdet*, Weş. Arena, Stockholm, 1993.

Stövling, Åsa Brittasdotter Britta, *Incest, Dotterrätt mot patriarkatet*. Weş. Wahlström&Widstrand Stockholm 1982.

Swanberg, Lena-Katarina, *Hedersmord på Pela: lilla systemen berättar*, Weş. Forum, Stockholm, 2002.

Soane, Ely Bannister, *Mezopotamya ve Kurdistan'a Gizli Yolculuk*, Wer. Fahriye Adsay, Weş. Avesta, 2007.

Thurén, Torsten, *Vetenskapsteori för nybörjare*, Weş. Liber, Stockholm, 2003.

Wikan, Unni. *En fråga om heder*. Weş. Ordfront Stockholm, 2003. (Professor i socialantropologi).

Zilan, Reşo, *Ferhenga swêdi-kurdî*, lexin Språkklexikon för invandrare, Statens Institut för Läromedel (SIL), Stockholm, 1989.

Ansiklopedî

Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, Cild 32, r. 382, 2006, İstanbul.

Rojname

Aftonbladet, 23.01.2002.

Aftonbladet, 25.01. 2002.

Aftonbladet, 29.01.2002.

Aftonbladet, 25.02. 2002.

Aftonbladet, 09.03.2004

Aftonbladet, 23.05.2013.

Cumhuriyet, 08.01.1998.

Expressen 12.09.200.

Expressen, 25.01.2002.

Expressen 12.02.2002.

Expressen, 13.03.2002.

Expressen, 04.04.2002.

Hurriyet, 8.01.1998.

Hurriyet, 09.03.2004.

Hurriyet 31.12.1998.

Milliyet, 08. 01.1998.

Sabah, 08.01.1998.

Yeniyüzyıl 29 12. 1997.

Kovar

Bang 2, 2001.

Bang 2, 2002.

ETC 1, 2002.

Hawar, Weşanên Nûdem, Stockholm.

Jîn *Cild III*, Weşanên Deng, Fyris-Tryck AB, Stockholm, 1986.

I&M Invandrare Minoriteter 3 2002.

Kvinnor mot Fundamentalism 4 2002.

Rojî Kurd, Weşanên War, Belgeyên Kurdî:1/3 Kovara Rojî Kurd/1913.

Socionomen 2 2002.

Socionomen 3 2002.

Tezên Têkildar

Karaaslan, Salih, *Mordet på Fadîme Sahindal, En jämförande textanalys av Aftonbladets och Expressens inledande artiklar om mordet*, di Medya û Komunîkasyonê de, Teza min a qedandinê, Serdema Payîzî, 2001/Zanîngeha Bajarê Gävle/Swêd.

Henrysson, Maria Hallenius, & Hjerpe, Carola, *Det finns till för din egen skull*, C-Uppsats socialt arbete, , Ersta Sköndal Högskola, r. 14 (Di sosyolojî de tezek)

Sahlsten Louise, *Möjligheter för hotade flickor med invandrarbakgrund att bli placerade i familjehem*, JURIDISKA FAKULTETEN, vid Lunds universitet, HT 2004 (Teza Mastirê, li Swêdê li Zanîngeha Lund, Beşê Hûqûqê).

Westerberg, Charlotte, *Heder Och Samvete Det svenska rättsystemets hantering av hedersmord*, Juridiska Fakulteten vid Lunds universitet VT 2003 (Teza Mastirê, li Swêdê li Zanîngeha Lund, Beşê Hûqûqê).

TV û Radyo

Perwerdeyê: Utbildningsradio: 27.10.2003, Saet:17:00.

Radyoya Swêdê ya Netewî:

<http://sverigesradio.se/sida/artikel.aspx?programid=83&artikel=4918290>Radyoya

TV1 *Nyheter*, 11-03-04, Saet: 19:30.

TV4, *Media Magasinet*, *ji aliyê Dan Josefsson ve*, 14 Adar, 2002.

Malperên Înternetê

Ajansa Nûçeyên Firatê:

<http://ar.dev.firatnews.com/index.php?rupel=nuce&nuceID=34143>

Amnesty Internationel a Swêdî: Amnesty Internationel, *Flickor och kvinnor mördas i hederns namn, (Keçik û jin li ser navê namûsê tên kuştin)* 2013.

<http://www.amnesty.se/vad-gor-vi/kvinnors-rattigheter/hedersmord/>

Ferhenga Akademiya Swêdî: Svenska Akademiens Ordbok:

<http://g3.spraakdata.gu.se/saob/>

Malpera fermî ya Lijneya Zimanê Swêdî: Språknämnden: <http://www.spraknamnden.se>

Malpera Rêbazên Çapemeniyê = Pressombudsman och pressopinionsnämnden = <http://www.po.se/regler/presstiska-regler>

Wikipediya Swêdî: <http://sv.wikipedia.org/wiki/Heder>

http://sv.wikipedia.org/wiki/Emigrationen_fr%C3%A5n_Sverige_till_Nordamerika

http://sv.wikipedia.org/wiki/Sveriges_utrikes-och_s%C3%A4kerhetspolitik_under_kalla_kriget

Zanîngeha Uppsala, malpera Kunskapsbanken (Banka Zanyariyê)

http://www.nck.uu.se/Kunskapscentrum/Kunskapsbanken/amnen/Hedersrelaterat_vald_och_fortryck/Begreppet+heder/

Malpera Dîroka Swêdî: <http://www.historia2.se/historia123/?p=745>

Hevpeyvîn

Hevpeyvîn bi Malmîsanij re / Bi telefonê, 27.01.2003, saet: 20.15.

Hevpeyvîn bi Îsmail Beşikçi re / Bi nameyekê, 20.03.2003.

Hevpeyvîn bi Reşo Zîlan re / Rû bi rû li Zanîngeha Uppsalayê, 15.05.2003.

Hevpeyvîn bi Ferhat Şakelî re / Rû bi rû li Zanîngeha Uppsalayê, 06.05.2003.

Hevpeyvîn bi Ahmet Kahraman re / Bi nameyeke elektronik, 10.02.2003.

Hevpeyvîn bi Kadir Tosun re, serokê Komeleya Akademîsyenên Kurd/Sundsvall, rû bi rû, 28.05.2003.

Sohbetên Şexsî

Anter, Seyidxan, *sohbeteke şexsî. Sebat 2004*

Baksî, Kurdo, *sohbeteke şexsî li Stockholmê, 19.15.2002.*

Keça xaltîka Fadîme Şahîndal, *sohbeteke şexsî, şahiya Newroza bajarê Gävle- 2003*

Rönberg, Margareta Doç. Dr., *li zaîngeha bajarê Gävle, sohbeteke şexsî, 28. 03.2003*

Serdar Gazî, *sohbeteke şexsî li Stockholmê, 15.07.2002*

Xwendenkareke swêdî ya medya-komunîkasyonê *li kafeterya zanîngeha Gävle, Gulan 2002*

Kemal Gündüz, *li Stockholmê şifêrê taksîyê, sohbeteke şexsî.20.03.2003*

Mamosteya Meyda-Komunukasyonê, Doçent, *di dersê de nîqaş li ser mijarê, Nîsan 2002*